Ji arşîvê: Jean-Pierre Viennot, *Kurdistan û milletekî parçekirî (tebax 1971)* ▶ R. 12

LE MONDE diplomatique kurdî

Çiriya pêşîn 2010 - Hejmar 11 www.lemonde-kurdi.com · info@lemonde-kurdi.com 24 Rûpel

**SERGE HALIMI**
*Le Monde diplomatique* ber bi bayê bazarê ve nakeve û rojnamegeriyeke ji bo berjewendiyên giştî diparêze. Têkoşîn dewam dike.
▶ R. 2

**JANETTE HABEL**
Keleha sosyalîzmê ya dawîn dest bi reformên aborî dike û deriyên xwe ji cîhana nû re vedike. Civak ne razî ye. Gelo Kuba tê guhertin?
▶ R. 3

**RENAUD LAMBERT**
Medya pesnê modela îrlandî dide û herkes dixwaze bizane ka ev welat çawa bi ser dikeve. Lê gelo bi rastî jî aboriya îrlandî bi ser ketiye?
▶ R. 7

**GEORGES LEFEUVRE**
Li Afganistanê her daîm şerr hebûye, lê çareseriyeke daîmî nebûye. Di nava teror û eşîr û pirsgirên etnîk de, gelo çareyeke din nîne?
▶ R. 15

**ALAIN GRESH**
Bi pêşengiya Barak Obama ve, hevdîtinên Israîl û Filistînê ji nû ve dest pê kir. Nîqaşên Dewleteke yekgirtî gurtir dibin. Xewneke nû ye gelo?
▶ R. 20

SIYASETA TURKIYEYÊ YA ROJHILATA NAVÎN

# Osmanîzma Nû?

PROF. DR. FERHAD ÎBRAHÎM *

Piştî ku AKP di encama hilbijartinên 2002'an de bû desthilatdar, Cîhana Ereb bi giştî, çi di asta fermî û çi jî di asta raya giştî de, siyaseta derve ya turk erênî nirxand. Medyaya erebî û pirraniya lêkolîner ku qada lêkolînên wan têkiliyên ereb û turkan e, dibînin ku sedema vê pêşwaziya germ a ji siyaseta nû ya Turkiyeyê re, lawazbûna sîstema deshilatdariya herêmî ya ereban e. Siyaseta herêmî ya Turkiyeyê ku çalak û aktîv e, di beşekî xwe de wezîfeya sîstema herêmî ya ereban bi dest xwe ve biriye.

Bi rastî jî di siyaseta herêmî de valahiyeke aşkere heye û çareneçar divê qutubek an hegemonyayek derkeve meydanê ku li herêmê roleke sereke bilîze.

Îranê, ji hêla xwe de hewl da û hîn jî hewl dide ku piştî ketina rêjîma Saddam Huseyn vê rolê bilîze. Ev rol jî bi gellek awayan tê lîstin; mudaxeleya di karûbarên Iraqê de, piştgiriya bêsînor ji Hizbullaha lubnanî re û xistina bizava Hamasê ya bin kontrola Îranê. Herweha, destdana tevgerên dijberî rejîmên ereb, ew rêjîmên ku ji hêla xwe ve dixwazin rêyê li ber xurtbûna Îranê bigirin.

Divê em ji bîr nekin ku Îsraîl jî di rêya serdestiya xwe ya leşkerî û hevpeymaniya xwe ya bi DYA yê re dixwaze ku sîstema herêmî qels û lawaz be û di heman demê de dixwaze ku Îranê dûr bixe û projeya wê ya herêmî têk bibe.

Weha diyar e ku stratejîzanên turk, di serî de Ahmet Davutoğlu, haya wan qenc ji girêkdariyên siyaseta herêmî û hêzên dijhev ên li herêmê heye. Lewre jî wan siyaseteke turk ji bo Rojhilata navîn saz kir û nexwast ji bo xwe qadekê biafirînin ku tê de destdirêj û serdest bin yan jî alîkariya hin terefan li dijî hin terefên din bikin. Bi her halî, Turkiye di nakokiyên navherêmî de naxwaze bibe aliyek. Berevajî wê, ew hewl dide ku - wekî ku wezîrê derve yê Turkiyeyê di dema şîrovekirina siyaseta derve ya welatê xwe de dubare dike - bi rêya ekîbên xwe yên diplomatîk re van nakokiyan çareser bike û hetta asta van nakokiyan bigihîne sifirê. Bi rastî jî Turkiye dikare îdîa bike ku wê têkiliyên xwe yên bi dewletên cîran re gihandiye asta herî baş.

Turkiye li ba aktorên siyaseta herêmî bûye cihê baweriyê, ew di çareserkirina nakokiyên herêmî de bûye navberkar; mîna hewldanên Turkiyeyê di nêzîkkirina Sûriye û Îsraîlê de, nakokiyên Azerbaycan û Ermenistanê de û di pirsa bernameya nukleerî ya Îranê de û ji bilî van, nakokiyên din ku li hêviya çareyan in.

Siyaseta nû ya herêmî ya turk xwe ji nû ve dispêre berjewendiya neteweyî ya turk. Û rola aktîv û çalak a turk li rojhilata navîn xizmeta sê pirsên girîng û hesas dike:

- a- **Kûrkirin û firehkirina têkiliyên aborî bi Cîhana Ereb re.**
- b- **Beşdariya di avakirina sîstemeke herêmî de ku pê pêşengiya tevgerên sînorbuhêr (Transboundary Movements) bike.**
- c- **Hêsankirina tevlêbûna Yekîtiya Ewropayê.**

Ev jî ne ji ber ku Turkiye pireke di navbera Ewropa û Cîhana Ereb de ye, lê ji ber ku ew di aramiya rojhilata navîn de faktoreke aktîv e.

▶ R. 8

**Almanya: 4,50 €**
**Awûstûrya, Belçîka, Fransa, Hollanda:** 5,00 €
**Brîtanya:** 4 £, **Danîmarka:** 40 DKK, **Norweç:** 40 NOK, **Swêd:** 50 SEK, **Swîsre:** 6,50 CHF, **Turkiye:** 7 TL

AKP Û BDP ENCAMÊN REFERANDÛMÊ CUDA DINIRXÎNIN

# Ji Referandûmê ber bi "Vebûnê" ve

RIZA DÎNÇ *



YÛSIV BEKIR: **Qamişlo**, 40 cm x 50 cm , teknîka tevlihev ya ser tûwalê

Di 12'ê îlona bihurî de, li ser 25 xalên guhertî yên Destûra Bingehîn a turk referandûmek hat lidarxistin. Li gorî encamên pêşîn, ji wan kesan ku di referandûmê de beşdar bûbûn ji sedî 58 gotibûn erê û ji sedî 42 jî gotibûn na. Bi vî awayî, qismekî Destûra Bingehîn a Turk ku berhemeke darbeya leşkerî ya 12'ê îlona 1980'yê ye, bi awayekî îronîk dîsa di roja 12'ê îlonê de hat guhertin.

Di destûra îroyîn a Tirkiyeyê de, ku di sermaweza 1982'an de, bi 177 xalên eslî û bi 16 xalên demkî re ketibû meriyetê, di nava 28 salên dawîn de 17 caran guheriye. "Pêşekî" û 79 xalên eslî û 5 xalên demkî (di hin xalan de guhertin çendîn car pêk hatin) parçe bi parçe hatin guhertin, hin tişt li wan hatin zêdekirin, hin ji wan hatin birin. Digel van guhertinan, ku bi giştî beranberî nîvê destûrê ne, di warê gellek maf û azadiyan de hin rutûş, "başkirin" û rastkirin hatin çêkirin.

Herçend ev hemû guhertin pêk hatin jî di warê felsefe û vegotina destûra 82'an de ji roja pêşîn û vir ve tu guhertineke berbiçav pêk nehat. Vegotina ku xwe li ser bîrdoziya Kemalîzmê ava dike, di çarçoveya dewleteke îdeolojiya fermî de her berdewam bû. Di destûrê de

▶ R. 4

www.arsivakurdi.org

# Têkoşîna me

**SERGE HALIMI**

Berî nuha bi salekê, me bangek li xwendevanên xwe kiribû (1). Bi rengê ku wan bikin şirîkên rewşa darayî û projeyên *Le Monde Diplomatique*'ê, me ji wan xwastibû ku pereyan li me bibexşin, xwe bikin abone, hevalên xwe bikin abone, hê bêtir bi rengekî nizamî *Le Monde Diplomatique*'ê li kîoskan bikirin. Agahdarî û ragihandina serbixwe heyiyeke giştî ye, lê belê para bingehîn ya mesrefên wê dimîne ser stûyê bikir û aboneyên rojnameyê bi tenê. Bêyî wan, yanî bêyî we, hebûn û pêşketina *Le Monde diplomatique*'ê teqez nabe.

Ev banga me gihişte xwendevanan. 1.648 xwendevanan bi şêweyê bexşan 164.321 euro razandine ser hesabê me, bi taybetî di navbera çiriya pêşîn û çileya pêşîna sala par de (2). Ji serê salê û bi vir ve, digel zêdebûna buhayê govarê û yê abonetiyê, rêjeya belavbûna daneketiye (+ % 0.4) ku netîceyeke qewî kêmpeyda ye di çapemeniya fransî ya îro de. Piştî çend serhatiyên bi kêmasiyên budçeyî, em hêvîdar in ku di 2010'an de hesabên tekûz û bêkêmasî pêşkêş bikin.

Bi vî rengî, çalakvaniya xwînerên me hişt ku tendurustiya darayî ya *Le Monde diplomatique* nema metirsîdar be. Di demekê de ku rewşa çapemeniya nivîskî cihê fikaran e, lewre hejmara rojnameyên azad ên ji hemû grûbên endustriyel, darayî an jî reklamî bi lez û bez dadikeve, ku hetta xwediyên *Le Monde*'ê têne guhartin, ev destkefta *Le Monde Diplomatique*'ê bêhed girîng e. Ev yek di tercîhên me de me xurttir dike, û rêya ku divê em bidin ber xwe nîşanî me dide. Herweha, wan xerantiyên destûrî yên li ber destê me jî piştrast dike: hilbijartina dîrektor ji aliyê tevahiya xebatkarên mehnameyê, ragirtina nêzîkî nîvê (49%) sermiyanê rojnameyê li ba komeleya *Les Amis du Monde diplomatique* [Hevalên Le Monde Diplomatique'ê], hebûna nasnavên grûbê yên din bi kesayetiyên yasayî yên cuda.

Berî buha bi salekê, me ji we re diyar kiribû ku meblaxê ji kampanyaya bexşan bidestketî ne ji bo pînekirina qullikan e, bo numûne ji ber daketina dahatên ji reklaman, lê belê ji bo, bi rengekî baştir pêdaketin û lidûçûna armancên bi nirxên me yên weşanê re hevaheng: buhayekî kêmtir li welatên feqîr; hevkariya bi çapên navneteweyî re ku, di hinek rewşan de, em qebûl dikin ku bo destpêkê pirr kêmtir heqê weşanê bidine me (Macaristan, edîsyona kurdî) an jî em meblaxên pirr cazîbtir pêşniyar dikin (Perû, Ermenistan, Koreya Başûrî, hwd.); dijîtalîzekirina hemû hejmarên rojnameyê yên ji cerga avakirina wê (1954) da ku arşîvên me ne tenê ji bo çend pirtûkxaneyan vekirî bin, lewre koleksiyonên pirtûkxaneyan ên kaxezî xirab dibin, û heta kurtedemekê wan arşîvan pêşkêşî xwendevanên xwe bikin. Axir, van bexşan derfeta wê hindê da ku em zêdetir lêkolîn û roportajan bixwazin, ku gellek caran maliyeta wan pirr bilind e, derbarê nakokiyên heyî de, lê herweha roportajên li ser alternatîfên "realîst" an jî "ûtopîk", li dijî sîstemeke aborî ku wisa diyar e ku îstifadeyê ji wan qeyranên aborî dike ku ew bi xwe derdixe.

Bi vî rengî, di sala 2010'an de, me 82.000 euro terxan kirin ji bo erzankirina buhayî li welatên başûrî, 83.000 euro ji bo alîkarina çapên xwe yên navneteweyî da ku dest bi weşana xwe bikin an jî di weşana xwe de berdewam bin, 54.000 euro ji bo dîjîtalîzekirin û derxistina fîhrîstên hejmarên berê yên *Le Monde Diplomatique*'ê, 63.000 euro ji bo fînansekirina mesrefên awarte yên lêkolîn û roportajan. Encam (282.000 eruo) ji bexşên ku ji cotmeha borî ve bi dest me ketine zêdetir e. Lê belê, me budçeyeke piçûk hilanîbû ji bo mesrefên hevgirtin û pêşxistinê.

Em baş pê dizanin: em ji xwendevanên xwe ji halên normal zêdetir dixwazin, lewre di endustriyekê an jî tucaretxaneyekê de, di qutîka posteyê ya muşteriyên ku bazirgan dixwazin bixapînin de bêhtir dibe şeqşeqa diyariyan (saet, televîzyon, kanalên Hi-fi û abonetiyên bi buhayên erzan). Lê belê em ne firoşendeyên saetên bermayî ne. "Diyarî"ya me, serxwebûna me ye, takiya me ye, tercîhên me yên şêwe û naveroka gotaran e ku ji pêwîstî û şertên reklamderan bêrî û azad in û beramber heyraniyên pirraniya rojnamegeran bêpaxav in.

Ya herî hêsan ew e ku mirov rê û derfetên sade yên promosyonan û pêşketina ku em pê bi dest dixin digel yên weşanên din ku li dijî modaya zemanî tu carî li ber xwe nedane muqayese bikin. 17'ê adara bihurî, wek nimûne, *France Soirê*, ku malê Alexandre Pougachevê serkêşê olîgarşiyeke rûsyayî ye, ku bi wê rojnameyê dilîze her wekî zarokek bi trêneke elektrîkî bilîze, kampanyayeke 20 milyon euroyî da destpêkirin. Şeş mehan piştî wê, rojnameya *Les Echos*, malê Bernard Arnaultê xwedanê serweta herî mezin a Fransayê ye, 6 milyon euro terxan kirin bo kampanyayeke afîşan û spotên radyoyî da ku "formûla xwe ya taze", ku rengîntir e ji ya berê, bide naskirin. Heçko em, wan tiştên ku organên çapemeniyê yên din dikin, bi îmkanên xwe –ewên ku hûn ji bo me dabîn dikin– û bi hişyarane dikin…

Ji ber ku divê dewama armancên di 2010'an de bidestketî bê û herwiha ew armanc bêne xurtkirin, têkoşîna me berdewam e. Lewma em dîsa ji we dixwazin ku beşdariyê bikin di hewla me de ji bo parastin û pêşxistina rojnamegeriyeke bo berjewendiyên giştî, rojnamegeriyeke krîtîk û meraqdar beramber cîhanê, azade ji desthelata siyasî û hêza pere. Em careke din we bang dikin ku hûn bibin abone, hevalên xwe bikin abone, bexşeke darayî li me bikin berî dawiya salê, bibin endamên komeleya *Amis du Monde diplomatique* (3). Ji bilî piştgiriya we, em xwe nasipêrine tu piştgiriyên din. Û bi tenê ev pabendî ye ku li me tê.

1- Bixwîne: "Têkoşîna me", *Le Monde diplomatique*, çiriya pêşîna 2009'an

2- Êdî, kesên ku li ser navê *Presse û Pluralisme*'ê alîkariya çapemeniyê dikin, dikarin ji bo vê alîkariyê, ji sê parên ku dane rojnemeyê du paran ji baca xwe kêm bikin

3- Abonetiyên ku em bi rêyên din werdigirin (daxwazên ku bi rêya banqeyan û bi rêya malperên ji derveyî malpera me tên), me mecbûr dikin ku em komîsyonên gellekî buha bidin ku hin caran digihîje heta % 75'an. Ji ber wê, gellekî girîng e ku xwendevanên ku dixwazin alîkariya me bikin an jî bibin abone, vê yekê bi rêya malpera me ve bikin an jî forma me ya abonetiyê bi kar bînin (di rûpela dawîn de)

Wergera ji fransî: Ergîn Opengîn

# JI ÇAPEMENIYÊ

## QEYRAN

*Rojnameya brîtanî* The Daily Telegraph *balê dikişîne ser hişyariya ku ji aliyê Fona Navteneweyî ya Darayî (FND) ve hatiye dayîn. Heman hişyarî, di encama zîrweya 13'ê îlonê de ku li Osloyê di nava FND'yê û Rêxistina Navneteweyî ya Xebatê (RNX) de pêk hat, di derbarê "kêmbûna pêşketinên aborî, yên xebatê û yên civakî" de hate weşandin.*

*"Bazara xebatê di nava rewşeke bêhêvî de ye. Qeyrana aborî deryayeke karkerên bêkar li pey xwe hişt".* Ev daxuyanî ji aliyê berpirsiyarê FND'yê Dominique Strauss-Kahn ve hate dayin *(...)*. Herweha, wî da xûyanî ku, qeyraneke hê mezintir hê mezintir dikare were jiyîn û ew ê li pey xwe çalên hê kurtir bihêle. Dîsa, Strauss-Kahn bi bîr xist ku cîhanê hê xeteriyeke civakî derbas nekiriye *(...) "Hejmara mezin û demdirêj ya karkerên bêkar weke rîskekê li pêşiya demokrasiyê ye. Ji bo ku em rêyê li ber vê rewşê bigirin û nehêlin ku bi sere me de were, çê bikin, FND û RNX rêyên çareseriyê yên curbecur pêşniyaz dikin, nûbûn hertim nikarin werin avakirin".*

Ji bo aboriyên ku ji pêşketinan re vekirî ne, modernîzekirina rewşa meaşan dikare hêza reqabetê ji bi xwe re bi pêş ve bixe, di encamê de ew dikare bala karmendên biyanî jî bikişîne. Ev rewş zêdetir têkildarî welatên endamên yekîtiyeke darayî ye, ji ber ku ew neçar in ku di derbarê pêşxistina aborî de, hêza xwe ya reqabetê bi rêya devaluasyonê ve bi pêş ve bixin.

## Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê:

*Sîteya amerîkî Too Much* (http://toomuchonline.org)*, di nûçeyên xwe ên roja 28'ê tebaxa 2010'an de, dida xuyanî ku wê li Dewletên Yekbûyî bacên hê girantir ji hatina aborî ya mezin werin girtin. Nuha ev derdor tenê baceke % 35'ê hatiniya xwe didin, ev jî qasê ya memûrên payebilind û karên serbest e.*

Di weşana *New Yorker* ya roja 16'ê tebaxê de, rojnamevanê aboriyê James Surowiecki, bi bîr anî ku, li gorî sîstema heyî doktorekî diranan ku salê 200.000 dolaran qezenc dike û kesekî ku 200 mîlyonan qezenca wî heye bi qasî bacê hev didin. Herweha ew bale dikişîne ser ku li Amerîkayê, *"çela heyî, derdorên payebilind û çîna plutokrat ji hev diqetîne; divê sîstema bacan hesabê vê rastiyê jî bike." (...)* Robert Reich jî (kesê ku di dema Clinton de wezîrê karan bû) ji aliyê xwe ve weha dibêje; di dema serokê komarger Dwight Eisenhower (1953-1961) de rêjeya baca qezencên bilind, ên ku ji 400.000 dolaran derbas dibûn, % 91 bû, ev rêje, îroj dike 3 mîlyon dolar.

## ÛGANDA

*Kovara new-yorkî* Harper's*, di hejmara xwe ya îlonê de, li ser pêşniyareke qanûna ûgandî ku di mijdara 2009'an de hatibû pêşkêşkirin sekiniye. Heman pêşniyara qanûnê daxwaz dikir ku, di derbarê homoseksuelîteyê de, ji 3 salan (ji bo kesên ku li homoseksuelan gilî neke) heya cezayê îdamê ceza were xwastin.* Harper's *diyar dike ku di vî warî de rola kêşeyên kevneperest û siyasetmedarên amerîkî ya li ser Ûgandayê aktîf bûye.*

Her sal, beriya cejna serxwebûnê, hukumeta ûgandî rojekê neteweyî ya duayê li dar dixe. Îlankirina vê rojê bingeha xwe ji çalakiyeke din distîne ku bi heman şêweyî û ji aliyê protestanên fondemantalîst ve li Washingtonê pêk tê. Hin amerîkî jî - di nava wan de senatorê komarger yê Oklahomayê Jim Inhofe, kevnewezîrê dadê John Ashcroft, hin fondemantalîst û mîlîtanên dijberî homoseksuelîteyê jî hene- tev li civînên olî ku li Ugandayê û bi tevlêbûna kêşe Rick Warren pêk tên dibin. *(...)* Inhofe û Warren ku di derbarê homoseksuelîteyê de dijberê cezayê îdamê ne, li dijî armanca wan bûyeran ranabin: paqijkirina homoseksuelîteyê. *(...)* Ji salan pu vir ve ye ku kevneperestên "amerîkî" dixwazin Ûgandayê ji xwe re weke laboratuwara teokrasiyê bi kar bînin. Wan ji bo Ûgandayê pere, mîsyoner û herweha fikir şandine. Pere wenda bû, mîsyoner belav bûn, lê belê fikir li wê derê hatin bicihkirin.

Wergera ji fransî: Ahmet Dere

## RESSAMÊ VÊ HEJMARÊ

### Yûsiv Bekir

**Sala 1971'ê li Efrînê hatiye dinyayê.**

Di navbera 1990-1994'an de li Şamê, li Akademiya Hunerên Bedew de, beşê wênesayiyê xwendiye û ev beş bi dereceya yekem xilas kiriye.

Sala 1981'ê, hê deh salî bû, di pêşbaziya "zarokên suriyeyî" de xelat wergirtiye.

Sala 1988'an, xelata baştirîn peyker ya Muzeya Neteweyî ya Helebê wergirtiye.

Hunermend heta nuha tev li gellek pêşengehên şexsî an jî komî bûye û zêdetir bîst pêşengeh li dar xistine.

Li Şam, Heleb, Munîh, Frankfurt, Dusseldorf, Koln, Monako û Stockholmê tev li pêşengehên şaredariyan bûye.

Yûsiv Bekir, di ber wêneyan re, peykeran jî çêdike û ev deh sal in ku her sal tev li mihrîcana "Peykerê ji axê" dibe. Îsal mijara peykerên wî yên di navbera 3 û 10 metreyan de, aborîjenên awustralyayî bû.

Bekir, sala 1997'an hatiye Almanyayê û nuha li Kolnê dijî.

Yûsiv Bekir endamê Yekîtiya Wênesazên Alman (BBK) e.

www.bakirart.com



**Le Monde Diplomatique kurdî**
Ji aliyê Independent Kurdish Media Group GmbH ve tê weşandin

**INDEPENDENT KURDISH MEDIA GROUP GMBH**
Carnotstr. 4
10587 Berlin / Almanya

**Lijneya Weşanê**
Murad Satik
Riza Dînç

**Le Monde Diplomatique kurdî**

**Redaksiyona Zimanî**
Îbrahîm Seydo Aydogan

**Alîkarên vê hejmarê**
Hüseyin Kartal
A. Celîl Kaya
Semra Polat

**Berpirsê hunerî**
Hasan Huseyîn Deveci

**Designer**
Fabio Biasio

Tel: 00 49 (0)30 330 990 420
Fax: 00 49 (0)30 330 990 429

info@lemonde-kurdi.com
www.lemonde-kurdi.com

**ABONETÎ**
Independent Kurdish Media Group GmbH

Postbank
Konto: 371219609
BLZ: 500 100 60
IBAN: DE84 5001 0060 0 3712196 09
BIC: PBNKDEFF

**Abonetiya Salane:**
Almanya: 50 €
Derveyî Almanyayê: 60 €
Abonetiya dîjîtal: 20 €

**Le Monde Diplomatique**

**Damezrîner**
Hubert Beuve-Méry

**Birêvebirê giştî**
Serge Halimi

**Serniviskar**
Maurice Lemoine

**Cîgirên Serniviskarî**
Martine Bulardi
Philippe Rivière
Anne-Cécile Robert

**Redaksiyon**
Alain Gresh
Mona Chollet
Pierre Rimbert
Dominique Vidal

**Birêvebirê hunerî**
Alice Barzilay

**Dokumantasyon**
Olivier Pironet

**Sekreter**
Sophie Durand
Monique Salomé

Tel: 00 33 (0) 153 94 96 01
Fax: 00 33 (0) 153 94 96 26

1-3, rue Stephen-Pichon,
F-75013, Paris, France

www.arsivakurdi.org

REFORMÊN ABORÎ, VEBÛNA LI BAZARÊ Û NERAZÎBÛNA CIVAKÎ

# Gelo li Kubayê rota tê guhertin?

JANETTE HABEL *

Fidel Castro destpêka îlonê di hevpeyvînekê de, ku bi kovara mehane ya amerîkî "The Atlantic" re kiribû, da zanîn ku modela Kubayê "êdî bikêrhatî naxebite".
Bi lez û bez gellek şîroveyên pirrî caran bi hev re nakok peyda bûn. Beriya demeke kurt hat ragihandin ku pênc sed hezar kes dê ji kar werin derxistin û ji ber vê mirov dikeve baweriya ku guherîna modeleke ku êdî bêhn lê çikiyaye, di serê Castro de heye.

Serokê Kubayê, Raul Castro, 1'ê tebaxa 2010'an, li hember Parlamentoya Neteweyî ya Xelkî, tedbîrên desteya wezîran ji bo kêmkirina hejmara karmendên dewletê ku weke zêde bin tên dîtin bi vî rengî dan naskirin: "*Biryarên girîng ên ku guherîneke tevnî û hişmendî pêk tînin.*" Di 14'ê îlona 2010'an de, navenda karkerên Kubayî (NKK) da zanîn ku ji nuha heta adara 2011'an pêncsed hezar karên dewletê wê jê werin birin; ev jî pêkanîna vê "*nûkirina modela aborî*" ye. Di danezana xwe de navend sedema biryara xwe bi van pêdiviyan ve girê dide : "*bilindkirina berhemdarî û kalîteya xizmetan, kêmkirina mesrefên civakî yên gellekî zêde, ji holê rakirina belaşkariya bêsedem û subvansiyonên ji heddê xwe zêdetir*". Ji sedî heştêyê nufûsa kubayî ya kar dike, meaşê xwe ji dewletê distîne ku hejmara wan çar milyon û çarsed hezar e. Li gorî texmîna Raul Castro ji çar paran pareke vê hejmarê ji ya pêwîst zêdetir e. Sererastkirina ku 14'ê îlonê hat ragihandin – ku bi tenê % 12'ê xebatkarên sektora dewletê dikevine ber – bi tenê gava pêşî ya reformeke weha ye ku % 20'ê nufûsa ku kar dike, dê bikeve ber: ji bo Leonardo Padura "*hejmareke weha ye ku mirov jê ditirse*".

### Nîqaşeke bi sê dengan

Di hevpeyvînekê de, ku bi kovara mehane ya amerîkî "*The Atlantic*" re kiribû – 8'ê îlona 2010'an hat weşandin – Fidel Castro digot, modela Kubayê "*êdî bikêrhatî naxebite*". Tevî ku ev îfade bûn sedema şîroveyên dijberî hev jî, danezana ku sekreteriya giştî ya NKK'yê hefteyek bi şûn de weşand, dike ku mirov vê daxuyaniyê li gorî pîvana vê nûsaziya radîkal a modela kubayî ya aborî û civakî de şîrove bike.

Piştî başbûneke di salên 2000'î de welat ji nû ve kete rewşeke gellekî dijwar. Aborîzan Omar Everleny Perez vê tesbîtê dike: "*dema mirov bala xwe dide buhayê tiştên xwarinê yên li bazaran, hatina aborî a ferdî têra mesrefên sereke yên malbateke Kubayî ya normal nake (1). Ji ber vê yekê, ji beşekî xelkê Kubayê nikare pêdiviyên xwe yên sereke peyda bike.*" Çareserî çi ye? Ji bo jiyanê, mirov ji nû ve berê xwe didin karên piçûk. Li gorî navenda lêkolînên aboriya Kubayê (NLAK), gellek sedemên xirabtirbûna vê qeyranê hene. Di destpêkê de sedemên konjonkturel: xirabbûna mercên bihevguherînê (2) (erzanbûna nîkelê û buhabûna kirîna ji derve ya enerjiyê û tiştên xwarinê), encamên sê bahozên ku di 2008'an de girav wêran kirin û bandora qeyrana navneteweyî. Bi dû re jî, sedemên sazûmanî hene: ji bilî ambargoya amerîkî, lêkolîner balê dikişînin ser lawazî û newekheviyên hundir ên sîstema aborî û herweha bandorên bêyom ên di aboriya welêt de bikaranîna bi hev re ya du pereyan, yek jê yê lawaz (peso) û yê din jî yê xurt (pesoyê ku dikare were serfkirin). Pirsgirêkeke din: berhemdariya pirr qels a sektora çandiniyê ya dewletê – tevî ku sektora taybet % 70'yê berhemên neteweyî hildiberîne jî – ku ferz dike ku welat bêtirî ji sê paran duyê xwarina xwe ji derve bikirre. Ji bo Raul Castro ev mijarek e ku yekser bi "*ewlekariya neteweyî*" ve girêdayî ye. Em behsa hilberîna şekir bikin (di 2010'an de nêzî milyonek ton berhem) ku ji gellek salan û vir ve her ku diçe kêm dibe, rojnameya Partiya Kommunîst a Kubayê (PCC) *Granma*'yê ew weke "*xembar*" nirxand.

Ji dema ku hatiye ser karî û vir ve, ango ev çar sal çêbûn ku Raul Castro her dubare dike ku reformên "*tevnî*" xwe ferz dikin. Lê belê heta nuha bi tenê tedbîrên sînordar hatine qebûlkirin: di çandiniyê de (belavkirina erdên çandiniyê ya li şexsan) (3) û herweha di xizmetan de jî tedbîrên ji bo teşwîqkirina însiyatîfa taybet. Di daxuyaniyên fermî de, danezanên ku "wekhevîparêziyê" ji nû ve derdixin pêş û jêbirina subvansiyonên ku her ku diçe zêde dibe bi hev re dimeşin: di şîrketên dewletê de rakirina kantînan, kêmkirina bûrsan û hejmara qeydiyên zanîngehan, 5 salan zêdekirina temenê teqawîtbûnê û danezana îhtîmala jêbirina *libreta* (karneya pêdiviyên sereke). Van hemû biryaran kir ku fikar bi xelkê welêt re çêbibin, nexasim bi yên herî xizan re.

Li gorî texmînan, % 20'ê xelkê welêt di şert û mercên di bin sînorê xizaniyê de dijî (4). Lewma danezana NKK'yê destnîşan dike ku "*êdî ew ê ne mumkin be ku karkerên ji kar hatî derxistin werin parastin yan jî mirov meaşekî daîmî ji wan re misoger bike*". Birêvebirên sendîkayan dê "*di bin birêvebiriya partiyê de piştgiriyê*" bidin pêvajoyê. Karkerên ku ji kar hatine derxistin an divê berê xwe bidin sektorên dewletê yên ku pêdiviya wan bi karker û xebatkaran heye (çandinî, avahîsazî, pîşesazî), yan jî sektora taybet: karê bi serê xwe, koperatîf, kirêkirina xaniyan hin mînak in. Qanûneke nû ya demkurt hat qebûlkirin da ku derfet û îhtîmalan zêdetir bike. Bi vê qanûnê ve, weke mînak, destûr tê dayîn ku kar bidin xelkê, ev jî dibe ku destpêkeke bazareke karî pêk bîne. Em dibînin ku reformên aborî ku cîhekî gellekî zêdetir girîng didin bazarê pêk tên û awayên milkiyetê jî cihêreng dikin. Dewlet erka "*birêkûpêkkirinê*" digire ser milên xwe û dema ku vê dike jî xwe ji gellek barên mesrefên civakî jî xilas dike.

Lê belê, gelo bi rastî ev yek baweriyê dide, eger mirov pêşniyarî kesên ji kar hatî d erxistin (karker, karmendên dewletê) bike ku bibin cotkar an jî karkerên avahîsaziyê? Gelo kar û barên sektora taybet dê karibin cîhê karên jêbirî bigirin? Gellek kes gumanê jê dikin û biryarên bi awayekî burokratîk hatine girtin rexne dikin. Ji ber vê jî 6. Kongreya Partiya Komunîst ya Kubayê hate taloqkirin (5). Ji salan û vir ve ye ku qeyranê nîqaşek li ser stratejiya bipêşxistin û mercên parastina destketiyên civakî derxistiye holê. Helwêsta kesên ku derdikevin derveyî xeta fermî li aliyekî, em dikarin bi awayekî şematîk bibêjin ku sê meyilên cihê – yên nebiryardar (ku tim diçin û tên) – di nava rejîmê bi xwe de hene.

Di serî de meyila koma birêvebir û partîzanên reformên lîberal heye. Ev komek e ku bi awayekî berfereh ji aliyê Raul Castro ve hat nûkirin. Burokratên ji eskeriyê tên di nava vê komê de xwediyê gellek wezifeyan in. Ji bo wan "wekhevîparêzî" û "paternalîzm (6)" – ku weke parastineke civakî ya zêde û ne weke desteserkirina desthilatdariyê tê dîtin – çavkaniya tevahiya zehmetiyan in. Wan vê dawiyê piştgiriya Fidel Castro a pratîk jî stend. Nuha ew hêrî bîra wê nabin ku sedemên berhemdariya kêm a kar û bêkêriya sîstemê analîz bikin, lê belê kêmbûna motîvasyona karkeran tawanbar dikin. Dema ku Raul Castro 1'ê tebaxa 2010'an da zanîn ku "*nabe ku Kuba bibe yekane welatê ser rûyê erdê ku mirov lê bêyî ku kar bike bijî*" nerazîbûneke mezin dida der: sedema nekirina kar pirrî caran ji ber karekî neqanûnî ye ku ji bo jiyanê pêwîst e. Dibe ku mirov ji eskerên ku midûrên şîrketan in bibihîse ku li pêşiya Kubayê tu rêya din nîne û divê "*weke Vîetnam û Çînê*" xwe li şert û mercên globalbûnê bîne; bê guman, ew ê taybetmendiyên xwe jî li ber çavan bigire. Tirsa veşartî ew e ku girêdana zêde ya yekser a bi Venezuella re welêt qels û lawaz bike, çawa berê rewşa bi Yekîtiya Sovyetan re wisa bû. Venezuella hevkarê sereke yê Kubayê ye, danûstendinên herdu welatan yên bi hev re % 18.5'ê firotina ber bi derve ve ya Kubayê, % 29.2'ê kirîna wê ya ji derve pêk tîne; di nava vî hesabî de nod û şeş hezar warîl petrola rojane ku Venezuella dide Kubayê jî nîne.

Helwêsta duyem, pirrî caran weke muhafezakar tê nirxandin û ji berpirsiyarên Partiya Komunîst ya Kubayê û hin kadroyên birêveberiyê pêk tê. Ew ji ber tecrubeya "Gorbaçevê sêhrbaz yê xeşîm" tirsiyane û ji ber wê naxwazin tu tiştî biguherin, lewre ditirsin ku pêvajoyeke weha bidin destpêkirin ku nikaribe were kontrolkirin. Herçend kêm caran daxuyaniyan didin jî, ew hêzeke laşgiran a têra xwe girîng in.
Hestiyariyeke sêyem ku xwe pirr dide der, nihêrîna întellektuel, xwendekar, milîtanên Partiya Komunîst ya Kubayê û hunermendan e. Ev derdor pêşniyar dikin ku demokrasiya siyasî û civakî hem di saziyan û hem jî li cîhên hilberînê were firehkirin. Lê belê heterojenbûna vê tevgera ku "kesên ji warên cude di navê de ne", zirarê li wê dike.

### "Daxwaza me ne yekdengiyeke lihevçêkirî ye"

Pedro Campos jî ku kevne-dîplomatek e û berê di wezareta karê hundir de xebitiye, di 2008'an de "pêşniyarên bernamewarî ji bo sosyalîzmeke demokratîk û weha ku herkesî re vekirî be" aşkere kiribûn (7). Ev pêşniyar tu carî nebûn mijara nîqaşên xelkê welatî. Yên ku li zengila hawarê dixin, bi xwe gellek in. Ew dixwazin ku şert û mercên beşdarbûn û xwebirêvebirinê werin nîqaşkirin da ku "vê *modela ku kapasîteya xwe ya liberxwedanê ku di nava wê de hebû wenda kiriye"* were guhertin (8). Leonardo Padura bi awayekî hişk dikeve navberê: "*hukumet naxwaze sîstema siyasî reforme bike* (…) *ew li çareseriyên din ên aborî digerre ku wê pozîsyona wê ya siyasî xurt bikin* (9)."

Nîqaşên li ser opsiyonên stratejîk li gellek navendên zanîngehan (10), di kovarên navdar ên mîna *Temas*'ê yan jî li ser înternetê (li girava serjimara wê yanzdeh milyon e, milyonek û şeşsedhezar bikarhênerên înternetê hene) tên teşwîqkirin. Dîsa jî çapemeniya mezin a neteweyî ku di kontrola Partiya Komunîst de ye û cîh neda van nîqaşan, tevî ku Serokdewletê Kubayê bi xwe beriya du salan ev yek weke pêwîst nirxandibû: "*daxwaza me ne yekdengiyeke lihevçêkirî ye, çi li ser vê mijarê û çi li ser mijareke din* (11)."

Piştî ku sala 2003'an di berdana girtiyan de bi rola navbênkar rabû, dêr jî bûye yek ji cîhên kêm yên nîqaşan ku ji herkesî re vekirî ye. Weke mînak em dikarin behsa 10. hefteya civakî ya katolîk bikin ku li Hawanayê entellektuelên ji Bakurê Amerîkayê û yên Kubayî anîn cem hev û axaftin û nîqaşên wê jî di kovara *Espacio Laical* de hatin weşandin (12). Kardînal Ortega bang li papa Benedîktê 16. kir da ku sala 2012'an, ango sala hilbijartinên serokdewletiyê, biçe serdana Kubayê. Li aliyê din, têkiliyên di navbera Hawana û Washingtonê de jî bi giranî hêdî bi pêş ve dikevin. Tevî ku hevdîtinên li ser tûrîzm û pîşesaziya petrolê – bi awayekî neberbiçav – pêk hatin, ambargo dewam dike. Bi awayekî nakokane îhtîmala pêşîlêvekirineke aborî ya welêt ku şîrketên amerîkî doza wê dikin, dibe sedema peydabûna fikarên kovara *Foreign Affairs*'ê ku guman li ser nîne ku dosta giravê be: pêşketineke bi vî rengî "*bê guman, dê pîşesaziya tendurustiyê ya Kubayê lawaz bike.* (…) *Serêpêşî, ji ber ku bi hezaran doktor û hemşîreyên kubayî dê ji welêt derkevin, tevna wê ya tenduristiya gelemperiyê dê bi îhtîmaleke mezin texrîb bibe. Wekî din, şîrketên amerîkî yên ku armanca wan kar e, dê karibin a ku ji ber sîstema tenduristiyê mayî veguherînin navnîşana sereke ya pîşesaziya tûrîzma tibbî* (13)".

Gelo divê em weke *Wall Street Journal*'ê bigihin encama "*bernameya jikarderxistinê ya mezin*", Kuba "*berê xwe dide ber bi Kapîtalîzmê ve* (14)"? Tevî ku îhtîmaleke bi vî rengî ji aliyê rayedarên kubayî ve ji binî ve tê redkirin jî, nabe ku mirov vê îhtmalê jî nebîne. Pêkhatina nû ya civakî ku encama reformên bazarê yên salên 1990'î ye, ya rastî bi kêrî peydabûna burjûwaziyeke piçûk a nû tê û dike ku newekheviyeke belloq nexasim beramberî xelkê reşik derkeve holê (15). Ji bo lêkolîner Armando Chaguaceda "*heger rola bazarê weke aktorê aboriya neteweyî yê birêkûpêkkirinê qat bi qat zêde bibe, ji ber nebûna mekanîzmayên kontrolê û demokrasiya karkeran, dibe ku bandora wê ya îdeolojîk rê li ber peydabûna burjûwaziyekê veke (bi şêwazeke qanûnî, lewre di pratîkê de vaye ew pêk tê jî) ku têkiliyên wê yên bi dewletê re û yên navneteweyî dê hebin* (16)".

Hingê, dawî dê li "modela civakî" ya kubayî bê.

* Li Enstîtuya Lêkolînên Bilind ên Amerîkaya Latîn (Institut des hautes études d'Amérique latine) a Parîsê dersdar e.

1 "Notas recientes sobre la economia en Cuba", *Espacio Laical*, Hawana, tîrmeh-îlon 2010

2 Têkiliya di navbera pîvana buhayan û firotina ber bi derve û ji derve kirînê de

3 Di gulana 2003'an de nêzî nehsed û bîst hezar hektar erd li şexsan hatin belavkirin. Lê belê nîvî ji van erdan yan nayê çandin yan jî zêdeyî heddê xwe tên çandin

4 Binihere: *Socialism and Democracy*, hejmar 52, "Cuban Perspectives on Cuban Socialism", Somerville (DYA), adara 2010'an

5 Kongreya berî ya dawîn, berî nuha bi sêzdeh salan civiyabû. Kongreya 6. diviya reformên hatî îlankirin, erê bikirana

6 Jêrenota wergêr: helwêsta ku weke baveke li yên li derveyî xwe dinihêre

7 Bixwîne: "Cuba en quête d'un modèle socialiste renouvelé", *Le Monde diplomatique*, çileya paşîna 2009'an

8 Roberto Cobas Avivar, *Kaosenlared*, 13'ê îlona 2010'an

9 IPS, Hawana, tebaxa 2010'an

10 Weke mînak kursiyê Haydée-Santamaria, enstîtuya Juan- Marinello

11 Axaftina 26'ê tîrmeha 2008'an li Santiagoya Kubayê

12 Ji aliyê Konseya Laîkan a metrantiya Hawanayê ve hat weşandin

13 Laurie Garrett, "Castrocare in Crisis", *Foreign Affairs,* New York, tîrmeh-tebax 2010

14 *The Wall Street Journal*, New York, 14'ê îlona 2010'an

15 Bixwîne: Mayra Espina, "Looking at Cuba today: Four assumptions and six interwined problems", *Socialism and Democracy*, hejmar 52, *li jor behsa vê çavkaniyê hat kirin*

16 Nameyeke elektronîk ku ji nivîskarî re 16'ê îlona 2010'an hat şandin

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

www.arsivakurdi.org

# Ji Referandûmê ber bi "Vebûnê" ve (Devama ji rûpela 1.)

(û herweha di serçavên nivîskî yên din ên pergala huqûqê ya turk de) mafên bingehîn ên kurd an jî komên netewî-etnîk ên din cih negirt. Her çend rasterat qala wan nayê kirin jî bi formulasyonên wekî "yekitiya dewletê ya bi welat û neteweya xwe re ku nabe ku bê parçekirin" qedexe û sînorkirin ku di serî de kurd û komên din ên netewî-etnîk ji xwe re hedef digirtin, hebûna xwe berdewam kir.

### Çima dest bîrdoziya fermî nadin?

Dewleta îroyîn a turk, li ser axa ku ji ber Împaratoriya Osmanî maye hatiye avakirin. Osmanî di Şerrê Yekemîn ê Cîhanê têk çûbûn û pirraniya erdên xwe ji dest dabûn. Di wê demê de, kadroyên westiyayî yên Îttîhat Terakkî, ku pirraniya wan leşkerên berê bûn û di navbera salên 1919-22'an de di dema şerrê "turk-yûnan" de bûbûn xwedî prestîj û derketibûn pêşî, di serdemeke weha de ku çînên berê hildiweşiyan û çînên nû hîna hêzdar nebûbûn, bi vegotinên "tevgerîna li ser navê berjewendiyên hevbeş ên herkesî" bûn hevparê deshilatdariya siyasî. Wan, di demeke kurt de, bi awayekî radîkal dest bi tasfiyekirina wan kesan kir, ku dikarîn bibin raqîbê wan, û herweha destgehên kelepûrî yên dewletê, ku wan kesan xwe dispartinê. Muxalefet çewsandin, saziyên olî xistin bin kontrola xwe, kurdên ku bi doza mafên xwe yên netewî-demokratîk dikirin bi zordestî tepisandin û wesayet û hêza xwe ya li ser deshilatdariya dewletê xurttir kir. Bi awayekî giştî, piştî cureyeke deshilatdariyê ya "demkî- navberî", ku di wan serdemên krîzê de pêk tên, ku ji ber êş û dijwariyên veguherînê de rû didin, li Turkiyeyê burokrasiya mîlîtarîst li cem hêza desthilatdar bîrdoziya xwe hilberand û bi xuyabûna xwe ya "li ser çînan" hegemonyaya xwe li ser civakê bi awayekî sazgehî ava kir. Wan herweha dewlet xist bin wesayeta xwe û weha xuya kir ku ew dikarin xwe nû bikin. Ev bîrdozî ku paşê navê Kemalîzm lê hat kirin û bû bîrdoziya fermî ya dewletê, xwedî du bigehan e: "sekularîzm" û "neteweperestî". Ev her du bingeh, heta roja îro bûn paldankên bingehîn daku burokrasiya mîlîtarist karibe îmtiyaz û wesayeta xwe ya li ser pergalê berdewam bike. Herçend "Sekularîzm" wekî jihevcudakirina karên dewletî û olî bê terîfkirin jî, di rastiyê de wateya wê ew e ku dewlet olê li jêr kontrola xwe bigire. "Neteweperestî" jî li beranber bîrdoziya Împaratoriya Osmaniyan a li ser bingeha entegrasyona ol-spartî, wekî berdewamkirina birdoziya dewletî ya "Turkkirinê" hat bikaranîn ku li ser "turkbûn" û pişavtinê hatibû spartin. Burokrasiya mîlîtarîst, ku îmtiyaz û wesayeta xwe li ser retorîkên "cudaxwazî" û "paşverûtiya olî" berdewam dikir, digel wê destûrê, ku piştî darbeya leşkerî ya 1980'î hatibû amadekirin, bû xwedî bingeh û derfetên berfirehtir.

Lê belê, burokrasiya mîlîtarîst, ku refleksên xwe yên siyaseta navxweyî û derveyî bi çaresernekirina pirsgirêka kurdî endeks kiriye û ji ber girîngiya xwe ya jeopolîtîk di têkiliyên xwe yên navneteweyî de navê "*dest jê nabe*" li xwe kiriye, ji ber ku nedikarî him bi rasyonelên xwe re, ku piştî "şerrê sar" hatibûn guhertin, û him jî bi hevkêşiyên siyasî yên nav welêt re di nav ahengekê de tev bigere, neçar mabû ku xwe ji hin eniyan vekêşe. Bi guhertinan ku bi demê re di destûra 82'an de hatin kirin, hin îmtiyazên wan ên destgehî hatin kêmkirin. Herweha, di çarçoveya "Zagonên Hevahengiyê ya YE'yê" de destûrmendiya deshilatdariyê hatin bisînorkirin ku Lijneya Ewlekariya Neteweyî (MGK) jî tê de ye. Di sala 2007'an de, herçend ber xwe jî da neçar ma ku kontrola xwe ya li ser serokkomariyê, ku wekî qeleheke di nav dewletê de bû, wenda bike. Bi guhertinên destûrî re jî, ku di 12'ê îlonê de bi referandûmê hatin qebûlkirin, îmtiyazên li ser burokrasiya dadmendî jî yan bi pirranî hatin sînordarkirin yan jî guhertin.

Her çend heta nuha îmtiyazên destgehî yên burokrasiya mîlîtarîst hatibin sînordarkirin jî sedema destînedana wan vegotin û felsefeyê, ku bingeha wan a îdeolojîk pêk tînin, bi pirsgirêka Kurdistanê re ji nêz ve têkildar e. Di domahiya salan de, her çend vegotinên înkarê ya îdeolojiya fermî pûç bûne jî nêzîktêdayina dewlet û civaka turk ya li ser Kurdistanê hîna jî di rêya Kemalîzmê de ne.

**Herçend di 28 salên dawî de destûra Turkiyeyê 17 caran hat guhertin û nîvê destûrê ji nû de hat nivîsandin jî tu caran dest nedan ruh û vegotina destûra 82'an.**

Ji sala 2002'an û vir ve, cergî ew bû hukumet, AKP'yê her tim piştgirî da polîtîkayên Serfermandariya Artêşê, da ku bi vî awayî bi pergalê re li hev bike. Di warê pirsgirêkên kronîk de û herweha di wan mijaran de, ku reform êdî pirr hewce ne, ji ber lidijderketina refên Kemalîst neçar ma ku paş de gav biavêje. Lê belê burokrasiya mîlîtarîst, ku xwe wekî notirvan û berevanê Kemalîzmê û têgihiştina wê ya "sekularîzm" û "dewleta unîter ku li ser neteweperestiya turk hatiye avakirin" teqsîr nekir û hewl da ku bi hinceta "sekularîzmê" AKP'yê tasfiye bike. Di dawiyê de, di rewşên man û nemanê de AKP rîsk girtin û hin gav avêtin da ku îmtiyazên burokrasiyên sivîl û leşkerî sînordar bike. Di meseleya Kurdistanê de jî, ku siyasetên înkar û îmhayê bi salan in bi kêr nayên, bêyî ku zêde dûrî vegotina fermî ya "yek netewe, yek ala, yek welat" bikevin, destûr hat dayîn ku kursên zimanê Kurdî werin vekirin û di radyo û televîzyonan de weşana bi Kurdî were kirin. Lê belê, AKP'yê bi awayekî sergirtî serî li formulasyonên din da û di van destûrdayînan de jî ji qestan navê Kurd nehat bikaranîn û hat gotin: "hînbûn" û "weşana bi devok û zaravayên kelepûrî ku welatî di jiyana rojane de bikar tînin". Ev yek dikare were gotin ku di dema deshilatdariya xwe ya 8 salî de, AKP'yê ji bilî garantîkirin û berfirehtirkirina desthilatdariya xwe ne hewl daye ku ruh û vegotina destûra 82'an biguherîne ne jî xwedî daxwaz bû wan ku biguherîne. Gotinên wekî "biratiya olî" an jî "hevwelatiya destûrî" jî têr nekir ku vegotina dijberî Kurd a destûrê bê guhertin.

Ji hêla din ve jî, digel rûdan û pêşveçûnên li dunya û Rojhilata Navîn di warê pirsgirêka Kurdistanê



YÛSIV BEKIR: **Dê û zarok**, 50 cm x 60 cm, teknîka tevlihev ya ser tûwalê

de statukoyên kevn hejiyan. Ji ber ku nikarîbûn biryardariya gelê Kurd a ji bo têkoşînê bişkînin û herweha avabûna dewleteke federe ya li Başûrê Kurdistanê, bûn sedem ku êdî siyaseta înkarê wateya xwe wenda bike.

Bi awayekî paralel, di demeke weha de, ku tê de li seranserî dunyayê girîngiya serçav û rêyên stratejîk ên enerjiyê zêde dibin, da ku gaza sirûştî ya Kurdistanê bigihîje Ewropayê, Projeya Nabucco hat rojevê. Di vê çarçoveyê de, herweha ji bo seqemgîrî û ewlekariya li herêmê daxwaz û pêşniyazên navneteweyî jî derketin pêş. Hêzên navneteweyî ku girîngiyê didin projeya Nabuccoyê ku çav li rê ye ku di warê enerjiyê de pêwîstiya Ewropayê ya bi Rûsyayê kêmtir bike, şîret kirin daku di meseleya kurd de hin gav bên avêtin. AKP'ya ku di nav avabûna heterojen a kurd de piştgiriyeke ne hindik bi dest xistiye, di şûna polîtîkayên klasîk ên înkarê de, lê bêyî ku ji vegotina "yek netewe, yek ala, yek welat" pirr dûr bikeve, destûra weşan û kûrsên Kurdî da.

### Referandûma 12'ê îlonê û helwesta boykotê ya BDP'yê

Pakêta 25 xalî ya guhertinên dawî, nemaze di warê avabûn û destûrmendiya burokrasiya dadmendî de ji wan guhertinan bûn ku heta nuha herî zêde li serî nîqaş hatin kirin. Hukumeta AKP'yê di avabûna Lijneya Bilind a Dadger û Dozgeran (LBDD) û herweha Dadgeha Destûrî de hin guhertin pêk anîn, ku yek ji qelehên burokrasiya sivîl û leşkerî bû û bi biryarên xwe yên vê taliyê mudaxaleya siyasetê kiribû. Partiyên neteweperest û Kemalîst bi tûndî li dijî van guhertinan derketin da ku rêyê li ber têkçûyina statukoyê bigirin. AKP'yê, her çend pirraniya wê ya di parlamentoyê de sînordar bû jî, 20 parlamenterên BDP'yê, ku pêkan bû ku piştgirî bidana guhertinan, paş guhan de avêtin û berê xwe neda wan. Digel ku BDP li ser guhertinan hûr bûbû û lêkolînek encam dabû û daxwaz û pêşniyazên xwe ragihandibûn, AKP jê reviya da ku pê re diyalogekê daneyne. Li ser vê yekê, BDP'yê jî helwesta paşguhkirina AKP'yê û operasyonên li dij partiya xwe wekî Saddam nîşan dan û piştgirî nedan guhertinan, di destê yekem de bi tenê di çend dengdanan de beşdar bû û di destê duyem de qet tev lê nebû. Xala li ser partiyan ku BDP'yê ji nêz ve têkildar dike, ji ber ku têra xwe deng negirtibû nehat qebûlkirin.

Ev helwesta BDP'yê ya beşdarnebûna dengdanan ji ber ku bi awayekî fîlî dê bihataya wateya piştgirîdana eniya redkirinê, bû sedema gelek nîqaşan. Digel vê yekê jî BDP'yê di referandûma 12'ê îlonê de helwesta xwe ya boykotê berdewam kir. BDP'yê di daxuyaniya xwe de biryara xwe ya boykotê weha bi bingeh dikir: "daku nîşan bidin ku ne ku alternatîf nînin" û "nîşandana vîna wan kesan ku li derveyî eniyên belê-na destûreke demokratîk/nû dixwazin". Di hefteyên din de jî daxwazên "xweseriya demokratîk û perwerdehiya bi zimanê dayikê" derketin pêşî.

Biryara BDP'yê ya boykotê di nav kurdan de bi awayên cihêreng deng veda. Çawa ku hin kurd piştgirî dan boykotê ji ber ku di destûrê de tu tiştekî li ser kurdan nebû herweha hin kurd digotin ku ev referandûm ne ji bo destûreke nû ye lê belê ji bo guherandina 25 xalên destûra heyî ye ku dikare wesayet û statukoya heyî sînordar bike ku tê de jî berjewendiya kurdan heye.

Lê li seranserî Kurdistanê pirraniya xelkê herçend digotin ku "*ne bes in*" jî ne li dijî guhertinan bûn. DTP'yê rîskeke mezin girt, biryara "boykotê" da û eniya "*belê*" ji AKP'yê re hişt. Ji ber ku aşkere bû ku heger biryara boykotê nehataya dayin pirraniya dengdayên BDP'yê dê dengên xwe bi kar bianiyana. Lê bi boykotê, rîskeke din jî hebû: heger di referandûma 12'ê îlonê de wekî encam "na" derketaya, hingê DTP dê di bin berpirsiyariyeke giran de bima. Hevdem, guncav e ku kesek ku li jêr şert û mercên normal de dengê xwe dabû DTP'yê, di referandûmê de beşdar bûye û dengê "belê" daye. Wê demê rîsk hebû ku ev dengên "belê" karîbû ji bo AKP'yê jî bihatana hesabkirin û rêjeya boykotê gellek kêm derketaya.

**Ev yek nîşan dide ku referandûm ne bi tenê li ser destûrê bû lê herweha li ser hevdîtinên di navbera karbidestên dewletê û kurdan de bû.**

Di encamê de BDP'yê, her çend car caran got ku heger daxwazên wan bê bicihanîn ew dikarin li ser biryara boykotê careke din bifikirin û bi vî awayî deriyê bazarê vekirî hişt jî, bi dû re biryara xwe ya "boykotê" berdewam kir. Weha jî AKP'yê dikarî li ser dengên "belê", BDP'yê jî dikarî li ser rêjeya "boykotê" hêza xwe nîşan bidaya.

Mijareke din ku di pêvajoya referandûmê de derket pêş û pirr bal kişand ew bû ku AKP'yê ku ji mij ve li dij BDP'yê helwesteke hişk nîşan dida, bi awayekî ku kes ne li bendê bû, bernameyên xwe yên "vebûnê" derxist pêşî û heta "hevdîtinên dewletê yên bi Abdullah Öcalan re" jî anîn rojevê. Ev helwesta AKP'yê ku beriya referandûmê gellek bi rîsk bû, ji aliyê nivîskarê rojnameya Tarafê Alper Görmüs ve wekî ku hukumetê "van hevdîtinên dewletê jî dibe referandûmê" hat şîrovekirin. Ji xwe piştî referandûmê nûçeyên li ser van hevdîtinan bi awayekî eşkeretir hatin rojevê.

### Encamên Referandûmê

Di referandûma 12'ê îlonê de beşdarbûn gihîşt ji sedî 76 û 58 dersedê wan got belê, 42 dersedê wan jî got na. Daku mirov bikare helwesta boykotê ya BDP'yê binirxîne ka li Kurdistan û Turkiyê çiqas bi bandor bû divê mirov dengên DTP'yê ku di hilbijartinên berê da stendibûn binihêre. Li gorî wan, di hilbijartinên Lijneyên Giştî yên Wîlayetan a 2009'an de rêjeya beşdarbûnê ji sedî 85 bû û DTP'yê ji sedî 5,7 AKP'yê ji sedî 38,3 deng stendibûn. Di referadûma 12'ê îlonê de rêjeya beşdarbûnê, bi kêmbûneke ji sedî 9, bû ji sedî 76. Dijwar e ku ka çi qasî ji vê ferqa 9 dersedî rêjeya boykotê ye. Ji ber ku di hilbijartinên 2007 û 2009'an de rêjeyên beşdarbûnê hema hema wekî hev bûn, û em bêjin heger boykot nebûya dê dîsa ewqas kes di hilbijartinan de beşdar bûbûna wê demê dikare bê îdîakirin ku rêjeya boykotê ji sedî 9 e.

Lê belê heger em bi heman gumankirinê lê binihêrin, dema ku referandûm û hilbijartinên 2009'an bên muqayesekirin, diyar dibe ku herî kêm li 10 bajaran dengê DTP nîspet bi 2009 kêmtir bûye. Ev ferq li bajarên wekî Bingol, Bilîs, Mûş û Sêrtê bi ser 10 dersedî ketiye û bi tenê li çar bajaran deng zêde bûne (ev rêjeya zêdebûnê li Şirnexê ji sedî 10'î zêdetir e). Ji aliyê din ve jî, dengên ku AKP'yê di hilbijartinên 2009'an de stendibûn bi dengên "belê" bên muqayesekirin, derdikeve holê ku li 12 bajaran rêjeya "belê" bi gellekî bi ser dengên AKP'yê yên sala 2009'an ketine. Bi tenê li 3 bajaran (ku Hekarî û Şirnexê ji ber boykotê û li Dêrsimê jî ber dengên na) ev rêje ne ewqas zêde bû.

| Bajar | Beşdarbûna sala 2009'an | Rêjeya dengên DTP'yê (2009) (rêjeya hemû dengdaran) | Rêjeya dengên AKP'yê (2009) (rêjeya hemû dengdaran) | Beşdarbûna referandûmê | Ferqa beşdarbûnê (nîspet bi dengên DTP'ê 2009) | Dengên Belê (Nispet bi dengên AKP 2009) |
|---|---|---|---|---|---|---|
| Semsûr | % 86 | % 6 (% 5) | % 49 (% 41)** | % 82 | % 4 (-% 1) | % 65 (+ % 24) |
| Agirî | % 79 | % 38 (% 28)* | % 28 (% 21) | % 56 | % 23 (-% 5) | % 52 (+% 31) |
| Êlih | % 80 | % 53 (% 41)* | % 36 (% 27) | % 37 | % 43 (+% 2) | % 35 (+ 8) |
| Çewlik | % 80 | % 21 (% 16) | % 39 (% 30)** | % 77 | % 3 (-% 13) | % 71 (+% 41) |
| Bilîs | % 82 | % 28 (% 22) | % 32 (% 25)** | % 70 | % 12 (-% 10) | % 62 (+% 37) |
| Amed | % 82 | % 60 (% 47)* | % 31 (% 24) | % 35 | % 47 (+-% 0) | % 31 (+% 7) |
| Îdir | % 82 | % 44 (% 34)* | % 23 (% 18) | % 51 | % 31 (-% 3) | % 27 (+ % 9) |
| Colemêrg | % 86 | % 72 (% 60)* | % 21 (% 17) | % 9 | % 77 (+%5) | % 8 (-% 9) |
| Mêrdîn | % 81 | % 47 (% 34)* | % 29 (% 21) | % 43 | % 38 (+% 4) | % 38 (+% 17) |
| Mûş | % 78 | % 45 (% 34)* | % 32 (% 24) | % 54 | % 24 (-% 10) | % 48 (+% 24) |
| Sêrt | % 87 | % 38 (% 31)* | % 35 (% 29) | % 74 | % 13 (-% 18) | % 66 (+% 37) |
| Dêrsim | % 81 | % 20 (% 16)* | % 20 (% 15) | % 66 | % 15 (-% 1) | % 13 (- % 2) |
| Riha | % 83 | % 19 (% 15) | % 38 (% 31)** | % 70 | % 13 (-% 2) | % 65 (+% 34) |
| Wan | % 81 | % 48 (% 38)* | % 34 (% 27) | % 44 | % 37 (-% 1) | % 39 (+% 12) |
| Şirnex | % 86 | % 60 (% 50)* | % 27 (% 22) | % 22 | % 64 (+%14) | % 17 (-% 5) |

LMDK

Yek ji encamên girîng ên muqayeseyeke weha ew e ku di nav wan 15 bajaran de ku hatin muqayesekirin, herî kêm li 9 bajaran rêjeya beşdarbûna di referandûmê de li jêr 60 dersedî ye (ev rêje li 6 bajaran li jêr ji sedî 50 ye jî). Lewma mirov dikare bibêje ku herçend carcaran pirsgirêk rû bidin jî BDP bandora xwe ya li Kurdistanê bi rêjeye bilind berdewam dike. Lê belê, her çend di sala 2009'an de DTP li 11 bajaran wekî partiya yekem bû jî dema li encamên boykotê bê nihêrîn diyar dibe ku BDP di boykotê de encama ku hêvî dikir bi dest nexist. Ji xwe daneyên heyî nîşan didin ku li hin bajarên Kurdistanê kesên ku berê deng dane DTP'yê (yan jî partiyên din/serbixweyan) li gor boykotê tev negeriyane û di referandûmê de beşdar bûne û dengê erê bi kar anîne.

### Piştî Referandûmê gelo ji mutakereyê ber bi muzarekeyê?

Bêguman ewên ku di referandûma 12'ê îlonê de herî zêde têk çûn burokrasiya leşker-sivîl û muxalefeta neteweperest bûn ku CHP û MHP serkêşiya wê dikir. Beranber vê yekê AKP'yê di her hêlan de rewşa xwe hêzdartir kir. AKP'yê çawa ku rêjeya bilind a "belê" wekî serkeftina xwe bi nav kir herweha bi paşdebirina burokrasiya leşkerî û sivîl bû xwedî hêza berfirehtirkirina qada xwe ya desthilatdariyê. BDP'yê jî, ku encam bi awayekî xweşbîn, wekî "serkeftina daxwaza xweseriya demokratîk 'şîrove kirin, herçend bandora xwe ya li Kurdistanê parast jî li dij AKP'yê negihîşt encamekê ku pê rewşa xwe hêzdartir bike.

AKP'yê, ku ji referandûmê bi awayekî hêzdartir derket, pêşî soz da ku "bi tevlêbûna herkesî" destûreke nû çêbike. Herweha, AKP'yê bernameya xwe ya "rêlêvekirinê" dîsa anî rojevê, ku di salên çûyî de ji ber lidijderketina burokrasiya sivîl û leşkerî û herweha muxalefeta neteweperest dabû rawestandin. Di pêvajoya referandûmê de, li gorî teza ku digot "di referandûmê de hevdîtinên ji bo pirsgirêka Kurdî jî dê bên dengdanê", AKP digel BDP rûnişt û bi dengekî bilindtir diyar kir ku hin saziyên dewletê bi Abdullah Öcalan re hevdîtinan pêk tînin.

**Bêguman, ji bo çareseriyeke demokratîk û adilane ya pirsgirêka Kurdî, ku bi salan bi siyasetên şîddet, înkar û îmhayê lê nêzîk bûne û hêlên wê yên civakî û siyasî li hev ketine, pêvajoyeke dirêj û dijwar divê. Di vê serdemê de ku hîna gavên pêşîn tên avêtin, divê beriya her tiştî hawîrdoreke baweriya dualî bê afirandin.**

Herçend detayên wan nehatin aşkerekirin jî wekî ku çapemeniyê jî ragihand di hevdîtinan de pirranî çekberdana PKK'yê, siberoja hêzên çekdar, mafên çandî û zimanî, rêveberiyên herêmî hatin rojevê. Lê belê, Hukumeta Turk bi dilrehetiya xwe ya ji ber hêzdarkirina rewşa xwe, di serî de ragihand ku ew tu meseleyên wekî "federasyon", "xweserî", "perwerdehiya bi zimanê dayikê" nîqaş nakin, lewre ev mijar bi dewleta unîter re li hev nakin. Hukumetê diyar nekir ka kîjan mafan dê binase lê berevajî vê yekê diyar kir ka kîjan mafan nas nake. Bi awayekî giştî soz û waadên ku dikarin rewşa heyî hinekî jî pêş de bibin, ji aliyê gelê Kurd ve girîng tên dîtin û bi heyecanekê tên pêşwazîkirin. Lewma, nûçeyên li ser hevdîtinên bi BDP'yê re, bi Öcalan û PKK'yê re, li cem raya giştî ya Kurdan bû sedema hêvî û lêbendebûnên mezin. Di rewşa nuha de, ji hukumetê ji bilî çend mafên çandî yên sînordar tu waadên din nayên. Hukumet zimanê kurdî jî wekî zimanê dayîkê nas nake. Herweha çarçove û naveroka "vebûnê" hîna jî zelal nebûne. Weha xuya ye ku ew gav ku divê ji bo çareseriyeke adilane û demokratîk a ji bo pirsgirêka kurd bên avêtin, hê gellek dûr in. Bêguman, ji bo çareseriyeke demokratîk û adilane ya pirsgirêka kurd ku bi salan bi siyasetên şîddet, înkar û îmhayê lê nêzîk bûne û hêlên wê yên civakî û siyasî li hev ketine, pêvajoyeke dirêj û dijwar divê. Di vê serdemê de ku hîna gavên pêşîn tên avêtin, divê beriya her tiştî hawîrdoreke baweriya dualî bê afirandin.

Li hember fişara karbidestên tirk ku bi diyarkirina "ka ew çi qebûl nakin", di ser aliyê kurd de tê meşandin, divê kesên li ser navê gelê Kurd tev digerin beriya her tiştî di nav xwe de hevbîriyekê derxin holê û li gorî xwestekên gel daxwazên bingehîn bên zelalkirin. Ji bo wê jî, ji aliyekî ve sûdê ji mînakên serketî yên wekî Katalonya, Bask, Îrlandaya Bakûr, Kosova û hwd. bigirin û ji bo maweyên kurt û dirêj modelên muzakere û çareseriyê bi pêş de bixin û ji aliyê din de jî ji bo hin daxwazên maweya kurt çareseriyên berbiçav bînin rojevê.

Di nav mijarên maweya kurt de daxwazên wekî çêkirina destûreke nû ku tê de gelê Kurd jî tê naskirin, rakirina zagon û saziyên antî-demokratîk, hilbijartina rêvebiriyên herêmî, wergirtina sûda bêhtir ji serçavên aborî yên li herêmî, naskirina mafên çandî û zimanî ya bêkêmasî û çareseriyên pratîk ên wekî "efûyeke giştî", "Komîsyonên Rastiyan" û hwd. cih bigirin.

* Huqûqnas

Wergera ji turkî: A. Celîl Kaya

www.arsivakurdi.org

## Dîroka paralel ya sîlehan û ya şerran

# Ji bo bêhtir kuştinê bêhtir aqil

Jean Paul Hébert * û Philippe Rekacewicz

Gelo ji dîroka sedsala 20'an çi di bîra mirov de dimîne? Dûrî deverên li ser lihevkirî, Le Monde diplomatique atlaseke rexneyî diweşîne ku tê de vedigere ser bûyerên ku berê wan guherî û pêşketinên ku behsa wan nehatiye kirin: ji dîktatorên "cîhana azad" heta bi serhildana Kamerûnê ya jibîrkirî, ji şoreşa veguheztinê heta bi aboriya ku bi serdestiya çandiniyê ve ava bûbû. Di sedsala bihurî de ku du şerrên cîhanî şopa xwe lê hişt û bi dû re dawiya şerrê sar jî dît, pirgirêk jî li gorî guherînên siyasî û şoreşên teknolojîk bi pêş ve ketin. Hunerê şerrî bi xêra hişê mirovî xurttir bû, lê hejmara qurbaniyan dîsa jî kêm nebû û zêdetir bû...

Di sedsala 20'an de nêzî sed û çil şerrî qewimîn, didu ji wan yên "cîhanê" bûn; 15 ji wan her yekî bûn sedema mirina bêhtirî milyonek mirovî. Beriya 1939'an bîstûpênc şerr û sed û panzdeh jî, ji 1945'an û pê ve qewimîne. Bi "pêşketinên" pêşxistina sîlehên nû yên her diçe buhatir û pêşketîtir dibin, rîtm hêdî hêdî bileztir dibe, qet nebe heta dawiya şerrê sar rewş weha bû. Piştî 1991'ê û jihevketina Yekîtiya Sovyet, şerrên di navbera dewletan de şûna xwe her ku diçe bêhtir ji şerrên navxweyî re dihêle.

Li derdora Şerrê Cîhanê yê Yekemîn xisletên ku wê di dehsalên paşê de xwe bidana der, pêk hatin. Hilberîna sîlehan bû xwediyê xisleta hilberîna pîşeyî ya girseyî: bi vî rengî weke mînak di navbera 1914 û 1918'an de Fransayê 51 hezar û 700 balafir çêkirin û barê hilberîna ji bo şerr jî li milê milyonek û 800 hezar mirovî kir. Şerr herweha ketin dîmenziyona xwe ya siseyan jî, hem li hewayê bi balafiran û hem jî di bin deryayê de bi keştiyên binê deryayê. Mekanîka bi rêya makîneyên zirxî ji bo yekîneyên suwarî şoreşek bû. Di serî de ji bo tesbîtkirina hedefên topan, komunikasiyon êdî ne bi rêya peyamnêran û borezanan lê belê bi rêya telefonan pêk dihat (di dawiya 1918'an de 30 hezar hatin kirîn),
Ev herweha çûna ber bi dêwbûnê (kalîbre, tonaj, rîtma gulleavêtina mîtralyozan) û sîlehên "nû" (kîmyewî) ve ye jî. Ev xislet hemû wê di şerrê din ê topyekûn ê girseyî de ango di Şerrê Cîhanê yê Duyemîn de heta bi qonaxa herî bilind ve bên birin.

### Şerrê Rojhilat-Rojava yê ku şerrên azadiya neteweyî bi xwe re anîn

Sala 1905'an, li hemberî Japonyayê têkçûna Rûsan hê hingê bûbû nîşana yekemîn tehlûkeya li dijî hêzên li gorî rê û resmê û yekemîn binketina "zilamê spî". Di şerrên berxwedana li dijî kolonyalîzmê, di navbera 1918 û 1939'an de serhildêran karibû hin caran di muharebeyan de bi ser bikevin, lê serkevtina bi tevahî bi dest nexistin (şerrê li Rîfê [1]). Şerrên navxweyî bi dijwarî û zehmetiya xwe cihê dibin (li Rûsya û Çînê), li aliyê din şerrê navxweyî yê li Spanyayê (1936-1939) dikir ku mirov bi şerrê mezin ê di navbera 1939 û 1945'an de bihise.

Sîleha kîmyewî bi aweyekî zêde cara pêşî di dema Şerrê Cîhanê yê Yekem de hat bikaranîn û sivîl jixwe bûbûn mexdûrên wê. Bikaranîna vê sîlehê di dema şerrên koloniyal de belav bû; ji aliyê Brîtanyayê ve li Iraqê yan jî ji aliyê Îtalyayê ve li Lîbyayê. Guernica (2) navê bombebarandina ji hewayê ya mezin a li Ewropayê ye, ev kiryara bombekirina bajaran di dema Şerrê Cîhanê yê Duyemîn de bi awayekî giştî belav bû. Bi vê yekê pêşketina sîlehên klasîk di asta herî jêr de ma. Sîlehên vedîtî guhertinê bileztir dikin: radar, balafirên ji leza deng dibihurin, roketên dij-zirx, tivingên otomatîk, mîtralyozên giran, agiravêj, bombeyên şewatê, bombeyên dij-zirx ên 10 tonî, motorên pêşî yên ji dûr ve tên kontrolkirin, fuze (V1 û V2), sonar, cîhazên înfrasor, sîstemên naskirinê yên elektromanyetîk û hwd. Aliyê pîşesaziyê jî qonaxekê diguhere: Almanya, Brîtanya û Yekîtiya Sovyet her yekî 100 hezar balafir hildiberînin; Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê 320 hezar balafir çêdike. Herweha 2 milyon kamyon, ewqas cîp, 220 hezar makîneyên zirxî jî di bandên montajê yên amerîkî re derbas dibin… Bombebarandina tevahiya bajaran (London, Dresden) gihişte asteke heta hingê nehatî dîtin. Di dawiyê de du bombeyên atomî ku DYA'yê avêtin Japonyayê, kirin ku dunya bikeve serdema nukleer û mêzîna terorê.

Piştî Şerrê Cîhanê yê Duyemîn liberhevrabûna Rêxistina Peymana Bakûrê Atlantîkê (NATO) û Pakta Warşovayê di bin tehdîta nukleer de pêk dihat. Washington û Moskovayê 30 hezar serikên fuzeyan ên stratejîk û 20 hezarên taktîk kom kirin. Ev sîlehên nukleer bi rihetî têrê dikin ku dunya gellek caran bê xirabkirin. Vê yekê şerrên li Ewropaya ku herdu hêzên mezin ji hev dike, cemidandin û ew birin keviyan, welatên ku me yê navê dunyaya sêyem li wan bikira. Şerrê îdeolojîk û şerrên azadiya Îndoçînê.

Van şerran êdî erdên ceribandina sîlehên nû û doktrînên erkan pêk dianî: Fransayê li Cezayîrê bikaranîna taktîk a helîkopteran û prensîbên şerrê "dij-şoreşger" teorîze dikir ku hewl dida, bersivê bide stratejîstên çînî yan jî vîetnamî yên şerrê "şoreşger". Li Vîetnamê US-Air Force'ê yekem car bombeyên "biaqil" (tam li armancê dixin) bi kar anîn û bi miqdarên mezin bikaranîna sîlehên kîmyewî organîze kirin (ji bo werandina pelên daran bikaranîna Agent Orange'ê [3]). Di şerrê hezîrana 1967'an ê li Rojhilata Navîn de yekem car fuzeyên li dijî keştiyan hatin bikaranîn.

### Mesrefa leşkerî ya welatên herî dewlemend zêdetir bû

Dawiya çavê hev tirsandina herdu hêzên mezin ku bi jihevdeketina Yekîtiya Sovyetan re hat, rê li ber destpêka serdemeke kaosê vekir: ji hingê ve şerr ji kontrolê derketin û her diçe bêhtir şerrên navxweyî şûna şerrên di navbera dewletan de digirin. Bi şerrê kendavê (1991) û "şerrên insanî" re di heman demê de fuzeyên dij-fuzeyan û fuzeyên keştiyan bê qisûr dibin û cebilxaneya tam li armancê dixe, "êrîşên emeliyatî" yên navdar ên ku dîsa jî xwe ji lêxistina sivîlan venadin, bi awayekî giştî tên bikaranîn. Çi li dijî Sirbîstanê (1999), çi li dijî Afganîstanê (2001) û çi li dijî Iraqê (2003) artêşa serketî nikaribe sedîsed ceribandina (xwe parastina binketiyan) veguherîne û kontrola li ser "binketiyan" misoger bike jî, newekheviya hêzên klasîk ewqasî zêde ye ku encama şerr qet cîhê nîqaşê nîne.

Li Rojhilata Navîn bi awayekî daîmî teknîkên şerrê bajêr tên ceribandin: sîlehên terorê li dijî şêniyan şerr nakin (bombeyên fosforê, topên obusan ên pirrgulle, teqemeniyên DIME, û hwd.), bikaranîna mirovan weke mertal, buldozerên dêw, di dîwarên xaniyan re derbas bûn, bikaranîna balafirên bê mirov ên kontrolê û yên êrîşê, bi satelîtan çarçik bi çarçik dabeşkirina civakî, kontrola agahdariyan, kuştinên nîşanjêgirtî.
Di şerrên ku artêşên rojavayî li Afganîstan û Iraqê bi rê ve dibin de, êdî dest ji van teknîkan nabe bê berdan, li aliyê din derdikeve holê ku malzemeyên gellekî pêşketî yên ku li dijî artêşa sor hatin pêşxistin, pirrî caran bêkêr in.

Li dijî vê, serhildêr teknîkên kevnar ên pêşneketî lê bikêrhatî bi kar tînin, yên weke Improvised explosive device (IED, mekanîzmaya teqemeniya lihevçêkirî) yên li kêlekên rêyan tên bicîhkirin yan jî helbet di êrîşên întîharî de tên bikaranîn. Daku bersivê bide van êrîşan, DYA her diçe bêhtir balafirên bê mirov û kuştinên nîşanjêgirtî yên "terorîstan" bi kar tîne (4) û pirrî caran diwêre ku li armanca şaş jî bixe û sivîlan bikuje.

Buhayê sîlehan ecêb zêde dibe: Buhayê B2 balafireke bombebaranê ya tîpa B2 ji butceya salana ya eskerî ya 122 welatan bêhtir e, tevî ku bikaranîna wê li derveyî şerrekî di navbera Dewletên Yekbûyî û Çînê de weha xuya dike ku têra xwe zehmet e jî. Kombûna mesrefên eskerî qat bi qat zêde dibe: Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê nîvê mesrefên eskerî yên dunyayê dikin û deh dewlet ji çar paran siseyê mesrefa eskerî a dunyayê dikin. Dema kontrola ji fezayê ya belavbûyî, bi sîlehên enerjiya tê kontrolkirin û materyalên bê personel re tê bikaranîn, ev yek rê li ber perspektîvên kuştina dûrtir, bileztir û buhatir vedike. Ev sîleh hem pirraniya caran nikarin bersivê bidin pirsgirêkên serhildanên gel, hem jî kuştina sivîlan kêm nakin ku mexdûrên sereke yên şerran in.



Yûsiv Bekir: **Dê û zarok**, 250 cm x 60 cm, teknîka tevlihev ya ser tûwalê

* Lêkolîner li Navenda interdîsîplîner ya lêkolînên li ser aştî û lêkolînên stratejîk (Cirpes). Jean-Paul Hébert 21'ê hezîrana 2010'an çû ser dilovaniya xwe. Berî wê bi çend rojan versiyona yekem ya vê nivîsê dabû kovara L'Atlas Histoire.

1 Salên 1920'î, eşîrên Rîfê yên fasî, bi pêşengiya Abd El Kerim ve, li dijî dagîrkerên spanî û fransî rabûn

2 26'ê nîsana 1937'an, hêzên hewayî yên alman ku hevpeymanên spanî bûn gundê baskî yê bi navê Guernica dan ber bombeyan. Ev kirina wan ji aliyê Picasso ve di tabloya bi heman navî de bû nemir.

3 Bixwîne: Francis Gendreau, "Au Vietnam l'agent orange tue encore" (Li Vietnaê ajanê portekîzî hê jî dikuje), *Le Monde diplomatique*, çileya paşîna 2006'an

4 Bixwîne: Laurent Checola û Edouard Pflimlin, "Drones, la mort qui vient du ciel" (Balafirên bê mirov, mirina ku ji ezmanan tê), *Le Monde diplomatique*, çileya pêşîna 2009'an

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

Banqeya Natixisê henekê xwe pê dikir û digot "li Îrlandayê dîsa baran dibare". Dublînê bala xwe dayê ku bernameya wê tedbîran -ya ku diviya razîner qane bikirana- têkçûyina wê xurttir dike û dibe sedema ku bazar xeman jê bixwe. Şagirta keltîk ya baş bi vî awayî hindik maye ku weke Yûnanistanê topê biavêje û nikaribe deynê xwe bide. Modela îrlandî careke din jî parçe dibe, lê vê carê belkî nikaribe weke carên din bi mûcîzeyan jê bifilite.

## Ji kêfxweşiya medyatîk ber bi pirsgirêkên civakî ve

# Çar canên modela Îrlandî

Renaud Lambert

*Dema beriya çend hefteyan wezîrê bazirganî, pîşesazî û tûrîzmê yê Kolombiyayê çû serdana Wall Street Journal'ê, Îrlanda yek ji wan mijaran bû ku ez herî kêm li bendê bûm ku behsa wê bihataya kirin. Bi rengekî ku min gellekî matmayî bihêle, ev mijara pêşî bû ku wî behsa wê kir.*" Destpêka adara 2008'an rojnamevan Mary Anastasia O'Grady ecêbmayî pê dihesiya: "*Bogotá ji nêz ve eleqeyê nîşanî modela îrlandî dide.*" (*Wall Street Journal*, 25'ê adara 2008'an. Lê belê gelo ev daxwaz û hewesa kolombiyayî ji dil bû?

Serokwezîrê Fransayê yê wê demê Jean-Pierre Raffarin bi kelecan digot "*ez bi tenê awantajan di modela îrlandî de dibînim*" ev "*çîrokeke serketinê ya rasteqîn e*" ku "*peyamekê dide Fransayê*" (Dublin, 24'ê gulana 2004'an). Saleke paşê, weşaneke fermî ya hukumeta Lîtwanyayê dida zanîn ku Vilnius (paytexta Lîtwanyayê) li pêşiya xwe weke armanc datîne ku "*senaryoya mezinbûna aboriyê ya îrlandî li welatê xwe jî pêk bînin (1).*" Hema piştî re partiya muhafezakar a Ingilistanê kar û barê xwe kir daku biçe "*bişopîne ka li aliyê din yê deryaya îrlandî çi diqewime û jê fêr bibe.*" Di heman demê de li Jamaîkayê karsazan ji xwe dipirsî: "*Em çi dersan ji serkevtina fenomenal a Îrlandayê derxin?*" Hempîşeyên wan ên li Quebecê ji wan pêştir in: Îrlanda bêguman "*modela herî li gorî*" herêma wan e (2). Ji rastgirên Letonyayî heta bi Konseya Neteweyî ya karsazên macar, ji partiya komarxwaz a Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê heta bi odeya bazirganiyê ya amarîkano-ûrûguayî li her deverê heman çavdêrî heye: "*dem çi dibe bila bibe, herêma cografî çi dibe bila bibe, modela îrlandî stratejiyek e ku mumkin e ji bo welatên din jî bi kêr bê (3).*"

Destpêka her tiştî dawiya salên 1990'î bû ku aboriya îrlandî bi lez û bez mezin bû: Di navbera 1994 û 2004'an de mezinbûna hilberîna welêt a brut (HWB) di ber hev de gihişte salê ji sedî 7'an. Ev rêjeya mezinbûnê du caran ji ya Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û sê caran ji ya herêma Euroyê bi leztir bû. Di çapemeniyê de li ber guh û çavên herkesî diket ku "mûcîze" piştî reformên "lîberal" çêbûye. Deh salan piştî ku welat mehkûmî "*felaketê*" kir (16'ê çileya paşîna 1988'an), kovara heftane *The Economist*'ê ev hukmê xwe sererast kir: "*Îrlandayê bi awayekî ku cîh ji nîqaşan re nemîne, nîşan da ku*" heger mirov hembêza xwe li "globalbûnê" veke *"ev rêya herî bi lez a ber bi dewlemendbûnê ve ye*" (15'ê gulana 1997'an).

Heger ji quncikên *New York Times*'ê heta bi yên *le Figaro*'yê, ji yên *Wall Street Journal*'ê heta bi yên *Libération*'ê girava zimrûdî (Îrlanda) bandora xwe li hemûyan dike, sedema wê ew e ku bi awayekî giştî qebûlkirî, "mûcîzeya îrlandî", ya lîberalîzmê derdixe pêş.

### Çima na?

Di çileya pêşîna 1995'an de Fransî daketin qadan. Kovara *Capital* ji wan re rave dike ku li Dublinê "*hevparên civakî* (…) *bi rola xwe rabûn*" û "*hilmek oksîjen dane şîrketan*". Ji sala 1987'an û vir ve "hevpariyeke civakî" dewlet, karsaz û sendîka bi hev ve girê dan, armanca vê yekê ya sereke "girtina meaşan ya di nava pîvanan de" bû. Encam: "*lêçûna kêm a li meaşan û sendîkayên nerm, îmaja ji berê ve ya welatekî gundan yê dest pê nebûyî, tune kir*" (*Le Point*, 6'ê nîsana 1996'an). Lê belê hewldanên îrlandî ne bi tenê bi helwêsta wan a sendîkayî sînorkirî ye. *Le Point*'ê "*siyaseta aboriya wêrek a ku jê hat ku bala şîrketên biyanî bikişîne*" pîroz dikir (23'ê tebaxa 1997'an). Çawa? Baca li ser şîrketan daxiste % 10'an (4), ev rêjeya baca li ser şîrketan a herî kêm e li Ewropayê. Wekî din, komara Îrlandayê destûra "buhalêkirinên transferê (transfer pricing)" dide û ev jî dike ku şîrketên navneteweyî karên xwe li welatê ku di warê bacdayînê de ji bo wan herî baş e, hilbijêrin. Di vê qadê de tu kes bi Îrlandayê nikare: rayedarên wê tercîh kir " [bi vî rengî hatiye nivîsîn] *erka xwe ya kontrolê betal bikin*" (5).

Di pirraniya welatên ewropî de hunereke bi vî rengî dê rê li ber newekheviyê vekira. Ew dîsa jî bandora xwe li *Brussels Journal*'ê dike. Ji mêj ve "*dengê muhafezakarên li Ewropayê*" pirrcarî dike ku "bi kêmkirina bacan û burokrasiyê" mirov rê li ber mezinbûna aboriyê vedike: "*Îrlanda nîşan dide ku ev mumkin e û dibêje ka divê çawa bê kirin jî*" (25'ê çiriya paşîna 2005'an). Di van şert û mercan de şîrketên navneteweyî diherikin Îrlandayê. Di warê vegera welêt a kar de Îrlanda hilkişiya rêza bihuşta pêşî ya bacê ya cîhanê (cîhê wê li pêşiya Bermûdayê ye): ev karê li welêt vedigere digihîje heta bi % 20'ê HWB'yê. Di van şertan de aborîzan tercîh dikin karûbarên aborî yên Îrlandayê ne bi HWB belê bi Hilberîna Neteweyî ya Brut (HNB) bipîvin (6). Lewre, tevî piçûkahiya xwe (bi tenê % 1'ê serjimara ewropayê pêk tîne), ew ji çar paran pareke perelêrazandinên amerîkî yên girêdayî vekirina cîhên nû yên hilberînê, dikişîne. Hin welatiyên Fransayê jî vê rêyê didin ber xwe ku bernameya nûçeyan a kanala televizyonê France 2'yê, 22'ê hezîrana 2005'an, hevpeyvînek li ser weşand. "Afirînerekî dewlemendiyê" di vê hevpeyvînê de weha behsa welatê lê ji dayik bûyî dike: "*zêde barên bacan hene! Pirr zêde ne barên bacan!*" Rojnamevanek jî niherîneke din rave dike: "*Li Îrlandayê bac pirr kêm in û hiqûqa wê ya civakî jî gellekî nerm e.*"

Dîsa jî di "nexşerêya îrlandî" de tu tiştê bi rastî jî îstîsnayî nîne. Bi xetên wê yên mezin – bi navê "bernameyên sererastkirinê yên strukturel" – ev nexşerê li ser welatên din jî hat ferzkirin; weke mînak li Amerîkaya latîn. Mirov ji vê demê û şûn ve çawa rave bike ku "modela lîberal" evqas "mucîze" neanîn dunyayê? Dibe ku sedema vê ew be ku mezinbûna aborî ya Îrlandayê zêde ne eleqedarî tercîhên bihevguherandina serbest (libre-échangiste) ên birêvebirên kelt be. Hin hêmanên din vê yekê bêhtir zelal dikin. Em ji azadbûna jinan a pêşverû dest pê bikin. Sala 1992'an amûr û dermanên ku pêşiyê li ducanbûnê digirin hatin qanûnîkirin. Vê yekê rê li ber kêmbûneke xurt a rêjeya çêkirina zarokan vekir. Jinên îrlandî bi awayekî girseyî ketin bazara kar û kapasîteyên hilberîner ên welêt ku heta hingê yên herî qels ên Ewropayê bûn, xurt kirin.

Ango mirov dikare "mûcîzeyê" bi telafîkirina "asayî" ya aboriyeke derengmayî jî rave bike. Em bi rengekî din bibêjin: mirov nikare bibêje ku Îrlandayê "sûd" ji sermayeya biyanî ya ku wê deriyê xwe lê vekiriye girt, wê bêhtir ji kapasîteyên mezin ên hilberînê ku bi buhayekî erzan hatin pêşkêşkirinê vê sermayeya biyanî sûd wergirt. Di heman demê de komara Îrlandayê dûçarî encamên her şêwaz hêdîkirina kar a mêvanên xwe bû. Wexta ji salên 2000'î û pê ve aboriya Amerîkayê giran bû, "pilingê kelt" qerisî.

Lê belê ji her pirsgirêkê re çareseriya wê ya mînak heye: ji aboriya Îrlandayê hat ku hilmeke din peyda bike û modela îrlandî jî karîbû jiyaneke duyem peyda bike. Weke li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, dewletê destek da pêşketina krediyê, "ruhê vedîtinê" yê bankeyan û beriya her tiştî spekulasyona li ser milk. Buhayê avahiyan sê caran ji Fransayê bilindtir zêde dibin û avahîsazî bi carekê ve li her deverê peyda bûn. Tu eleqeya vê jî bi erza bazara aborî re nebû. Di demeke kurt de % 17'ê hatinên dewletê ji bacên sektora avahîsaziyê hat. Hîç ne xema IMF'yê bû. Di 2004'an de birêvebirên wê "*performansên hê jî weke berê hêja yên aboriya îrlandî ya xwe dispêre polîtîk-ekonomiyên zindî pîroz dikirin*" û digotin "*ev polîtîk-ekonomî ji bo welatên din jî mînakeke kêrhatî ye (7)*". Gelo para meaşên di nirxê zêdekirî de li gorî deverên din ên Ewropayê, berovajî newekheviyê – ku gurr bû – bi leztir kêm bû? Çi xem e: edîtorê ewqasî pîroz ku nabe ku mirov navê wî rake yê *New York Times*'ê Thomas Friedman alternatîfa ku li ber Fransa û Almanyayê ye bi kurtî weha rave dikir: "*yan wê veguherin Îrlandayê, yan jî wê veguherin muzeyê*" (1'ê tîrmeha 2005'an).

Em bi dewama wê dizanin. Dunya dê hêdî hedî noqî krîza malî bibe, aboriya Îrlandayê dê berjêr bigindire, borsaya Dublinê dê bi carekê bikeve. Sala 2008'an bêkarî % 85 zêde bû – zêdebûna herî xurt a li rojavayê Ewropayê – û hatina dewletê jî, % 13 kêm bû. Îrlanda bû dewleta ku pêşî kete dewra paşketina aborî. "Modelên" din bi kêmtir berdêldayînê derbasî nifşên siberojê bûn. Dîsa jî weke sîmirê lîberal ê ku xwe ji agirê xwe diafirîne daku dermanên xwe yên ji ziraran re ku ew bû sedema wan, ferz bike, "modela îrlandî" careke din ji mirina xwe bi xwe sax filitî û her weke berê, rêyê nîşan dide. Rêya siyaseta şidandî ya aboriyê. Di bin gopalê Dublinê de "xedariya" civakî xwe li dilpakiyê danî. Ev "eqlî selîmî" lê tê – lê belê êdî ev veguherî adetekê – ku "weke modela ji bo welatên din ên herêma euroyê bê dîtin" (*Financial Times*, 21'ê tîrmeha 2010'an). Mûçeyên karmendên dewletê hat kêmkirin (heta bi % 20'an), alîkariya malbatan % 10 hat kêmkirin, bi heman rengî ji tevahiya xizmetên civakî hat kêmkirin. Dema ku di sibata 2010'an de Ewropa hizir dike ku Yûnanistan divê di asketîzma butceyê de "gavên hê radîkaltir biavêje", helbet bi awayekî xwezayî Almanya şîretan lê dike … ku "*weke Îrlandayê bike*" (*Reuters*, 16'ê sibata 2010'an).

Di nîsanê de Komîsyona Ewropayê – ji nû ve – giravê pîroz dike: li mînaka baş a siyaseta şidandî ya aboriyê, modeleke "hevgirtina civakî" jî zêde dibe. Rast e ku hêrsa îrlandiyan xwe bi zor dide der. Nasnameya partiyên siyasî li dora mijara serxwebûnê pêk hatiye – yên ku ew dianîn hemberî hev; lihevkirina lîberal ew kirin yek. Sendîka, me dît ku fêrî dilpakiyên "diyaloga civakî" bûn. Xelkê welêt hê jî bi cudatiyên civakî yên katolîk/protestan re ewqasî mijûl e ku carinan girîngiyê bi cudatiyên çînên civakî tînin dijberî hev, nade. Koçberî – ya ku bi awayekî xurt ji nû ve dest pê kir (8) – êdî ji bo yên ku herî zêde nerazî ne, hêvî ye daku li deverên din jiyaneke çêtir ava bikin.

Ji nîsana 2009'an ve wezîrê maliyê yê Îrlanda Brian Lenihan bi van gotinan xwe bi xwe pîroz kir: "*kapasîteya me ya ku em xwe li ber êş û azarê digirin, bandorê li hevkarên me yên li Ewropayê dike.*" Lenihan weha dewam dike: "*heger li Fransayê ev yek bihataya ceribandin, wê xelk serî hilbidaya*". Salekê piştî re, beriya ku butceya xwe ya siyaseta şidandî ya aboriyê eşkere bikin muhafezakarên brîtanî – ji hingê ve tevî hevgirên xwe yên demokratên lîberal desthilatdar in – ji nû ve berê awirên xwe zîvirandin aliyê din ê deryaya Îrlandayê: "*nûnerên wezareta maliyeyê demeke dirêj bi rêya telefonê bi Dublinê re peyivîn daku* (…) *fahm bikin ka hukumeta koalîsyonê ya îrlandî çawa dikarî mesrefên xwe kêm bike, bêyî ku bibe sedema nerazîbûneke tûnd a civakî ku me li Yûnanistanê dît*" (*Financial Times*, 23'ê gulana 2010'an).

Bi dû re, "modela îrlandî" ji nû ve kiras diguhere – jiyaneke çarem – ku kêm heyranan ji xwe re çêdike. *Financial Times*'ê 10'ê gulana 2010'an misoger digot "*heke Îrlandayê weke ku kiriye tev negeriyaya, îhtîmal bû ku dawiya wê jî bibûya mîna ya Yûnanistanê*". Bi tenê sê meh di ser re bihurîn û mafê Atînayê heye ku bibişire. *Wall Street Journal*'ê bi xwe tiştên ku wê bi xwe gotibûn sererast kir: "*heta beriya demeke kurt me bawer dikir ku bi xêra bernameyeke êrîşkar a qutkirinên ji butceyê yên herî girîng ên herêma euroyê, Îrlanda dê karibe pirsgirêkên xwe yên malî çareser bike. Lê belê him pirsgirêkên Îrlandayê dewam dikin û him jî krediya wê ya li cem karsazan jî lawaz bû*" (9'ê îlona 2010'an). *Wall Street Journal* dîsa jî bawer nake ku *ji ber* zirarên ku hişkbûna îrlandî dibe sedem, senaryoyeke mîna "ya Yûnanistanê" peyda bibe.

Êdî tu kes behsa "mûcîzeyê" nake, lê belê mirov dikare pirr tiştan ji tecrubeya îrlandî fêr bibe. Weke mînak, li ser mijara bikêrhatîbûna siyasetên şidandî yên aboriyê. Pererazandin di 2008'an de % 15 kêm bûn, di 2009'an de ev rêje % 30 bû. Ji ber zexta qutkirinên ji butceyê, kêmkirina meaşan û kêmkirina mesrefên civakî, berxwarin sala 2009'an % 7 kêm bû. Ango karûbarên aborî şahidî li serdema xwe ya herî oyforîk kirin: HNB sala 2008'an % 3 û sala 2009'an % 11 kêm bû. Li gorî ajansa notdayinê *Standard & Poor's*, xilaskirina bankeyan ku çala bêbinî ye, kir ku deyn qat bi qat ji berê zêde bibin. Di 2001'ê de deyn % 33'ê HWB'yê bû, di 2012'an de dibe ku % 110'an bibihure. Lihevderneketina butceyê di 2010'an de wê bigihîje … % 20'ê HWB'yê û % 23'ê HNB'yê. Ev rêjeyeke weha ye ku kêm tê dîtin. Li gorî ahenga midûrê rojnameya sikoçî *The Scotsman*'ê, Bill Jamieson partîzanên siyaseta şidandî ya aboriyê doh dan zanîn ku "tecrûbeya îrlandî bi rexneya Keynes re li hev nake. Ev rexne dibêje ku qutkirinên ji butceyê li dijî hilberînê ne, lewre ew aboriyê hinekî din noqî xirabebûnê dikin" (5'ê tîrmeha 2010'an). Gelo guhertina dawî ya "modela îrlandî" dê bike ku partîzanên siyaseta şidandî ya aboriyê tiştên ku weke misoger dibînin êdî nerm bikin?

Xuya ye ku ji bo IMF'yê bersiv na ye. Di tebaxa 2010'an de, bi awayekî, ji ya xwe gavê paş de neavêje, IMF'yê ji Dublinê xwast ku "*qutkirinên butceyê yên nû bide destpêkirin daku baweriya ku bazar pê tîne dewam bike*" (*Financial Times*, 26'ê tebaxa 2010'an).

1 Çavkanî: Fintan O'Toole, *Ship of Fools. How Stupidity and Corruption Sank the Celtic Tiger*, Faber and Faber, London, 2010

2 *Perspectives*, Montréal, 30'ê nîsana 2008'an

3 Encamnameya konferanseke tebaxa 2007'an ku ji aliyê Société des Amériques ve hatibû sazkirin

4 Ji 2003'an û bi şûn ve, % 12.5

5 Broşura ku hukumetê belav kiriye û Fintan O'Toole behs kiriye

6 HWB nirxê berhemdariya welatekî dipîve û di hesabê de guh nade hemwelatîbûna şîrketên ku tev lê dibin. HNB jî diyardeya dewlemendiya ku niştecîhên wî welatî li bazarên navxweyî an jî li derveyî derdixin holê. Yanî, HNB kara ku şîrketên navneteweyî tînin ser axa welatî nahesibîne

7 Çavkanî: Jim O'Leary, "External surveillance of Irish fiscal policy during the boom", blog *The Irish Economy*, tîrmeh 2010

8 Sala 2009'an di nava Yekîtiya Ewropî de welatê yekem bû herî zêde xelkê berê xwe didayê (9 ji 1000'î). Piştî wê jî Lîtwanya dihat (4.6 ji 1000'î)

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

# Osmanîzma Nû? (Devama ji rûpela 1.)

Ez hewlê didim ku bi rêya vê lêkolînê re bingeh û armancên siyaseta nû ya herêmî ya Turk zelal bikim, bingeh û armancên dîrokî û stratejîk diyar bikim. Herweha ez dixwazim pirsên ku ji bo siyaseta derve ya turk balkêş in, bînim zimên û bidim xuyakirin ka heta kîjan radeyê ev siyaset serkeftî yan neserkeftî ye.

## 2- Siyaseta nû ya herêmî ya turkan û efsaneya "Osmanîzma nû":

Têgeha Osmanîzma nû ji bo ronîkirina vegera Turkiyeyê ya ber bi aliyê çarçoveya xwe ya cografî-siyasî-dîrokî ve hatiye bikaranîn. Ev têgeh, li gor çavdêr û zanyarên navneteweyî, guhdana Turkiyeyê ya bi derdora wê ya herêmî re destnîşan dike, her wekî ku Bülent Arınç dibêje: ev têgeh pirsên hesas ên mîna vegera Turkiyeyê li rola xwe ya wek hêzên girîng, radixîne (1).

Dibe ku ev yek bi xwe bingeha Xeyreddîn Hesîb, girîngtirîn rewşenbîrên fikra neteweyî ya Ereban be ku bi awayekî aşkere têgeha Osmanîzma nû napejirîne û di heman demê de jî bi germî pêşwaziya helwesta erênî ya hukumeta Ak Partiyê dike. Anku wê helwesta li ser doz û pirsên ereban û di serî de li ser pirsa nakokiya Ereb û Îsraîlê. Herweha bûye bingeh ku X. Hesîb helwesta Turkiyeyê ya berî û piştî şerrê DYA'yê li Iraqê pirr erênî binirxîne (2).

Avakerê siyaseta nûjen a herêmî ya turk, wezîrê derve yê hukumeta Erdoğan, Ahmet Davutoğlu, têgeha Osmanîzma nû vedigerîne xelekeke dîrokî/kulturî û hew. Anku Turkiye û herêmên ereban ku berê di nav sînorên Dewleta Osmanî de bûn, di ezmûnên dîrokî yên nêzîkî hev re derbas bûne. Bêguman ew dixwaze di rêya vê danasîna xwe ya hûr ya têgeha Osmanîzma nû re, rêyê li ber wê bigire ku kesek nekeve gumana ku Turkiye di derbarê têkiliyên ereb û turkan de dixwaze serdest û xwedî bandor be.

Siyaseta nû ya herêmî ya turk ne bi tenê tê wê wateyê ku Turkiye dê vegere çarçoveya xwe ya dîrokî, lê herweha ew tê wateya danîna stratejiyeke aktîv a herêmî, ku di têkiliyên digel hevbeşên xwe yên herêmî de roleke bingehîn disipêre Turkiyeyê. Aşkere ye ku ev pirseke zor e û ji bo ku were pêkanîn, divê her aliyek berjewendiyên stratejîk ên aliyê din jî bipejirîne.

Girêdayî bi têgeha "Vegerê" re jî, tê zanîn ku Turkiye di her merheleyên xwe yên borî de, ji roja ku Kemal Atatürk dawî li xîlafeta osmanî anî, ne dûrî rojhilata navîn bû. Lê rola herêmî ya Turkiyeyê di serdema şerrê sar de wekî ku aşkere ye, girêdayî stratejiyên eniya rojava bû; di sala 1952'an de tevlêbûna peymana NATO'yê, beşdariya çalak a Turkiyeyê di peymana Bexdayê de ku di sala 1955'an de hat girêdan, ev tev de didin xuyakirin ku Turkiye di siyaseta xwe ya herêmî de wefadara mercên şerrê sar bû. Elîtên turk tu carî nebû meyldarên pirsgirêkên erebî (3).

Tam berevajî, Turkiye di rêya gefxwarinên leşkerî re, wekî ku di sala 1957'an de gef li Sûriyeyê xwar, xwast ku dewletên Ereb dûrî siyaseta dijberiya stratejiyên rojavayî bike.
Balkêş e ku Turkiyeyê zêde guh nedaye cîhana ereb û bi taybetî di salên şêstî û heftêyî ji sedsala bîstan de, qet xwe li wan nedikir xwedî. Têkiliyên Turkiye û dewletên ereb ên cîran – ji bilî hevkariya wê ya digel Iraqê ya li ser pirsa kurdî– hergav aloz bûn. Heta hinek nêzîkayiyên di warê berjewendiyan de ku di salên nodî de pêk hatin û hiştin ku Turkiye bi rengekî peryodîk bi Sûriye û Îranê re ji bo kontrolkirina rewşa herêma Kurdan ên li bakûrê Iraqê li hev bike, nikarîbûn aloziya têkiliyan sist bikin. Nakokiyên sereke pirsa avê û beş û para Sûriye û Iraqê ya ji ava Dicle û Firatê bûn ku ji Turkiyeyê diherikin. Wekî ku tê zanîn Sûriyeyê tim gazin ji kêmbûna ava çemê Feratê dikir, nemaze piştî pêkanîna projeya GAP'ê ya li Turkiyeyê. Di vê pirsê de, pirsa para her dewleteke ji ava çemên Dîcle û Feratê, Sûriyeyê helwestên zagonî nîşan dan ku ne mîna helwestên Turkiyeyê bûn (4).

Ji bilî doza avê, pirsa piştgiriya Sûriyeyê ya ji PKK'yê re, bû meseleyeke xeternak û herdu dewlet gihandin keviyên şerr. Turkiyeyê dewleta Sûriye bi alîkarî dayîna vê partiyê sûcdar dikir ku di sala 1984'an de li dijî Turkiyeyê şerrekî çekdarî îlan kiribû. Hîna di salên heştêyî de, medyaya turk hin belge weşandin ku tê de kampên perwerdehiya leşkerî yên PKK'yê yên li deşta Bekaya Lubnanê û herweha li Sûriyeyê dihatin nîşandan. Herçend Turkiyeyê di her hevdîtina xwe de ku bi rayedarên Sûriye re pêk dianî, ew belge nîşan didan jî Sûriyeyê bi her awayî ew yek red dikir û nerast didît (5).

PKK di destê Sûriyeyê de karteke pêwîst bû ku dikarî wê li dijî cîrana xwe bi kar bîne ku di warê pirsa avê de serhişkî dikir. Digel wê jî, Turkiye têkiliyên xwe yên leşkerî û ewlekariyê yên bi Îsraîlê re ji nîvê salên nodî de kûrtir û xurttir kiribûn û xuya bû ku êdî hukumeta Mesut Yılmaz dixwast dawî li lîstikê bîne, anku dawî li alîkariya Sûriyeyê ya ji bo PKK'yê bîne. Bi rastî jî Turkiye di payîza 1998'an de di zimanê gefdana leşkerî li hember Sûriyeyê – eger ku ew israr bike û piştgiriyê bide çekdarên kurd-bi kar anî.

Ji nişkê ve, ev doza ku tenê du aliyan eleqedar dikirin bû dozeke herêmî û dewletên ereb, Misir jî di nav de, hewl dan ku têkevin navberê daku dawî li krîzê bînin (6).

Turkiye bi rik bû ku piştgiriya Sûriyeyê ya ji bo PKK'yê qut bike, eger na dê şerr îlan bikira. Dawiya dawî Sûriye têgihişt ku divê ew dev ji vê karta zextê, yanî piştgiriya PKK, berde.

Lê mesele ne bi tenê bi qewitandina Abdullah Öcalan û erkanên wî yên ji Sûriyê û herêma Lubnanê ku di bin kontrola Sûriyê de bû, diqediya. Herweha peymanek hate îmzekirin ku ji têkiliyên herdu dewletan re bingehên nû damezrandin. Aşkere ye ku Turkiyeyê şertên xwe di peymana Adanayê de ku sala 1999'an imze bû, ferz kirin. Sûriyeyê di pratîkê de, ne tenê şertên siyasî yên Turkiyeyê pejirandin, lê wê herweha dev ji xwestekên xwe yên derbarê wîlayeta Îskenderûnê (Hatay, Werger) berda ku sala 1939'an tev li komara Turkiyeyê bû. Herweha Sûriyeyê da xuyakirin ku ew amade ye, di pirsa tevgerên çekdar ên sînorbuhêr de alîkariyê bike ku ew tevger li Turkiyeyê wekî tevgerên terorîst têne binavkirin (7).

Piştî peymana Adanayê, têkiliyên Turkiye û Sûriyeyê baş bûn, bi taybetî jî, piştî hilbijartinên sala 2002'an ku tê de AK Partî bi pirraniya dengan bi ser ket û di encamê de hukumeteke nû saz kir. Ji wê salê ve hukumeta Ak Partiyê helwest dane xuyakirin ku rê ji başbûn û kûrkirina têkiliyên ereb û turk re vekirin. Turkiyeyê di şerrê Iraqê yê 2003'an de nehişt ku artêşa DYA'yê axa Turkiyeyê bi kar bîne û ev yek jî nîşaneyeke aşkere ya nêzîkbûna Turkiyeyê bû beramber helwestên dewlet û raya giştî ya ereban. Lê ev bi tu awayî nayê wê wateyê ku di pêşerojê de helwestên Turkiyeyê jî dê bi helwestên herêmî û navnetewî yên ereban re bibin yek. Lewra ajandayeke Turkiyeyê heye ku di xizmeta berjewendiyên xwe yên taybet de ye, lê ev yek nayê wê wateyê ku divê ew berjewendî li dijî yên dewletên herêmê bin.

Siyaseta derve ya Turkiyeyê bi şexsê Ahmet Davutoğlu ve hate girêdan ku di sala 2002'an de şêwirmendê siyaseta derve yê Gül/Erdoğan bû. Bingeha ku wî jê dest pê kir ew bû ku rola Turkiyeyê ya herêmî di rêya xurtkirina têkiliyên bi dewletên herêmê re kûr û berfireh bike û şebekeya têkiliyên xurt ên siyasî, aborî û kulturî ava bike. Di vî warî de, Davutoğlu dixwaze ku nakokiyên herêmî çareser bike û bingeha têkiliyên dualî ku di navbera Turkiye û cîranan de ne, bihêz bike. Armanca wî herweha ew e ku mekanîzmayekê ava bike ku sînoran mîna faktorên hevbendiyê dibîne ne ku milletên cîran ji hev dabeş dike (8).

Duruşmeya Davutoğlu "du dewlet yek hukumet" ya ku wî di payîza sala 2009'an de di serdanên xwe yên Iraq û Sûriyeyê de her dubare dikir, işaretî wê armanca ku li pey xurtkirin û avakirina şebekeya têkiliyan e ku dê bihêle ew têkilî xurt û hêzdar û bi tesîr bin, hukumetên pêşerojên yên dewletên herêmê jî kîjan dibin bila bibin.

Di vê pêvajoyê de, Osmanîzm li ba Davutoğlu bi tu awayî ne stratejiyeke xweferzkirin û destdanînê ye, Osmanîzm işaretek e ji kûrahiya stratejîk a Turkiyeyê re (Strategic Depth) bi wateyên xwe yên dîrokî û kulturî (9).

Siyaseta derve ya Turkiyeyê ya li ser asta herêmî, têdigihîje ku astengiyên navxweyî yên Turkiyeyê, bi taybetî pirsa kurd ne tenê astengiyên sînorbuhêr in lê ew astengiyên herêmî ne ku ne alîkariya bi dewletên cîran re be, ew dê çareseriyê nebînin. Nemaze ku endamên PKK'yê bêyî razîbûna hêzên kurdên Iraqê û hukumeta Iraqê bi xwe, piştî heriftina rêjîma Saddam Huseyn a sala 2003'an bakûrê Iraqê ji bo xwe mîna qada bicihbûnê bi kar tînin (10).

Bi kurtî: siyaseta nû ya herêmî ya Turk, ne encama gêjen û aloziyên idolojîk e û ne jî encama efsaneyên dîrokî ye ku dixwazin dewra destdanîna osmanî li herêmê vegerînin. Lê ew pêwistiyeke siyasî ye ji stratejiyeke zîrek re ku armanca wê normalîzekirina têkiliyên bi dewletên cîran re ye û herweha çareserkirina pirsgirêkên sînorbuhêr û piştgiriya rola Turkiyeyê ji aliyê dunyayê ve û dawî jî hêsankirina tevlêbûna Yekîtiya Ewropayê.

Lê pirsa ku li vê qadê tê raxistin ev e: gelo di destê Turkiyeyê de malzemeyên pêwîst hene ku pê qenc bikare vê rola xwe ya herêmî bilîze?

## 3- Ereb û AK Partî:

Siyaseta derve ya Turkiyeyê, bi taybetî jî helwesta wê ya ji siyaseta Îsraîlê bûye gewhera guhdana ereban ji hukumeta Ak Partiyê re. Ev jî gellekî asayî xuya dike ji ber ku têkiliyên ewlekariyê yên Turkiye û Îsraîlê gellekî kûr çûbûn û di encamê de peymana ku di sala 1996'an hatibû imzekirin ev têkiliyên ewlekarî anîbûn asta herî bilind û êdî her hevkariyeke leşkerî (di navbera herdu dewletan de) bi rengekî ji rengan bandora wê li berjewendiyên ereb hebû.

Ji ber van sedeman, dewletên ereb û raya giştî ya ereb pêşwaziyeke germ ji guhertinên (ku di hundurê Turkiyeyê de qewimîbûn) re kirin bi taybetî piştî şerrê Lubnanê ya sala 2006'an. Derbarê helwesta giştî ya ereb a sebaret bi Ak Partiyê, em dikarin hin helwestên ji hev cuda bipên; hukumetên ereb zêde girîngiyeke mezin nadin bingeha Ak Partiyê ku ji hembêza partiya Fazîletê derketiye, ji ber ku gellek caran, daku metirsiyên hêzên hakim li Rojhilata Navîn kêm bike, Ak Partiyê dubare kiriye ku ew ne partiyeke islamîst e. Tiştekî seyr e ku di rewşa rojane de ku hukumetên ereb ên hakim û bi bîr û boçûnên xwe yên siyasî û civakî nêzîktirî partiyên laîk ên Turkiyeyê ne, lê di siyaseta herêmî de xwe nêzîktirî Ak Partiyê dibînin!

Hêzên laîk li Turkiyeyê tu carî bi çavên kêmaniyê li hevkariya kûr a ewlekariyê bi Îsraîlê re nanêrin, ew berê, ji ber ku Turkiye endama NATO'yê bû, ji rojavayê re hevpeymanên wefadar bûn.
Tiştê balkêş ew e ku helwestên hukumetên ereb ne bi qasî helwestên elîtên ereb û raya giştî rexnegir in, em dibînin ku hukumetên ereb siyaseta herêmî ya Turkiyeyê qenc dibînin, lê elîtên ereb bi çavên rexneyî li tevgerên Turkiyeyê dinêrin û ew di wê baweriyê de ne ku nakokiya li rojhilata navîn di navbera sê hêzan de ye: Turkiye, Îran û Îsraîl (11).

Sebaret vê mijarê, dewletên ereb yên bi tesîr, bûne du beş:

a- **Dewletên ku ji ber hoyên pragmatîk bi Turkiyeyê re têkiliyan datînin.**

b- **Dewletên ku ditirsin, dê rola ereb ji dest biçe. Ev dewlet durust nabînin ku dewleteke ne ereb rola serkêşiyê li welatê ereban bilîze.**

Li ba raya giştî jî, derbarê stratejî û siyasetên Ak Partiyê, ji ber serdestiya xîtaba siyasî ya herêmî em tu guhdanên mezin nabînin (12). Herweha gavavêtinên Ak Partiyê li Turkiyeyê yên ku girêdayî siyaseta hundurîn û civakî û aborî, cihekî mezin di bala raya giştî ya ereb de nagirin.

Hêza aborî ya Turkiyeyê bi şêweyekî gewre gavên bi pêş de avêtin piştî ku di serdema hukumetên neteweperest ên muhafezekar û laîk de rastî kirîzên peyapey hat (13).

Di pêvajoya hukumdariya Ak Partiyê de, Turkiye ji çarçoveya "dewletên ku pêdiviya wan bi alîkariyên derve re heye, derket û derbasî kluba dewletên alîkar bû". Bi vî awayî ew bû yekemîn dewleta ne petrolî ya li rojhilata navîn ku vê serkeftina dîrokî bi dest dixe (14).

Lê ereb -ên ku deriyên xwe ji mal û pirtalên turk re vekirin- mercên destana vê serkeftinê û rola hukumeta Ak Partiyê di pêşketinên siyasî û civakî de di guh xwe re nekirin.
Herweha mijara demokratîzekirina Turkiyeyê yan jî sîstema siyasî ya turk di serdema hukumdariya Ak Partiyê nikaribû bi awayekî gewre bala raya giştî ya erebî bikişîne. Hal ew e ku projeya demokratîzekirina Turkiyeyê heta asta xwe ya dawî nehatiye pêkanîn lê hin bi hin rewşa yekrengiya (Identification) dezgehên dewletê û sîstema siyasî ku muhra komara Turkiyeyê bû, diherife. Turkiye ji mêj ve wekî dewleteke kêmdemokratîk dihat nasîn ji ber ku têwerandina artêşê ya berdewam di siyasetê û tevgera saziya dadwerî de wek dezgeheke hêzdar û piştgira ideoljiyeke bi tenê ne jî sifet û akarên dewleteke nûjen û demokrat e.

Çavdêrekî ereb destnîşanî pêvajoya Ak Partiyê dike û dibêje ku nuha ew partiya populîst struktura komara Turkiyeyê diguherîn lê bêyî ku demokrasî yan jî laîkbûna wê komarê ji holê rake (15). Di gel gefdanên peyapey yên hêzên neteweperest ên laîk û dezgehên dewletê. Eynî ev çavdêr dibêje ku derdê mezin ê rêjîmên ereb ew e ku hêzên populîst dûr bixînin (16). Ew berdewam dike û dibêje ku hêzên populîst ji rejîmên demokratîk re tu carî ne metirsî ne ku ev rejîm li ser bingehên zagonî ava bûne, lê eger hat û tecrubeyeke wisa (anku mîna Ak Partiyê, Werger) li welatê ereban jî bi ser ket, dibe ku ew ne wekî mînaka turkan be ji ber ku ereban hukumetên li ser bingehên zagonî ku ji dev gel bi xwe hatibin hilbijartin nas nekirine û ji ber ku Demokrasî mîna şêweyekî hukumdariyê hîn li welatê ereban peyda nebûye.

## 4- Sînorên Turkiye wek medyatoreke herêmî:

Turkiye hewlê dide ku hêza nazik (Soft Power) mîna alavekî ji siyaseta xwe ya derve re bi kar bîne. Her wekî ku Davutoğlu destnîşan kiriye: armanca Turkiyeyê ne destdanîna ser herêmê ye, hedefa wê aştî û aramiya herêmê ye (17). Lê ji bo ku ev armanc pêk bê, divê di serî de bingeh ji hevkariya herêmî re ava bibin, paşê çare ji nakokiyên herêmê re peyda bibin, piştî re saziyên herêmî bênn damezrandin mîna saziyên li Ewropayê ku piştî şerrê sar û di dema aramiyê de nakokî çareser kirin.

Balkêş e ku hukumeta Ak Partiyê û wezîrê wê yê derve Davutoğlu serê xwe bi mijara saziyên herêmî re neêşandin û ev pirs her girêdayî wan komîteyên dualî mabû, ew komîteyên ku Turkiye cuda cuda bi dewletên cîran re saz kiribûn (18).

Eger em tecrubeyên ewropî û tecrubeya "konferansa ewlekarî û hevkariyê li Ewropa" di ber çavan re derbas bikin –mîna realîtekirina ramanên ku têkiliyên navnetewî organîze dikin û tesîrê li hukumetan derbarê têgeh û pirsên mîna mafê mirovan û çareseriya nakokiyan bi awayekî aştiyane dike-, em dê bibînin ku Turkiye û dewletên cîran gellekî dûrî pêkanîna van prensîbên navborî ne. Turkiye bi xwe – ji ber nakokiyên di hundurê dezgehên dewletê de-nikare bibe dewleteke nimûne ku di çareserkirina nakokiyên siyasî û civakî de xwe dispêre hêza nazik. Hema pirsa kurdî mezintirîn îmtihan e li pêşiya siyaseta herêmî ya turk, ew pirsa ku çareyeke lezgîn jê re divê, ji ber ku ew girêdayî siyaseta hundurîn a Turkiyeyê ye û herweha ew pirseke navherêmî ye ku têkiliyeke wê ya direkt bi berjewendiyên Turkiye û cîranên wê yên rojhilata navîn re heye. Heta nuha tu analîzvanekî turk nikarîbû mîna Metin Heper, pirsa

www.arsivakurd.org

kurdî di dîmenziyon û aliyên wê yên civakî û siyasî û dîrokî û aborî û kulturî de bibîne.

Heper di lêkolîna xwe ya "The State and Kurds in Turkey: The Question of Assimilation" de, dide xuyakirin ku siyaseta entegrekirina kurdan têk çûye. Îcar, divê êdî siyasetmedarên turk ji derveyî vê siyaseta têkçûyî "assimilation-resistance-suppresion" (pişavtin - berxwedan - pêkutî) li çareyekê bigerin (19). Ev siyaset di sedsala bîstan, di salên bîstan de gellekî hatiye dubarekirin.

Heper herweha dibîne, hêzên ku xwastin hebûna partîzanên PKK'yê di zivistana 2008/2009'an de li çiyayê Qendîlê bi darê zorê ji holê rakin, stratejiyeke ku ji destpêka komara Turkiyeyê de neserkeftî bû bi kar anîn.

Ezê careke din li usûl û prensîbên siyaseta herêmî ya ku li gor derbirîna Davutoğlu hêza nazik bi kar tîne, vegerim. Gelo ew prensîbên ku Davutoğlu û hukumeta Ak Partiyê pale didinê çi ne? Emê ne dûrî rastiyê bin gava ku bibêjin ramanên wezîrê derve yê Turkiyeyê Davutoğlu derdibire mîna kiryarên li gor usulan in û di gewherê xwe de ne bingeha siyaseteke nû ne ku dîsa em pirsa kurdî wek nimûne bibin. Pirsa li ber destan raxistî ew e danîna bingehên nû ji danûstendina bi doza kurdî re ya ku rê li ber mijaran xitimandiye ku Turkiye dixwaze wan çareser bike. Bi gotineke din, vegerandina faktorên ku nakiyan geş dikin bal bi asta sifirê ve.

Stratejîstên siyaseta herêmî ya turk qenc dizanin ku çareserkirina pirsa kurd li Turkiye û herêmê hewceyî danîna bingehin e ku dewletên herêmê yên têkildar li ser li hev bikin. Di qonaxên borî de û di hevdîtinên xwe yên periyodîk de salên nodî, dewletan li ser stratejiyekê ku rê li ber avakirina dewleteke kurd li Iraqê bigire, li hev kirin. Di eynî demê de hêzên kurd yên iraqî, bi alîkariya van dewletan û Turkiye jî di nav de, ji xwe re buroyên nîv-diplomatîk ava kirin (20).

Li aliyekî ve ev dewlet, damezrandina dewleteke kurdî li ser ewlekarî û hêminiya xwe mîna metirsiyeke mezin dibînin, li aliyekî din jî her dewletek ji van dewletan di wê tirsê de ne ku dewleta cîran hêzên kurd di destê xwe de ji bo pêkanîna berjewendiyên xwe bi kar bîne. Ji ber vê yekê jî her yek ji wan dixwaze hêzên kurd bi aliyê xwe ve bikişîne û wan ji bo siyaseta xwe wezîfedar bike. Lê ji vê pirsê re danîna prensîbên aştiyane yên ji bo çareserkirina herêmî, ji helwestên hindurîn ên van dewletan tê, ew helwestên ku xwe dispêrin hin stratejiyên ku di pêvajoya dîrokê de- mîna ku Metin Heper dibêje- neserkeftî bûn. Ev bi xwe astenga ku komara Turkiyeyê tê werbûye û zû bi zû nikare jê derkeve.

Li Turkiyeyê, piştî têkçûna hemleye artêşa turk li dijî cîgehên PKK li çiyayê Qendîlê yên bakûrê Iraqê, hukumeta Erdoğan têgihîşt ku ew bêgav e ku tevgereke erênî ji bo çareserkirina pirsa kurd bike. Îdîaya rapêkirina terorîzmê êdî nema stratejiyeke sûdwer bû, berevajî wê, ew îdîa hêzên tûndrew xurttir dike. Îtirafa bi ziman û çanda kurdî yekemîn gav bû ku Turkiyeyê ew di vî warî de avêt. Lê hêzên opozisyonê yên sereke mîna MHP û CHP û hin partiyên neteweperest ev gav nepejirandin û ew mîna paşvekêşana ji ber terorîzmê bi nav kirin û herweha ew mîna jêderkeke xeternak ji hebûna komara Turkiye re dîtin.



YÛSIV BEKIR: **Bênav**, 40 cm x 50 cm, teknîka tevlihev ya ser tûwalê

Dawiya dawî, bersiva "dewleta kûr" giran bû; DTP, ew partiya ku li Turkiyeyê mîna hêzeke kurdparêz tê jimartin, ji aliyê dezgeha dadweriyê ve hate qedexekirin (21).

Ev kiryar hewldaneke nû bû li hewldanên rêlibergirtina girêdana partiyên kurdî bi PKK yan serokê PKK Abdullah Öcalan ve zêde bû. Gelo em dikarin vê gavê mîna stratejiya "gavek bi pêş de, du gav bi şûn de" bijmêrin? Bi rastî hukumeta Erdoğan siyaseta gavên giran sebaret pirsa kurdî, hilbijartiye. Lê dewleta kûr ew gav bi şûn de vegerandine. Guman nîne ku şerrê li dijî dewleta kûr hîn ranewestiyaye. Piştî rakirina serpoşê ji ser grûpeke di nav artêşa turk de- ku li gor agahiyên dozgeriyê wê plan kiribû sala 2003'an derbeyekê li dijî hukumeta Ak Partiyê pêk bîne- xelekek nû ji şerrê di navbera Ak Partiyê û hevpeymaniya dijber ku partiyên nasyonalîst ên laîk û dezgehên dewleta kûr in.

Wezîrê derve yê Turkiyeyê Ahmet Davutoğlu di serdema serdana xwe ya Kurdistana Iraqê û hevdîtina digel serokê herêmê Mesûd Barzanî û berpirsyarên din ên hukumeta herêmê anîbû zimên ku ew ji stratejiya xwe ya "sifirkirina" nakokiyên herêmî venekişiyaye û ew hukumeta kurd li herêma Kurdistana Iraqê mîna aktoreke herêmî dihesibîne (22).
Wî da xuyakirin ku çareserkirina nakokiyên herêmî beşdariya hemû hêzan- hukumeta herêmê û partiyên kurd li Iraqê jî di nav de- di vê çalakiyê de ferz dike.

Bêguman, mîmarên siyaseta herêmî ya turkan a nû, ji ber sedemên girêdayî berjewendiyên Turkiyeyê bi taybetî jî bidestxistina îtirafa navnetewî/ewropî bi rola Turkiyeyê ya bingehîn, biryara vegera li çarçoveya xwe ya herêmî dane.

Îdîaya hukumetên turk yên berî AK Partî bibe desthilatdar ku Turkiye rola pirekê di navbera cîhana islamî û Ewropayê di dilîze, rastiya xwe wenda kiribû ji ber ku Turkiye nakokî bi cîranên xwe re çareser nekiribûn. Bi herdu cîranên xwe yên ereb, Sûriye û Iraqê re pirsa avê çareser nekiribû, herweha sebaret bi têkiliyên Ermenistanê re di hemû warên dîrokî û siyasî de.

Hukumeta Ankara, piştî serkeftina Ak Partiyê karibû rêya normalîzekirina têkiliyan bi Yûnanistanê re dest pê bike. Ew têkilî her ji dema şerrê Qibrisê sala 1974'an û berê wê jî di aloziyê de bûn û her û her lihevketî bûn. Îran jî, berê û hîn jî teref û aktoreke herî zor e di rojavayê Asyayê de. Meşrûyeta şoreşgerî, yanî meşrûyeta rejîmê, her dixwaze ku nakokî bi rengekî ji rengan hebe bi her terefên ku helwesta wan di mijarên herêmî û navnetewî de ne mîna helwesta Îranê ye. Medyatoriya Turkiyeyê di navbera Îran û rojavayê de jî negihîşt tu encamên berhemdar, ev jî mijarek e ku emê berfireh li ser rawestin.

Faktorên derve û hundur rê nadin Turkiyeyê ku ew gavên mezintir di hewldanên xwe yên çarseriyê de biavêje. Tu prensîbên giştî ji siyaseta herêmî re nînin, herweha tu dezgehên herêmî jî nînin ku armanca wan çareseriya nakokiyan be û danîna mekanizmayeke be ku rê li ber krîzan bigire. Di hundurê Turkiyeyê bi xwe de tu otoriteyên niştimanî nînin ku siyaseta hundur û derve jê dest pê bike. Hukumeta hilbijartî xwe di nava nakokiyeke berdewam de bi "dewleta kûr" re dibîne, ewa ku dikare hukumetan bixîne û herwekî ku çawa hukumeta Erbekan xist, yan jî dikare partiyan qedexe bike ku mebûsên wan yên ji hêla gel de hilbijartî di parlemanê de hene, wekî çawa ku dikira bi Ak Partiyê re biqewimiya û bi partiyên kurdî re qewimî bû. Yan jî bi behaneya parastina laîkbûnê dikare şerrekî li dar bixe. Bêguman, gihiştina desthilatdariyê ji hêla dezegeha xurt a "dewleta kûr", anku artêş, wê Turkiye careke din vegerîne halê îzolebûna herêmî û dawiyê li hirs û xewnên wê yên herêmî û aktîv bîne.

Tiştê balkêş ew e; hêzên ku xwe mîna parêzerên laîkbûna turkan dibînin, pre-modern in bi hesabê ku laîkbûn û demokrasî û rasyonalî stûnên modernîzmê ne, bi kêmanî li gora danasîna Jürgen Habermas ji nûjeniyê re (23).

## 5- Turkiye wekî medyatoreke nakokiyên herêmî û rastiya rola turk:

Lîstina rola medyator di nakokiyên herêmî de, pêwistirîn bingehên siyaseta herêmî ya turk a nû ye (24). Weha diyar e ku hukumeta Ak Partiyê, medyatoriya di navbera Sûriye û Îsraîlê de mîna çalakiyeke berhemdar û bi encam dît, Nemaze ku serokê şandeya Îsraîlî Rabinoviç di hevdîtinên aştiyê de ku nîvê salên nodî de pêk hatin, dibêje ku herdu teref li qeraxa aştiyê rawestiyabûn (25).

Di tûra nû ya hevdîtinên aştiyê de hin mercên objektîv hene ku Turkiye sezayî vê rolê (rola medyatoriyê-werger) dikin:

Yekem: Turkiye nakokiya xwe ya dualî bi Sûriyeyê re li gor peymana Adana sala 1999 çareser kir.

Duyem: serkeftina Ak partiyê û bidestxistina hukumetê hişt ku têkiliyên Sûriyeyê/ û bi giştî ereb û turk, ber bi başbûneke diyar ve biçin. Lê gelo ma şert û merc û rewşa herêmî ya sala 2005'an alîkar bûn dema ku Turkiye medyatoriya xwe di navbera Sûriye û Îsraîlê dest pê kir daku rêbaza aştiyê bigîjîne serkeftinê?

Li vê derê divê em ji bîr nekin ku tenê medyatorî û tenê pêkanîna hevdîtinan xwedan wezîfeyeke siyasî ne.

Mercên sala 1999'an, dema ku hukumeta Clinton ji bo peymaneke aştiyê di navbera Sûriye û Îsraîlê de li dar bikeve xwast medyatoriyê bike, bêguman çêtir bûn ji mercên sala 2005'an ku hevdîtinên Sûriye û Îsraîlê yên aştiyê tê de bi çavdêriya Turkiyeyê hatin lidarxistin.

Şerrê Lubnanê 2006 û şerrê Gazza 2008 ne faktorên alîkar bûn ku peymaneke aştiyê di navbera Sûriye û Îsraîlê de bê meydanê. Hin meseleyên din jî hebûn ku tesîr li helwesta Sûriyeyê kirin, mîna hevpeymaniya wê ya bi Îranê re. Aşkere ye ku peymaneke aştiyê bi Îsraîlê re wê tesîreke mezin li têkiliya bi Iranê re bike, herweha îdîaya Sûriyeyê ku ew ala Urûbetê (erebayetî/erebperweriyê-wergêr) bilind dike ku bi vê îdîayê li hindur û li herêmê meşrûyet daye rejîma xwe. Tu caran jî ne mumkin e ku Sûriye xwe bigihîne rewşekê ku tê de meşrûyeta wê têk biçe. Lê li aliyekî jî ne çav li rê ye ku Îsraîl di van şert û mercan de dev ji Golanê berde. Ji şerrê 1973'an heta jiheveqetandina artêşan a sala 1974'an sînorên di navbera Sûriye û Îsraîlê de aramtir in ji sînorên dewletên ereb ên ku bi Îsraîlê re peymanên aştiyê îmze kirine. Di gel vê yekê jî hukumeta Netanyahu xwe dûrî medyatorê turk xist bi taybetî piştî şerrê Gazayê. Helwesta turk helwesteke qutûbir bû di nepejirandina êrîşa Îsraîlî ya ji Gazayê re. Îsraîlê jî di gellek munasebetan de nerazîbûna xwe li himber helwesta Turkan da xuyakirin. Pêşniyara Netanyahu a ku dixwast medyatorê firensî têkeve dewrê jî ji bo berdewamkirina hevdîtinên aştiyê ên nedîrekt dihat wê wateyê ku Îsraîl rola Turkiyeyê napejirîne yan jî bi kêmanî dihat wateya lawazkirina rasteqînî û meşrûyeta rola turk.

Diyar e ku hevdîtinên nedîrekt yên di bin sîwana Turkiyeyê de li dar diketin ji bo her sê aliyên beşdar sûdwer bûn:

- **Îsraîl: ji ber sedemên girêdayî siyasetê derve dixwast bide xuyakirin ku ew hîn jî berdewam e di siyaseta erd beramber aştiyê.**
- **Sûriye: di encama siyaseta xwe ya Lubnanê ya berî û piştî kuştina Elî Herîrî, dor lê hatibû pêçkirin û îzole bûbû; dixwast bi buhayê herî hindik ji vê rewşê derkeve.**
- **Turkiye: dixwast bide xuyakirin ku ew dikare roleke bingehîn di siyaseta herêmî de bilîze û bi vî awayî tevlîbûna xwe ya Yekîtiya Ewropayê hêsantir bike.**

Li vir em neçar in vegerin ser hinek detayên bingehê helwesta turk. Wezîrê derve yê Turkiye her û her têgeha hevparê herêmî dubare dike, ew hevparê ku hedefa wî ne destdanîna li ser herêmê ye (26), ne jî dixwaze rolê ji destê hêzên herêmê bistîne (27).

Turkiye berê xwe daye wê armancê ku ji pisporiya siyasî re bibe navendek û herweha bibe alîkara aramiya siyasî li rojhilata navîn (28). Ev tê wê wateyê ku Turkiye werdigere navendeke pêşxitina stratejiyên zîrek û hewlê dide ku wan li herêmê pêk bîne. Girêdayî mijara Îranê, Turkiye naxwaze cîhana erebî

bibe meydan û qada şerrê di navbera wê û Îranê de (29).

Di gel dupatkirinên dubarekirî ji hêla Ankarayê, Turkiye wekî ku di têkiliyên xwe yên bi Misirê re kiribû, nikare Îranê mîna hevparekî herêmî bi alî xwe ve bikişîne. Mirov nikare xwesteka Turkiyeyê di pêşxistina têkiliyên erênî bi Îranê re înkar bike, lê ev xwestek li helwesta Îranî dilikume, ew helwesta girêdayî programa nuklerî û rola Îranê mîna sponsorê eniya berxwedan û pêdariyê ku ji Sûriye, Hizbullah û Hamasê pêk tê (30).

Turkiye hewl da ku rola medyator di navbera Îran û DYA'yê de sebaret programê Îranê yê nuklerî, bilîze. Lê xuya ye ku ev programa nukleerî ya Îranî beşek e ji siyaseta wê ya herêmî û navnetewî û bingeheke xurt e ji bo meşrûiyeta rejîmê li hundur. Li vê derê Turkiye bi sînorên siyaseta medyatorî û erênî re rû bi rû dibe.

Davutoğlu, dabeşkirina terefên herêmî di navbera radîkalan û moderatan (nermbîn) de napejirîne, lê bêguman ew dizane ku berdewamiya di programa nukleerî de û daxuyaniyên Ehmedînejad ên li ser tunekirina dewleta Îsraîlê dê di herêmê de bê guman dabeşkirina siyasî û sazkirina terefên cuda pêk bîne û tu kes nikare îro encamên stratejiya ku Îran dixwaze bi rengekî ji rengan li dewletên herêmê ferz bike, ji nuha ve nas bike (31).

Bi tu halî wê encam ne ji xêra dewletên erebî re be her wekî ku wezîrê derve yê Misirê Ehmed Ebûl-Xêt anîbû zimên (32).

Li hember pêşwaziya germ û berfereh ji rola aktîv a Turkiye ya Ak Partiyê re, Îran, ji ber van sedemên li jêr, tenê dikare bi rengekî nedîrekt wê rola turkan li cîhana ereb bi sînor bike:

- **Piştî ku Îran di îxrackirina şoreşa xwe de têk çû, dixwaze êdî siyaseta "Polarizasyonê" îxrac bike û di encamê de hinek terefan li dijî hinek terefên din bixe nava şerr.**
- **Turkiye bi awayekî ji awayan dikare beşdarî sîstemeke erebî herêmî bibe û pê re bikeve têkiliyê, lê Îran - di rêya hevpeymaniya xwe ya bi hin terefan re û sazkirina eniyeke li dijî dewletên nermbîn mîna herdu dewletên sereke Misir û Erebistana Siûdî- rê li ber vejandina sîstemeke erebî ya herêmî digire.**
- **Daxwaza Îranê ya biserxistina programa nukleerî, wê bihêle ku terefên din ên herêmê, mîna Turkiye ku sûdê ji sîwana nukleerî ya NATO´yê digire, bikevin pêşbaziya bidestxistina teknolojiya leşkerî ya nukleerî** (33).

Wekî prensîb, Turkiye dikare di siyaseta xwe ya herêmî de ji bingeha stratejiyeke zîrek (Smart Strategy) dest pê bike ku ew stratejî li ser helwesteke erênî sebaret her terefî û daxwaza çareserkirina nakokiyan bi rengekî aştiyane avakirî be.

Ma dabû xuyakirin ku ev stratejiya posîtîv bi hacetî struktureke dezgehî ye, herweha bi hacetî prensîbên ku her terefek itirafê pê bike û bipejirîne, loma jî Turkiye heta nuha nikaribû di rola xwe ya medyator, di navbera Îsraîl û Sûriyeyê de bi ser bikeve. Ew nikare Îranê jî îqna bike ku tevgereke posîtîv di helwestên xwe yên herêmî de bike. Bêguman Turkiye bala xwe dide wê yekê ku Îran tevahiya herêma rojhilata navîn dixe bin tesîra hewldanên xwe yên nukleerî.

Bêguman wê alîkariya hevpeymanên Îranê yên ereb û destdana wan a leşkerî ji Îranê re bibe meseleyeke xeternak eger Îsraîlê rêya êrîşên pêşdemî (Preemptive Attacks-wergêr) hilbijêre daku hewldanên nukleerî ên Îranê pûç bike. Ev tê wê wateya ku Îran qada şerrê bi Îsraîl û DYA'yê re ji hêla stratejîk ve berfirehtir dike ku rojhilata erebî û xelîc bibe beşek ji wê qadê. Di vê rewşa aloz û teqînbar de xuyaye ku stratejiya Amerîka û ya turk sebaret rojhilata erebî nêzîkî hev e (34).

Fikra DYA û rojavayê ya hevpar ew e dûrkirina Sûriye ji Îranê di rêya geşkirina têkiliyên bi Sûriyeyê re. Turkiye jî ji hêla xwe de hewl dide ku bi rêya hevkariya dualî di warê siyasî û aborî re têkiliyan bi Suriyeyê re xurt bike.

Lê Turkiye naxwaze ku têkiliyên wê yên bi Sûriyeyê re bibin alternatîva têkiliyên Sûriye û Îranê. Ev hewldan wê bi ser nekeve ji ber ku ew têkilî ji demeke ji mêj de hene û piralî ne. Medyatoriya di navbera Sûriye û Îsraîlê de û xurtkirina têkiliyan bi Sûriyeyê re di serî de armancê wê ew e ku Sûriye ji rewşa îzolekirinê – ku encama siyaseta wê ya di Lubnanê de û girêdana bi Iranê re bû- derkeve. Pişt re teşwîqkirina Suriyeyê ku neyê kişandin bal bi siyaseta Îranê ya li dijî çareseriyeke aştiyane di rojhilata navîn de. Îran jî, ji aliyê xwe de dixwaze Sûriyeyê bikişîne eniya"berxwedan û pêdariyê" ya ku destpêka adara 2010'an li Şamê hate damezrandin ku Ehmedînejad li wir doza destpêkirina şerrekî li dijî Îsraîlê kir (35).

Belê Turkiye daxwaza afirandina rewşeke herêmî dike ku li ser bingehên diyalog û berjewendiyên hevpar avakirî be daku rê li ber krîza ku di encama siyasta Îsraîl û Îran û dagîrkirina Iraqê de hate meydanê. Pirsa ku nuha siyaseta herêmî ya turk û siyaseta DYA'yê li rojhilata navîn mijûl dike ev e:

Yek - tevgera Îsraîlê dê çi be gava ku Îran çekên nukleerî bi dest bixîne yan jî bikare bidest bixîne?

Du - heta kîjan radeyê dikare bawerî bi Îranê bê ku dê di siyaseta xwe ya derve û herêmî de bibe dewleteke nermbîn piştî ku bibe dewleteke nukleerî?

Lê pirs ne ew e ka dê Îran di kluba nuklerî de bê pejirandin an na. Pirs ew e ku desthilatdarên Îraneke nukleerî ne cihê baweriyê ne, herwekî ku Ferîd Zekeriya tîne zimên (36).

Gurrbûna krîzên têkel li rojhilata navîn dikare DYA'yê û Ewropayê bêhtir nêzîkî pejirandina siyaseta derve ya Turkiyeyê bike, ew siyaseta ku rastiya wê di xwespartina otorîteya diyalogê û xurtkirina girêdanên siyasî, kulturî û aborî de hatiye isbatkirin.

## Encam:

Em bala xwe didinê ku têgeha "Osmanîzma nû" ya ku di siyaseta herêmî ya Turk a nû de hatiye bikaranîn, cihekî mezintir ji têgeheke semantîkî stend. Siyaseta herêmî ya Ak Partiyê xwedan armancên piralî ye. Lê guman nîne ku hukumeta Turk dixwaze roleke bijarte û ciyawaz di çarçoveya xwe ya jeopolîtîkî de bilîze. Herweha guman nîne ku ewê rastî nepejirandineke aşkere yan jî veşartî ji derveyî (malbata ereb) bibe. Turkiye di demeke dîrokî de ku "sîstema herêmî ya erebî "tê de lawaz bûbû "vegeriya". Lawazbûna wê sîstemê jî ji ber polarîzasyona ku encama cengên peyapey ji şerrê Îran/ Iraqê û heta têwerandina Iraqê ji hêla DYA û hevpeymanên wê ve bû. Û piştre jî têkçûna tevgerên aştiyê ku sala 1991 dest pê kiribûn û herweha nakokiyên dualî û geşbûna tevgerên bi şiddet bi her şêweyên xwe.

Guhdana Turkiye ya bi cîhana erebî di demekê de har bû pêkanîna siyaseta eksenan li dar bû, herwekî ku serokê Îranê Ehmedînejad li Şamê sala 2010'an îlana çêbûna "eksena berxwedan û pêdariyê" kir. Ev îlan işareteke dereng bû, ji destpêka van dehsalan de Îran serokatiya eksena berxwedanê dike ku ji Sûriyeyê û Hamas û Hizbullah û rêxistinên alîgirên Sûriyeyê û Îranê ne pêk tê.

Siyaseta turk an stratejiya Ak Partiyê hewl nade ku eksenekê saz bike, lê ew dixwaze ku nakokî û nelihevkirinên hemû terefan çareser bike û wan bi şebekeyeke xurt ji têkiliyên siyasî û aborî û kulturî ve girê bide. Herweha Turkiye dixwaze doz û pirsên sînorbuhêr, mîna pirsa kurdî jî, çareser bike. Di vê mijarê de Turkiye bi hêzên hundur yên girîng re rû bi rû dibe. Hêzên ku divê – ji ber bingehên wan ên çandî û siyasî- nûjen bin, lê bi rastî girêdana wan a bi nûjeniyê re kêmtir e ji ya partiya desthilatdar (AK Partî- werger). Êdî tu wateyên nûjenwerî ji laîkbûnê re ku ew hêz wê îdîa dikin, namîne eger ew israra nepejirandina realîteya kulturî ya komara Turkiyeyê bikin û bi hebûna pirseke ku navê wê pirsa kurdî ye û pirsên hesas ên din îtiraf nekin (37).

Derbarê siyaseta herêmî, Turkiye ê bi hewldanên destdanîna (hegemony) Iranî re rû bi rû bibe, Îran jî bêgav e ku di cîhana erebî de şaxên xwe belav bike û nuha jî di rojhilatê welatê ereban de, di Iraqê bi xwe de, wê alîgir peyda kirine ku dikare wan di şerrê xwe yê bi rojavayê dijî programa wê ya nuklerî re bi kar bîne. Sebaret mijara medyatoriya turk di nakokî û pirsên herêmî de, em tu serkeftinên berbiçav jî nabînin, bi taybetî jî medyatoriya wê ya di warê nakokiya Îsraîl û Sûriyeyê de.

Turkiye hewl da ku medyatoriyê di navbera Sûriye û Îsraîlê de bike ku ev mesele heta îro ji meseleyên zor û dijwar dihatin jimartin ji ber ku nakokî ne tenê li ser mijarên sînoran bû. Di nakokiya Sûriye û Îsraîlê de gellek faktor rolên xwe dilîzin, mîna aştiya fiîlî (De Facto Peace) a ku ji sala 1974'an ve li erdê ye, herweha mentalîteya Îsraîlî ya ku dixwaze heta jê bê xaka dagîrbûyî di destê xwe de bihêle heta ku ev yek li ser hesabê peymaneke aştiyê ya nêzîk be jî, herwekî ku sala 1999'an û di nîvê salên nodî, di serdema hevdîtinên aştiyê de qewimî.

Lê tevî wan hewldanên Turkiyeyê yên pirr di warê lîstina rola medyator de, ne xuya ye ku dê tu serkeftin peyda bibin û ne xuya ye ku Turkiye dikare roleke girîng di medyatoriyeke aktîv de bilîze.

Yê ku medyator be divê bi eynî mesafeyê ve dûrî aliyên nakokiyê raweste, lê Turkiye têkiliyên xwe bi Sûriye re xurt kirin û di eynî demê de jî rexneyên tund li siyaseta Îsraîlê û şerrê wê yê li Lubnan û Gazayê kirin. Ev helwesta Turkiyeyê, taktîk an stratejî be, hesabê raya giştî ya turk ku alîgirê Filistîniyan e dike.

Ger ku hal ev hal be, em neçar in ku bipirsin çi dihêle Turkiye medyatoriyê bike (38). Medyatorî bi xwe hewldaneke girêdayî dîtina cihekî ji hêzekê re ye û ev yek jî israra Turkiyeyê ye ku siyaseta wê ya herêmî û rola wê bi kateke dîrokî ve hatiye girêdan ku ji sifetên wê katê lawazbûna terefên ereb û sîstema herêmî ya ereb e, tefsîr dike.

Ji van sedeman, ereb – wekî hukumet û raya giştî û elîtên din –bi germî pêşwaziya rola turk kirin.

Bi venêrîneke hûrbîn ji siyaseta herêmî ya turk re tê xuyakirin ku Turkiye ne li pey hegemonî û destdanîna herêmê ye û osmanîzma nû, ji bilî forma peyvê, bi tu awayî ne girêdayî "osmanîzma kevn" e. Osmanîzma nû ew e ku Turkiye mîna terefekî aktîv vedigere çarçoveya xwe. Osmanîzekirin, li gor baweriya Ahmet Davutoğlu, nayê wateya hegemoniya polîtîkî û bê guman dê Turkiye bi germî pêşwaziya sîstemeke herêmî ya erebe çalak bike ku bikare li gel wê sîstemê mina hevparekî navnetewî kar bike. Û di vê nuqteyê de cudatiya siyaseta Turkiyeyê ji ya Îsraîl û Îranê xuya dibe.

* Prof. Dr. Ferhad Îbrahîm
Polîtolog, li Zanîngeha Erfurtê

Ev lêkolîn di konfransa "*Ji duh heta îro têkiliyên turk û ereb*" de 11.04.2010'an li Zanîngeha Urdunê-Amman hatiye pêşkêşkirin.

1 Bülent Aris: *the Davutoglu Era in Turkish Foreign Policy, in: Insight Turkey*, (Di siyaseta derve ya Turkiyê de serdema Davutoğlu, rûyê navxweyî yê Turkiyeyê) Vol. 11, No.3, 2009, P. 127-142

2 Xeyreddîn Hesîb: "El teawun el erebî el turkî ila eyn?" (Hevkariya Ereb û Turk ber bi ku ve?) El Musteqbel El Erebî. Hejmar 371,rr 7-10. Çile 2010

3 Pejirandina hebûna Îsraîl (1949), alîgiriya Fransayê di pirsa serxwebûna Cezayirê de û ji bilî van helwestan jî, dane zanîn ku elîtên turk hevhelwest in bi DYA'yê û hevpeymanên wê re di serdema şerrê sar de. Ji bo van mijaran vegere: Philip Robins, *Turkey and the Middle East* (Turkiye û Rojhilata Navîn). London: Pinter 1991

4 Derbarê nakokiya Sûriye û Turkiyeyê de vegere li: Welîd Ridwan: Muşkilet el miyah beyne Sûriye û Turkya. "di navbera Sûriye û Turkiyeyê de pirsa avê ". Şeriket El Metbûat. Beyrût. 2006

5 Vegere Muhemmed Nûreddîn: Turkiye, Es-sîxe wed-dewr, "Turkiye, form û rol" rr.293-300. Weşanên Riyad Er-reyyis. Beyrût

6 Meha Cotmeha sala 1998'an Turkiyeyê leşkerên xwe kişandin ser sînor û got ku eger Sûriye daxwazên wê yên ji bo qutkirina alîkariya bi PKK'yê re pêk neyne, ewê hêza leşkerî bi kar bîne. Eqîl Seîd Mehfûd: Sûriye we Turkiya, El waqi er-rahin we ihtimalat el musteqbel. "Sûriye û Turkiye, rewşa rojane û ihtimalên pêşerojê" , rr. 85-86. Beyrût 2009

7 Derbarê peymana Adana vegere: Eqîl Seîd Mehfûd, jêdera berê, rr. 263-306 ş

8 Li ser stratejiya Davutoğlu ya di warê siyaseta herêmî de, vegere: Bülent Aris: *The Davutoğlu Era in Turkish Foreign Policy, in Insight Turkey.* (Di siyaseta derve ya Turkiyeyê de serdema Davutoğlu, rûyê navxweyî yê Turkiyeyê) Vol. 11, No.3, PP. 127-142

9 Vegere Muhemmed Nûreddîn, jêderekî berê, rr. 217-233

10 Sebaret pirsa kurdî vegere li: Robert Olson: *Turkish – Kurdish Relations. A year of Significant Developments, in Insight Turkey*, (Têkiliyên Kurd û Turk. Saleke pêşveçûnên girîng, rûyê navxweyî yê Turkiyeyê) Vol. 10, No.3, 2008

11 Vegere li gotara Hesen El Şamî: hewle El weç el osmanî lid-diblomasiyye Et-turkiyye en-neşite. " derbarî aliyên osmanî ên diplomasiya Turkiyeyê ya çalak " Alhayat. 1/11/2009

12 Ezîz El Hac, yek ji rexnegirên "pêşwaziya germ" a Ereb ya li hember Osmanîzma nû re, bi guman li niyetên Turkiye yên nezelal li rojhilata navîn dinêre. Ew nepejirandina xwe ya ji "osmanîzekirinê" re bi serdema dagîrkeriya osmanî li herêmê ve girê dide. Vegere: Ezîz El hac: Turkiya Ila Eyn? Turkiye ber bi ku ve? Malpera Elaph. 8/12/2009

13 Veger li: Ibrahîm Öztürk: Et-Tehewwulat Et-Turkiyye beyne amey 2002-2008. "Guhertinên aborî li Turkiyeyê di navbera salên 2002-2008 de" ji kitêba "Turkiye beyne tehdîsat Ed- daxil we rihanat El xaric" Muhemmed Ebdul Atî. Beyrût. Ed-dar El Erbiyye 2010,rr. 13-47

14 Der Spiegel. Hejmar 26, 2009

15 Ridwan Es-Seyyid: Ed-Dewle wel-Islamiyyuûn…. "Dewlet û islamîst.." Alhayat. 26/02(2010

16 Jêdera berê

17 Der Spiegel. Hejmar 26, 2009

18 Ez bawer nakim ku saziya Konferansa Îslam dikare roleke mezin di çareserkirina nakokiyên herêma Rojhilata Navîn de bilîze. Ji ber ku ew saziyeke navneteweyî ye û bi gellek mijaran ve mijûl e

19 Metin Heper: *The State and Kurds in Turkey. The Question of Assimilation.* (Li Turkiyeyê Dewlet û Kurd. Pirsgirêka pişavtinê) London: Palgrave 2007, p.181

20 Îran û Turkiye û Sûriye destûr dane PDK û YNK ku buroyên xwe li paytextên wan welatan saz bikin. Di eynî demê de jî, van dewletan stratejî organîzekirin ku rê li ber geşbûna tevgera kurdî ya netewî bigirin

21 Derbarê "dewleta kûr" de, vegere: Hamit Bozarslan, Tarîx Turkiya El-Muasir "Dîroka Turkiyeyê ya hemdemî". Beyrût. Navenda çanda erebî. 2009. Herweha li: Serdar Kaya: The Rise and Decline of the Turkish "Deep State": The Ergenekon Case in: Insight Turkey, Vol. 11, No.4, 2009, S. 99-114, vegere

22 Vegere li Alhayat. 30/10/2009

23 Vegere li: Jurgen Habermas: *The Philosophical Discourse of Modernity Cambridge (Di vegotina felsefî de nûjenî)*: The MIT 1987

24 Turkiye di dema hukumdariya Ak partiyê de, medyatoriya 13 nakokiyên herêmî kiriye. Vegere li Muhemmed Nureddîn. Jêderekî berê, rr. 133-148

25 Itamar Rabinoviç: *The Brink of the Peace: The Israeli – Syrian Negotiation*. (Destpêka Aştiyê: Muzakereyên Îsraîl û Sûriye) Princeton Univ. Pr. 1998

26 Li rojnameya Arab News a Erebistana Siûdî vegere. 8/11/2009

27 Derbarê têkiliyên bi Misirê re û rola wê ya sereke li Cîhana Ereb wezîrê derve yê Turkiyeyê Ahmet Davutoğlu wisa dibêje. Vegere rojnameya Alhayat. 5/3/2010

28 Vegere rojnameya Arab News, 8/11/2009

29 Sebaret têkiliyên Turkiye û Îranê, vegere: Cemîl Meter, ihtimam Turkiye we Îran biş-şiûn El Erebiyye, Tesadum em tefahum? "Guhdana Turkiye û Îranê bi karûbarên ereb: lihevkirin yan nakokî?" Alhayat, 22/3/2010

30 Li hevpeyvîna Davutoğlu ya bi Der Spiegel re binêre, hejmar 26. 2009

31 Vegere Alhayat, 5/3/2010

32 Vegere Alhayat, 5/3/2010

33 Ferîd Zekeriya guman nake ku dema ku Îran bibe dewleteke nukleerî dê pêşbaziya leşkerî li herêmê çêbibe, behaneya wî jî ew e ku Misir di serdema şerrê xwe yê dûr û dirêj ê bi Israîlê re nexwast çekên nukleerî bi dest bixe. Newsweek, r 4, 2/3/2010. Îddaya îranê ku Îsraîl êrîşekê dijî Sûriye û Lubnanê plan dike, krîza li rojhilata navîn kûrtir dike û çavan ji ser programa wê ya nukleerî dadigerîne

34 Helwesta amerîkî hinekî bi şiyarbûn li nasnameya islamî ya Ak Partiyê û xirabebûna têkiliyên hukumeta Erdoğan bi Îsraîlê re dinêre. Vegere li: Owen Matthews û Christopher Diki: Serkeftina turkan, Newsweek, 8/12/2009

35 Sebaret vê mijarê vegere li: Ragide Dirxam, Alhayat, 4/3/2010

36 Ferîd Zekeriya: zû bi zû firokên xwe yên şerr nefirînin. Newsweek, r 4. 2/3/2010

37 Derbarê mijara ermenî û qirkirina wan di serdema şerrê cîhanê yê yekem de, serokwezîrê Turkiyeyê Erdoğan helwestên demagojîk tîne zimên, mîna daxuyaniya wî ku tê de dibêje, hukumeta wî ne mecbûr e bi ermeniyên ku piştî herifîna Yekîtiya Sovyetê koçberî Turkiyeyê bûne re bi tolerans be û ew dikarin wan vegerînin eger ermeniyên diyasporayê israr bikin ku dewleta osmanî qirkirina beşekî mezin ji ermeniyan plan kiriye û pêk aniye. Vegere Todays Zaman, 18/3/2010

38 Ahmet Davutoğlu, di gel xirabûna têkiliyên bi Israîlê re, israr dike ku hê jî medyatorî li dar e. Alhayat, 9/3/2010

Wergera ji erebî: Jan Dost

www.arsivakurdi.org

## Manewrayên mezin li Asyayê

# Koreya Başûr, li deryaya Çînê devê pireya şerr a stratejiya amerîkî

Gotûbêjên di navbera Komara Koreyê û Komara Koreyê ya Gelî û Demokratîk ku piştî noqavbûna keştiyeke başûr-koreyî rawestiyabûn, 20'ê îlonê dîsa dest pê kir.

Erê, Pyongyang prowakasyonên xwe didomîne, lê ev yek li hesabê Seûlê jî tê, lewre ew bi xêra rewşê sedemekê him ji mesrefên xwe yên sîlehan re û him jî, ji hevkariya stratejîk ya bi Amerîkayê re dibîne.

Matthew Reiss *

Girava Jejuyê ya ku dûriya wê ya ji Seûl, Şangay û koma giravên Japonyayê biqasî hev e, karîbû çanda xwe ya pêşiyan biparêze; di serî de bi rêya ayînên ji bo miriyan di dema rîtuelên rojane yên şamanî de. Bi diyarên ji zinarên volkanîk ên ku dişibin keleheke ku beden û dîwarên wê bi ser avên teyisî yên deryaya rojhilatê Çînê ve bel, bi golên xwe yên krateran û bi co û şikeftên xwe yên lavan, ev girav sala 2007'an li lîsteya mîrateya cîhanî ya UNESCO'yê ve hat zêdekirin. Ji demeke kurt ve ye ku peravên wê ne bi tenê ji bo tûrîstan cazib in. Ev perav ji hewasên pîşesaziya sîlehan re jî cazib e, lewre ji bo bicîhkirina baregeheke avêtina fuzeyan, ev pîşesazî cîhê giravê weke îdeal dinirxîne. Tevî protestoyên şêniyên wê jî dibe ku di demeke kurt de ya hatî serê girava Japonyayê Okînawayê bê serê girava Jujeyê jî.

Li nîvegiravê (Kore) fikir ji hev cihê ne. Pêşketina pîşesaziya parastinê bi pêkhatina "civakeke sivîl" a gihiştî re li hev dikeve. Bi zanîngehên xwe yên li asta jor, bi sîstema xwe ya tenduristiyê ya berdar, çapemeniyeke fikir û ji çend salan û vir ve bi beşdariya welatiyan a nav jiyana siyasî, welat dikare serfiraz be. Lê gellek bûyer dikin ku mirov bifikire ku ji vegereke ber bi rêbazên berê yên otorîter û ji paşveçûna azadiyên ferdî fikar bên kirin. Zextên li ser kesên gumanbir yê yekê pişterast dikin; ev kes gumanan ji versiyona fermî ya di adara bihurî de noqîavêbûna keştiya şer Cheonan'ê dikin û hukumetê gunehbar dikin ku dixwaze bûyerê bike hincet daku Komara Koreyê ya Gelî û Demokratîk gunehbar bike û şer amade bike.

Aktorê din ê navdar ê şerrê deryayên şîn ên Pasîfîkê Japonya jî di navbera pêşketina aborî ya misêwa û mesrefên eskerî de dudilî ye. Sozên Partiya Demokrat a Japonyayê (PDJ) di kampanyaya hilbijartinên ew di îlona 2009'an kirî desthilatdar dayî, hin jê ev in: kêmkirina mesrefên gellekî zêde yên ku peywendî baregehên eskerî yên amerîkî yên li keviyên bajarên sereke ne; derveyî hêza DYA'yê dewama têkiliyên dualî yên bi Çînê re û avakirina civateke aborî ya asyayî ku xwe dispêre kirîn û firotina serbest. Tevî ku ji PDJ'yê nehat cîhê baregehên hêzên hewayî yên amerîkî ji deverên gellekî şên ên Okînawayê, cîhê ku baregeh nuha lê ye, derxe jî, guherîna zêhniyeta siyaseta Japonyayê koza Koreyê kêmtir bilind nake di çavên avahiyên eskerî-pîşesaziyên amerîkî de.

Ji 2008'an ve ango ji dema ku dest bi wezîfê kir û vir ve, serokdewletê Koreya Başûr Lee Myung Bak hejmara mohrên ku cîhan li emerîkiyan vedikin qat bi qat zêde kir – heger mirov li ber siyaseta serokdewletên lîberal ên beriya wî re li ber hev bigire, ev guherîneke rastî ya zîhniyetê ye. Demeke kurt piştî ku erka wî dest pê kir, wî hewldanên dualî yên bi Koreya Başûr re – di çarçoveya hewldanên lihevhatinê yên serokdewlet Kim Dae Jung ên siyaseta dihat hezkirin "*Sunshine policy*" de – betal kirin û dawî li reformên azadkirina çapemeniyê anîn ku serokdewletê hema beriya wî Roh Moo-hyun dabûn destpêkirin.

Bi tenê çend hefteyan piştî ku dest bi wezîfeyê kir bi serokê DYA'yê George W. Bush re li Camp Davidê rûnişt. Wî di vê hevdîtinê de mijar bire ser rakirina ambargoya li ser goştê dewêr ê ji DYA'yê û îşaret bi rola nû ya Koreyê li herêmê kir. Hyundai'yê zend û bend badan da ku prototîpeke keştiyeke destroyer çêke ku wê bi fuzeyên antîbalîstîk û sîstemên sonarê yên şîrketa amerîkî Lockheed-Martin'ê sîlehkirî be. Ji bo fîloyeke ku wê ji 6 keştiyên şer pêk bê, di 2010'an de avahiyeke din divê bê teslîmkirin. Bi vî awayî, di demekê de ku provokasyonên siyasî yên li dijî Çînê qat bi qat zêde dibin, keştiyên şer wê di demeke nêz de bersiva DYA'yê ya li dijî serweriya Çînê li ser rêyên deryayî yên rojhilatê pasîfîkê xurt bikin. Girîngiya vê digihêje wê radeyê ku ji aliyê hin çavdêran ve weke nîşana sereke ya siyaseta derve a Lee tê nirxandin.

Di rewşa heyî de fonksiyona hêzên deryayî yên Koreyê sînordar e ku deryayên bi ser erdên xwe ve ji Koreya Bakur biparêze. Lê dema ku şeş keştiyên destroyer ên Hyundai-Lockheed'ê hatin çekdarkirin, hingê Kore jî mîna Japonyayê wê bibe koza herî girîng a siyaseta amerîkî beramberî Pekînê. Fîloya nû ya Koreya Başûr wê sala 2014'an li peravên girava Jejuyê li kêleka avahiyên ku alaya amerîkiyan li ser ava li ba dibe, bê bicîhkirin.

Yarbay Dai Xu yê artêşa hewayî ya Çînê, bicîhkirina fuzeyên li dijî fuzeyên balîstîk (ABM) yên DYA'yê û hevgirên wê li herêmê, weke ji aliyê Japonya, Kore û Hindistanê "dorlêgirtina bi şiklê hîlalê" li Çînê dinirxîne. Tevî ku serdestiya konvensiyonel a artêşa deryayê ya Çînê nuha li herêmê dewam dike jî, tu bersiva bide bihêzkirina fîloya ABM'ya amerîkî li ber destê wê hazir nîne. Koma pîşesaziyê ya Hyundai û Lockheed-Martin'ê di 2009'an de dabû zanîn ku hevkariya wan wê piştî teslîmkirina keştiyên hêza deryayî ya Koreyê xwastî jî dewam bike daku keştiyên bi heman rengî ji Hindistanê re jî çêkin. Tevî îhtîrasa wan a nîşandayî jî, hevkarên tîcarî ji bo dîtina bendereke dewamî ya ji bo baregeha hêzên deryayî ya Koreyê zehmetiyê dikşînin.

Di 2002 û 2007'an de (di demên serokatiya Kim û Roh de) ji ber ku şêniyên herêmê li ber rabûn, Seûlê du caran ji projeya xwe ya avakirina baregehê li ser girava Jejuyê gera. Serokdewlet Lee biryardar xuya ye ku berdêla wê çi dibe bila bibe, li ser devera dawî ku mumkin e bargeh lê ava bibe, ango li gundê masîgiran ê piçûk Gangjeongê, baregehê ava bike. Tevî ku şaredar îdîa dike ku ji sedî 94'ê karmendên wî li dijî projeyê ne jî wezîrê parastinê birîna daristanên deverê û ewlekirina derdorê da destpêkirin. Peyam zelal e, birêvebiriya nû wê di siyaseta xwe ya derve de li ber daxwazên xelkê herêman serî netewîne.

Şêniyên Gangjeongê debara xwe para bêhtir bi çandinî, masîgirî û tûrîzmê dikin û red dikin ku zirarên mîna yên li Hawaî, li Guam, Filîpîn û Japonyayê bûyîn li wan jî bibin: texrîbkirina herêmên masîgiriyê, kêmkirina tûrîzmê, pirsgirêkên civakî yên ku peywendî hebûna personelê eskerî ne û li deverê hiştina çopên jehrî. Tirsa herî zexm a xelkê ew e ku girava Jejuyê veguhere Okînawaya Koreyê. Gundiyên Gangjeongê giliyê xwe li dijî baregeha artêşa deryayî bi sedema ku zirarê li aboriya giravê dike, birin ber dadgeha herêmî. Dadgehê çendekê piştî bûyera noqîavêbûna keştiya bi navê Cheonan'ê, biryara xwe ji bo demeke nayê zanîn bi paş ve xist.

Di cîh de piştî bûyerê wezîrê parastinê û serokê rêxistina îstîxbaratê dabûn zanîn ku di destê wan de tu delîl nînin ku pişterast dikin destê Koreya Bakûr di bûyerê de heye. Paşê dozgerên koreyî û biyanî îdîa kirin ku Pyongyang yekser ji torpîlkirina keştiya şer berpirsiyar e. Piştî hingê Lee Komara Koreyê ya Gelî û Demokratîk bi terorîzmê gunehbar kir. Gunehbariyeke ku bi gefxwarinên bersivdayînê re tevlihev. Di vê helwêsta wî de wezîra karên derve ya amerîkî Hillary Clintonê şûna wî girt û îdîa kir ku di destê wê de "*delîlên nabe bên înkarkirin*" hene ku gunehkariya Pyongyangê pişterast dikin. Çend roj paşê Pentagonê da zanîn ku DYA keştiyeke balefiran dişîne deryayên Koreyê û li cîhê keştiya şer lê noqî avêbûyî, artêşa deryayî ya Koreya Başûr jî tetbîqateke eskerî ya li dijî keştiyên binê deryayê pêk anî.

Bi tenê hefteyekê beriya hilbijartinên herêmî yên meha Hezîranê retorîka hukumetê veguherî retorîkeke şer. Kêfa Koreyiyan gellekî ji vê re nehat û di cîh de dijberiya xwe li herêma paytextê bi pirranî dengdana li dijî partiya Lee, dan der.

Bela xwe ji betalkirina vê siyasetê vekin, serokdewlet ferman da ku polês bi ser gellek rêxistinên civakî de bigirin û kesên guman ji versiyona dawî ya fermî ya derbarê noqîavêbûna keştiya şer Cheonan'ê de dikirin, bên girtin. Di hewayeke giştî ya alarma peywendî ewlekariya neteweyî de, êdî şêniyên girava Jejuyê hêdî hêdî bê hêvî bûn. Li hemberî vê, ji bo ku tedbîran bigire, Pekîn li benda biryara dadgeha herêmî nema.
Hêzên deryayî yên Çînê pirr caran sînorên deryayên erdên cîranên xwe binpê kirin û operasyonên îstîxbaratê yên amerîkî yên di deryayên navneteweyî yên başûr û rojhilat de tacîz kirin. Ev yek tu gumanê tê de nahêle ku Çîn li rojhilatê Pasîfîkê hêza serdest e. Alîkarê wezîra karên derve ya birêvebiriya Obama Adam Steinberg hê nû garantî da Çînê ku DYA wê mudaxeleyî berjewendiyên Çînê yên herêmî neke, bi şertê ku serdestiya Çînê bi rengekî bê şer dewam bike. Bicîhkirina fuzeyên nû yên amerîkî li herêmê û hewldana avakirina baregeheke artêşa deryayî li girava Jejuyê bi xwe peyamekê dide ku bi tevahî guhertî ye.

Tevî ku fuzeyên antîbalîstîk kapasîteya wan nîne serikên nukleer hilgirin jî hêza çavtrisandina nukleer a Çînê ku jixwe nisbî lawaz e, her cara ku keştiyên Hyundai-Lockheed li fîloyekê tên zêdekirin, qelstir dibe. Wekî din, Pentagon pîşesaziyên Japonî û Koreyî li "bernameya parastinê" zêde dike û ev yek têkiliyên siyasî ku kêm bi nêzîkbûna sîno-japonî û sîno-koreyî re li hev dikin, teşwîq dike.

Ji hev qutkirina firotina sîlehan û projeyên siyasî di rêûresma amerîkî de nîne. Ji ber daxuyaniyên xwe yên ketina şer yên piştî noqîavêbûna Cheonan'ê û hişkbûna rejîma Seûlê, *New York magazine*'ê Clinton weke "*senatora Lockheed*"ê bi nav kiribû û herweha têkiliyên nêz yên di navbera wezîra karên derve û şîrketê de jî eşkere kiribûn. Di dema kampanyaya serokatiyê ya amerîkî ya sala 2008'an de hilberînerên fuzeyên parastinê alîkariyên maddî yên ji bo namzetên komarxwaz û demokrat, pêşî dan Clintonê.

Serokdewletê Koreyê Lee li ser hev hewl da ku baregeheke eskerî ya deryayî ava bike da ku keştiyên destroyer di wan de bi cîh bike. Ev destroyer jî ji aliyê Hyundai ve tên çêkirin û serokdewlet Lee heta sala 1992'an serok û midûrê giştî yê vê şîrketê bû. Ev dane, bi hev re dikin ku mirov hin pirsên din bike. Serokê komîsyona koreyî ya têkoşîna li dijî bertîlxwarinê da zanîn ku ne komîsyonê, ne meclîsa neteweyî û ne jî komîsyona hilbijartinên neteweyî têkiliyên di navbera mîrate û berjewendiyên aborî yên Lee yan jî endamên hukumeta wî û peymanên Lockheed-Hyundai de lê nekolîne.

Li aliyekî Çîn artêşa xwe ya deryayê xurt dike, Washington hêzên herêmî çekdar dike û tetbîqatên eskerî di deryayên rojhilatê Pasîfîkê de qat bi qat zêde dibin, li aliyê din li nîvgirava Koreyê dudiliya raya giştî ya ji bo îfadekirina dijberiya xwe jî hêja ye li ber çavan bê girtin.

Di 2008'an de ji bo belavkirina xwepêşandana bêşîddet a li dijî kirîna goştê dewaran ji DYA'yê, serokdewlet Lee hêzên ewlekariyê kiribûn dewrê. Wî hingê meydana şaredariya Seûlê dabû girtin, ev meydan li gorî rêûresmê cîhê kombûnên bi armanca protestokirinê ye. Li wê derê libakirina alayekê jî ji hingê ve dikare bibe sedema vekirina dozan.

Piştî biryara serokê DYA'yê Barack Obama ku pê organîzekirina G20'a bê ji aliyê Koreyê ve belê kir, raportorê taybet ê Neteweyên Yekbûyî yê ji bo azadiya fikr û xweîfadekirinê Frank La Rue li rewşa demokrasiya Koreyê kola û lê pirsî ka "*mirov rûmeteke bi vî rengî bide Seûlê çiqasî di cîh de ye*". Di gulanê de wî destnîşan kir ku çend mehan piştî ku Lee hat hilbijartin mafên azadiya fikir û kombûnê dest pê kirin ber bi xirabûnê ve çûn.

Piştî ku bernameya agahdariyê ya televizyonê "*PD Notes*"ê lêkolînek li ser rakirina ambargoya li ser goştê dewaran ji Amerîkayê weşand, nîşanên pêşî yên hişkbûna sîstemê xwe dan der. Produktorên bernameyê nîvê şevê beriya ku ji bo kontrolê bên binçavkirin, li malên xwe hatin lêpirsîn. Tevî ku ji du salan heta sisêyan cezayê girtîgehê ku dozger xwastibû nehat birîn jî, ev bûyer bi awayekî zelal nîşan dide ku serbixwebûna çapemeniyê paş ve çûye. Nûçegihanê kovara nûçeyan a heftane "*Sisain*" Ho Cheol Shinji van gotinan dibêje "*endîşe heye ku mirov nîvê şevê li mala xwe bê girtin.*"

Doza "*PD Notes*"ê du salan dewam kir, di nava van du salan de Lee midûrên televizyona dewletê ya Koreyê û serokê komîsyona neteweyî ya ragihandinê ji wezîfeyê derxistin û kesên nêzî xwe li şûna wan wezîfedar kirin. Serokê nû yê komîsyonê qedexeyên yekdestdariya çapemeniyê rakirin û destûr da rojnameyên muhafezakar doza destûra weşana televizyona kabloyî bikin.

Ji hingê ve saziyên çapemeniyê yên neteweyî xwe ji rexnekirina biryarên hukumetê hinekî vedidin. Xwepêşandanên mezin ên bêşîddet ku piştî weşana lêkolîna "*PD Notes*"ê pêk hatin, ne piştî girtina produktorên bernameyê di bihara 2008'an de û ne jî piştî tedbîrên bersivdanê yên ku piştî qezaya Cheonan'ê îsal hatin girtin, dubare nebûn.

Nifşê nû yê ku ji nifşê dê û bavên xwe kêmtir polîtîze ye li xwe mikur tê ku beriya her tiştî fikaran dike ka ew ê çawa ji berhemên dewlemendiyê bi rêya peydakirina karekî baş sûdê wergire û weha xuya ye ku meyla wê ji bo doza azadiya fikrî kêm e.
Şêniyên Jejuyê ji bo dewamkirina têkoşîna xwe bi tenê mane. Dîsa ew sûndxwarî ne ku "*heta mirinê têbikoşin*" daku awayê jiyana xwe biparêzin. 3'yê hezîranê wezareta parastinê hewl da îskeleyekê li cîhê avakirina baregeha eskerî ya deryayî deyne daku wîncan lê bi cîh bike. Ev hewldan bi çalakiyên guhnedana sivîl hat astengkirin.

* Rojnamevan, Washington

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê



Tebax 1971

# Kurdistan û milletekî parçekirî

JEAN-PIERRE VIENNOT

## ARŞÎVA BÎRA KURDAN

Qeyrana siyasî ya vê dawiyê ku li Turkiyeyê rû da, di nava pirsgirêkên din re, ji nişka ve pirsgirêkeke din jî anî rojevê ku rayedarên Anqereyê heta nuha kêfa xwe dianî û digot qey "*bi temamî çareser bûye û xilas bûye*": pirsgirêka neteweperweriya kurdî ya li Turkiyeyê. Çend sal berê, heta ku adara 1970'yê bi hukumeta Bexdê re peymanek hat danîn jî, şerrê otonomîstên kurd yên Iraqê zêdetir bal dikişand.
Di eslê xwe de, tevgera kurdî ya neteweperwer mijara hemû Kurdan e ku, ji dawiya Şerrê Cîhanê yê Yekem ve, di nava çar Dewletan de (Iraq, Turkiye, Îran, Sûriye) hatine dabeşkirin. Dijwar e ku mirov hêza vê tevgerê bipîve, lewre bi dizî û qaçaxî belav dibe û organîzasyona wê jî li gora vê rastiya wê ye. Jean-Pierre Viennot ku xwediyê tezeke doktorayê ya Sorbonê ye, di vê gotarê de rewşa vê pirsgirêkê ya îroj rave dike.

LMdkurdî

### "Turkên çiyayî" radîkalîze dibin

Di dema siyaseta çewisandinê de ku operasyonên Artêşa azadiya neteweyî di pey re hatin, êrîşên hukumetê yên li dijî çalakiyên çepa turk û "cudaxwazên kurd" jî zêde bûn. Ji xwe, ev herdu tevger tim tên tevlihevkirin û yek tên hesibandin, lewre tevgera kurd ya neteweyî, bi taybetî jî baskê wê yê legal, mecbûr dimîne ku digel çepgiran, nemaze di nava Partiya Karkeran ya Turkiyeyê de, xwe bi sazî û rêxistin bike; lewre hemû celebên sazî û tevgerên siyasî yên kurd qedexe ne û çepa turk ya tûndrew jî êdî bêtir û bi awayekî aşkere doza tevgera kurdî qebûl dike. Herçend rast be ku rayedarên Anqereyê neheq in û hemû daxwazên Kurdan, heta yên herî piçûk jî (weke mînak, mafê weşandina rojnameyên bi zimanê kurdî), weke "sûcekî li dijî yekîtiya xakî ya Dewletê û yekîtiya Komarê" dihesibînin jî, hêjayî gotinê ye ku hevkariya balkêş ya nuh ku di nava çepa turk û tevgera kurd de pêk hatiye êdî ne bi tenê rejîma siyasî ya Anqereyê rexne dike, lê herweha berê xwe dide Turkiyeya nûjen û bingehên wê yên Dewletê û îdeolojiya wê jî ku li ser "şoreşa neteweyî" ya 1919-1923'an ava bûye: kemalîzma ku îroj jî îdeolojiya fermî ya Dewleta turk e.
Rasta turk û rasta tûndrew ya ultra-nasyonalîst, pantûranîst û faşîzan, baş di qeyrana heyî de gihîştine û tim bangê dikin ku çalakiyên li dijî tevgera kurd xurttir bibin. Lewre ew vê tevgerê bi du "sûcên" siyasî ku Turkiyeya îroj nas dike, tawanbar dikin: komunîzm û cudaxwazî. Di hejmara 42'yê (hezîran 1967) ya kovara "Ötüken" de, ku weşana Partiya Tevgera Neteweperwer ya fermandar Alparslan Turkeş e û ji hêzeke pantûranîstên paramîlîter tê, gotareke Nihal Atsiz heye û sernivîsa wê "Hengameya Kurdên sor" e ku em beşekî jê werdigirin:

"Belê, min di gotara xwe ya hejmara bihurî ya Otukenê de (nisan 1967) weha gotibû: heger ew dixwazin bi zimanên xwe yên hov bipeyivin ku ji çar pênc hezaran pê ve peyvên wan nînin, û heger ew dixwazin Dewletekê ji xwe ava bikin û bi zimanê xwe weşanan bikin, bila herin dereke din. Em, Turk, me xwîna xwe kiriye çem û herikandiye û ev erd stendiye û me koka Gurcî, Ermenî û Yûnanên Bîzansê paqij kiriye û em lê bi cih bûne… Gava ku di Şerrrê Cîhanê yê Yekem de hemû Ermeniyan xayintî bi me kir, Kurd ji ber xezeba me filitîn, lewre ew di çiyayên xwe yên asê de dijiyan. Heger weha nebûya, li wan herêmên ku ew pirrhejmar in, ew ê nuha bi tenê kêmhejmar bûna. Tu dixwazî, bila hemû nifûsa wan herêman % 100 jî di destê wan de be, lê belê xewna wan ya avakirina Dewleteke li ser axa turk dê weke xewna Yûnanan ya Bîzansê û weke xewna Ermeniyan ya Ermenistana Mezin be. Hê neteweya turk li wan nehatiye xezebê û ew qirnekirine, bila bicehimin û biçin. Erê, bila biçin, lê ew ê biçin ku ? Hema ew kuderê dixwazin, bila biçin wira, Îran, Pakistan, Hindistan, an jî cem Barzanî; bila ji yekîtiya Neteweyan bixwazin ku li Afrîkayê ji wan re welatekî peyda bike. Nijada turk gellekî bêhnfireh e, lê belê gava ku xwe hêrs bike, ew dibe şêrekî xurt ku kes nikare rawestîne. Bila ji Ermeniyan bipirsin bê em kî ne û bila dersê ji wan bistînin !"

### Hişmendiyeke neteweyî ya derengmayî

Bingehê ku îroj Kurdistana bakur radike ser lingan diyardeya bêkêriya metodên çareseriya pirsgirêka kurdî ye ku Ankara van metodan ji pêncî salan û vir ve bi kar tîne. Ev herêm bi zimanê fermî bi navê Anadolûya Rojhilat bi tenê tê naskirin. Metodên ku hatine bikaranîn, di navbera wêrankirina fîzîkî ya bi şerran, xela û koçberkirin, yanî jenosîd, û bişaftina bi darê zorê, an jî etnosîdê de ne.
Rojnameya *Yenî Îstanbûl*, roja 30'ê çiriya pêşîna 1960'ê, ev nameya mamosteyekî turk weşand ku li gundê Kozlukê (herêma Sêrtê) yê Kurdistana Turkiyeyê mamostetiyê dike: "Ez vê nameyê bi giriyî ji we re dinivîsim. Ev roj ji bo me hemûyan rojeke pîroz e. Di merasîma pîrozbahiya vê rojê de, zarok derketin ser dikê û sirûda neteweyî gotin. Li salonê, cigirê waliyî, fermandarê cendirmeyan, dadger û karmendên din rabûn ser xwe. Kurdên ku salon tije kiribûn, ji şûna xwe ranebûn. Kurdan cixareya xwe dikişand û bi kurdî digot : Em ne turk in, em Kurd in ; roja ku Kurdistan ava bibe û sirûda me lê were xwendin, hingê em ê rabin ser xwe".

Tevdîrên pêşîn ku rayedarên osmanî, bi armanca navendîkirina birêvebiriyê, li dijî Kurdan bi cîh kirin, diçin heta sedsala 17'an. Ji ber wê ye ku helwêsteke xweparastinê ku îdeolojiya wê "pêş-neteweperwerî" bû di nava wê destana welatperwer re hate ravekirin ku klasîkeke kurdî ye: "Mem û Zîn" a Ehmedê Xanî (1605-1706). Sedsala 19'an, gellek serhildanên Kurdan yên çekdar pêk hatin (Bedirxan, Yezdan Şêr, Ubeydullah), û, herçend girseyên xelkê û bi taybetî jî gundî rakirin ser lingan jî, ev serhildan ji aliyê çîna serdest ya kurd ve (arîstokrasiya oldar, serokeşîr) dihatin birêvebirin û ev serhildan berî hertiştî ji bo berjewendiyên wan bûn.


Tevgera kurdî ya neteweyî, bi şiklê xwe yê siyasî û hemdem, sawiya sedsala 19'an û serê sedsala 20'an peyda bûye. Ew jî, weke tevgerên neteweperwer yên turk û ereb ku heman demê peyda bûne, bi bandora îdealên demokratîk û lîberal yên rojavayî ava bûbû. Lê belê, li gora yên din, hişmendiya neteweyî ya kurd derengtir gihişt kamiliya xwe û xurt bû. Li gora tevgerên rizgarîxwaz yên din ku di nava Împeretoriya Osmanî de peyda bûbûn (balkanî, ermenî, ereb, yûnan, asûrî) geşbûna wê dereng ma, ji ber ku îdeolojiya "osmanîzma" panîslamîk rê li ber wê digirt. Vê îdeolojiyê dijberiya fikrên nû û şoreşger yên "neteweya kurd" û ereb û turk dikir. Ev yek di dema Şerrê Cîhanê yê yekem de ku bû sedema belavûyina Împeretoriya Osmanî bi awayekî aşkeretir xuya bû: dijberê Erebên ku ji fersendê îstifade kirin û li hember Împeretoriyê serî hildan (serhildana Şerîf Huseyinê Mekkeyê ya 1916'an ku Brîtanyayê piştgirî didayê), Kurdan nîşan da ku ew sadiqî sultan-xalîfeyê Stenbolê ne û di ser de, ji ber ku dabûn pey îdeolojiya şerrê pîroz (cîhad), tev li qirkirina xelkê ermenî ya 1915'an jî bûn. Vê bûyerê tim bandoreke neyînî li peywendiyên kurdo-ermenî kir, digel ku berpirsiyariya biryara qirkirinê bi temamî di stuyê rayedarên turk de ye.

Şoreşa "jon turk" ya 1908'an karîbû bibûya fersendeke baş û bi avakirineke nû ya li ser fikra federasyoneke weha ku kurd, turk, ereb, ermenî, asûrî û yûnan tê de bikarin bi hev re bijîn, karîbû Împeretoriya Osmanî ji mirinê xilas bikiraya. Lê belê, neteweperest û reformîstên turk yên ku di nava Îttihat ve Terakki'yê de gihiştibûn hev bi destê xwe ev derfet ji holê rakirin. Lewre şovenîzmeke xurt di nava wan de serdest bû û encama wê jî bi tenê ew bû ku di nava neteweyên bindest de jî tevgerên neteweperwer ava bûn û ber bi cudaxwaziyê ve çûn (danberheva daxwazên Ereban yên wê demê û daxwazên Kurdan yên nuha de, di vê mijarê de, dikare gellek agahiyan bide destê mirov).

Di dema Şerrê Rizgariya turk de (1920-1923), Mustafa Kemal alîkariya Kurdan ya çekdarî bi zîrekî bi kar anî. Wî ew bi fikra îhtimala federasyoneke turko-kurd xapandin û xwe mîna parêzvanê xelîfeyî da naskirin, lê belê wî bi xwe sîstema xilafetê, sala 1924'an, ji holê rakir.

*Peymana Lozanê* nîşana dîplomatîk ya rengê nû yê peywendiyên Turkiyeyê û hêzên rojavayî bû. Ji vê peymanê û bi şûn de, piştî şoreşa neteweyî ya Mustafa Kemal ku li dijî *Peymana Sevrê* (10'ê tebaxa 1920'an) pêk hatibû, êdî siyaseta pişaftin û turkkirinekê li hember Kurdan dest pê kir ku sînorê wê tunebû: qedexekirina hemû weşanên bi zimanê kurdî, girtina hemû rêxistinên kurd, rûxandina tevna civaka Kurdan. Ji ber vê siyasetê, sê serhildanên mezin hatin lidarxistin: serhildana Şêx Seîd ya sala 1925'an hê di bin bandora

YÛSIV BEKIR: **Portre 1,** 30 cm x 30 cm, teknîka tevlihev ya ser tûwalê





îdeolojiya oldar de bû, lewre, di ber daxwazên neteweyî re, herweha pêşniyar dikir ku xilafet ji nû ve were bicîhkirin; serhildana Agiriyê ya 1928-1930'an ku ji aliyê partiya "Xoybûnê" ve dihat birêvebirin û vê partiyê jî alîkarî ji partiya sosyal demokrat a ermenî "Dashnaksutyun" werdigirt; û axir, serhildana Dêrsimê ya 1937'an, ku bi dû re Turkan navê vî bajarî kir Tûncelî, da ku vê dema "reş" ya dîroka Turkiyeyê bidin jibîrkirin.

Bersiva van serhildanan bi awayekî weha bê rehm hat dayin ku bi sed hezaran Kurd tê de hatin kuştin; pişta entelîjansiyaya kurdî ji binî ve hate şikandin (sala 1930'an, sed rewşenbîrên kurd xistin nava kîsan û avêtin nava gola Wanê û fetisandin, gund hatin valakirin, tevgerên kurd hemû hatin rûxandin yan jî reviyan (wek mînak, çûn Sûriyeya ku di bin destê Fransiyan de bû), hin herêmên Kurdistanê (Botan) bi sedemên weke "tendurustî, siyasî, çandî û stratejîk" seranser hatin valakirin.

Ji wê serdemê û bi şûn ve, doktrîna fermî ya nebûna milletê kurd a li Turkiyeyê hate bipêşxistin û êdî gava ku behsa wan dihat kirin, navê Kurdên Turkiyeyê, li gora wê formula navdar, bû "*Turkên çiyayî*".

Gava ku mirov daxuyaniyên fermî yên wê demê dide pey hev, xwînrijtirîn îddianameya li dijî siyaseta Ankarayê ya di derbarê Kurdan de diyar dibe.

**Hin ji wan daxuyaniyan ev in:**
"*Bi tenê neteweya turk dikare li vî welatî doza mafên etnîk bike ; kesekî din ne xwedî vî mafî ye*" (Ismet Înonu, serokwezîr, rojnameya turkî "*Milliyet*", n° 1636, 31'ê tebaxa 1930'an).

"*Ez ê fikra xwe ji we veneşêrim.* Bi tenê Turk heye ku xwedî û mîrê vî welatî ye. Ew kesên ku *ji nijada turk nayên, li vî welatî mafekî wan bi tenê heye : mafê koletiyê, mafê xulamtiyê*" (Mahmut Esat Bozkurt, wezîrê dadê, rojnameya turkî "*Milliyet*", n° 1655, îlona 1930'an).

Piştî çewisandina serhildana Dêrsimê ku çil hezar Kurd tê de hatin kuştin, Celal Beyê ku wezîrê karên navxweyî bû, bi awayekî weha da zanîn ku peyva wî êdî navdar e û şibandina ku tê de dike kîna wî diyar dike: "*eşqiya bi darê zorê bûn medenî!*".

Ev daxuyaniyên kevn bi ya ku general Cemal Gürsel vê dawiyê kir dewam dike: "*Heger ew Turkên çiyayî (yanî Kurd) yên ku nayên ser rêyê rehet nesekinin, artêş* dê qet texsîr neke û gund û bajarên wan bide ber bombeyan û xirab bike. Ew ê goleke xwînê ya weha pêk were ku ew jî û welatê wan jî dê tê de wenda bibe" (çavkanî "*Dagens Nyheter*" a Stockholmê, 16'ê çiriya paşîna 1960'an).

## Vejîn

Li Turkiyeyê, vejîna tevgera kurdî ya ku di nîvê sedsala bîstan de li rastî çewisandinên tûnd hat, ber bi sala 1960'ê ve dest pê kir. Wê demê, dozeke mezin hate vekirin ku çil û neh rewşenbîrên kurd (endezyar, parêzer, rojnameger, leşker, karmend) tê de hatin darizandin û bi " tevgerîna ji bo sazkirina dewleteke kurd " ve hatin tawanbarkirin. Hêjayî gotinê ye ku tevgera kurdî ya neteweperwer ya Iraqê di du salên destpêka şoreşa iraqî ya 14'ê tîrmeha 1958'an de bi awayekî azad xwe saz kiribû. Bandora vê tevgerê li bakurê Kurdistanê tim ji parçeyên din xurttir bû.

Lê, ev bandor rasterast pêk nehat, lewre birêvebiriya tevgera serhildanî ya Kurdistana Iraqê nedixwast ku Turkiye û Îran û Iraq li dijî wê hevbendiyek (ev hevbendî tim di dîroka Kurdistanê de hebû) ava bikiraya. Ji ber wê jî, tim dida xuyanî ku şoreşa kurdî bi tenê di qada Kurdên Iraqê de dixebite, digel ku xala 23'an ya rêbaza Partiya Demokrat a Kurdistana Iraqê destnîşan dike ku: "*Em li hemû parçeyên Kurdistanê piştgiriya doza xelkê kurd dikin da ku ji bin nîrê imperyalîzmê rizgar bibe û azad bibe; em ji bo ku neteweya kurd mafê çarenûsiya xwe bi dest bixe têdikoşin*". Mirov dikare bibêje ku dijberê vê yekê pêk hat: yên ku bi taybetî jî li herêma ser sînorê turko-iraqî alîkarî û piştgiriya Kurdên Iraqê kir, Kurdên Turkiyeyê bûn, digel ku tevgera Kurdên Iraqê ji bilî pêşniyara ku Kurdên Turkiyeyê û Îranê jî mîna wê bikin, tu pêşniyarên din nedikirin.

Weke ku li cîhanê ji bo gellek tevgerên vejîna neteweyî weha ye, çalakiyên neteweperwer yên Kurdên Turkiyeyê jî berî her tiştî di warê zimanî û çandî de bû. Li welatekî mîna Turkiyeyê ku hemû weşanên bi zimanê kurdî bi qanûnên tûnd ve qedexe ne, weşandina gramerên kurdî û berhemên kurdî yên wêjeya klasîk yên weke *Mem û Zîn*'ê an jî weşandina alfabeya kurdî bi awayekî xurt xwedan wateyeke siyasî ye û xwediyên wan berheman pirraniya caran dikarin ji ber vî karî li dadgehan werin darizandin. Hejmara kovarên kurdî ku van salên dawiyê li Turkiyeyê hewla weşandina wan pêk hat, balkêş e. Lê belê hemû jî hê ji hejmara yekem ve hatin qedexekirin.

Hingê, nivîskarên kurd hewl da ku xwe ji nîrê qanûnê rizgar bikin û dan ser rêya weşandina berhemên wêjeyî yên duzimanî yên turkî-kurdî (alfabeya wan yek e) an jî wergerandina turkî ya berhemên wêjeya kurdî. Qanûnên turk ji qanûnên ku Îspanyaya frankîst li dijî zimanê baskî bi rê ve dibirin an jî ji qanûnên ku Rûsyaya çarîst li dijî zimanê polonî bi rê ve dibirin gellekî girantir in. Bi armanca ku cebilxaneya hiqûqî ya fetisandina zimanê kurdî xurttir bike, hukumeta turk qanûnek derxist ku (n° 6/7635) di *Rojnameya Fermî* ya 14'ê sibata 1967'an de belav bû û bi vê qanûnê ve "*hemû alavên bi zimanê kurdî ku ji derveyî welêt tên, bi çi awayî û formê bin jî (weşan, dîsk, kaset û hwd.) ketina wan û belavkirina wan ya li Turkiyeyê qedexe û îllegal e*". Di nava kesayetiyên wêjeyî yên Kurdên Turkiyeyê de ku îroj di girtîgehê de ne, mirov dikare navê van kesan hilde: Çetîn Altan, nivîskarê rojnameya *Akşamê* yê navdar, endamê Partiya Karkerên Turkiyeyê ; Kemal Burkay, xelkê Dêrsimê ye ; helbestanê mezin û şoşeşger Mûsa Anter; û bi taybetî Mehmet Emîn Bozarslan, wergerê *Mem û Zînê* yê turkî û xwediyê berhemeke alfabeya kurdî û lêkolîneke aborî civakî ya li ser Anadolûya Rojhilat (Dogunun Sorunlari- Pirsgirêkên Rojhilatê).

## Piştgiriya hêzên çepgir

Digel şiyarbûna baldariya ji bo wêjeya kurdî, tevgereke zanistî ya berfireh li Turkiyeyê ava bû û armanca vê tevgerê jî ew bû ku li sedemên aborî û civakî yên "pirsgirêka Rojhilatê" bikole. Hemû lêkolînên ku dihatin weşandin, yên civaknasên turk jî di nav de, digihîştin heman encamê û rewşeke weha dişayesand: paşdemayina aborî û civakî ya berfireh li Andoluya Rojhilatê (yanî Kurdistana Turkiyeyê), nizmbûna asta pîşesaziyê, nizmbûna asta jiyanê, hejmara nexwendebûnê ya bilind û têkçûyina tevahiya siyaseta pişaftina zimanî. Kurdistana Turkiyeyê, bi tenê di warê hejmara qereqolan de, li gorî parçeyên din ên welatî di pêş de ye. Şükrü Koç, nunêrê gelê tirk yê ji Aydinê, di rojnameya rojane ya Stenbolê "*Cumhuriyet*"ê ya 31ê tîrmeha 1966'ê de, weha dinivîsand ku li Mêrdînê, % 91'ê nifûsê bi turkî nizane, li Sêrtê, % 87, li Colemêrgê, % 81, li Çewlikê, % 68, li Amedê, % 67. (Wekî têbînîyê, divê em not bikin ku li Mêrdînê kêmneteweyeke ereb a pirrhejmar heye.)

Li gorî îstatîstîkên fermî, di sala 1965'ê de rêjeya nexwendebûna li Rojhilatê % 72 bû û li Anadoluya turk % 44.5 bû. Li gorî Enstîtuya Zanistî ya Dewletê, tevî ku Kurdistana Turkiyeyê % 30'ê qada tevahiya welatî ye û ku % 21'ê nifusê li wir bi cîh bûye jî (yanî li navbera 5 û 7 mîlyon Kurd), bi tenê % 5.6'ê saziyên hunerî li Rojhilatê ava bûne. Di vê demê de, daxwazên Kurdan ên di warê çand û zimanî de, ku ji hêla pêşengiya rewsenbîrên bajarî ve dihatin parastin, û xwastekên aborî û civakî yên girseyên gel ên pirrhejmar li hev hatin, û ev diyarde jî, hêza tevgera neteweyî ya kurd ku îroj li Turkiyeyê heye, şîrove dike.

Pêşewayên kurd yên siyasetmedar, bi tarîfên nû qala pirsgirêka kurd dikir: "pirsgirêka Rojhilatê" bi tenê pirsgirêkeke "paşdemayina herêmî" an keşeyeke zimanî nebû; bindestiya çandî û mêtinkirina aborî, yên ku Kurdistana Turkiyeyê dixist asta "mêtingeheke sinifên serdest ên turk", du aliyên hevpar ên zulmkariyeke neteweyî ya teva bûn. Ji ber wê jî, ji bo têkoşîna li dijî vê zulmkariyê, li Kurdistana Turkiyeyê pêwîstiya avakirina tevgereke neteweyî ya gel hebû, ku bikare girêdanên xurt ên bi çepa turk û tevgera neteweyî ya kurd di parçeyên din ên Kurdistanê re çêbike.

Di sala 1970'ê de, rêxistineke ciwanên kurd a bi Partiya Karkerên Turkiyeyê ve girêdayî (TIP), li hemû bajar û navçeyên Kurdistana Turkiyeyê di bin navê "Navendên Şoresger ên Çanda Rojhilatê" (DDKO) de ava bû. Vê rêxistinê jî dest bi weşana bultenan kir û tê de cîh dida pêkutiyên qirêj ên rêxistineke komandoyên turk li Kurdistana Turkiyeyê, ku ev rêxistina komandoyan jî, bi pey peymana 11'ê adara 1970'ê ya li Kurdistana Iraqê, ji bo "têkoşîna li dijî çalakiyên cudaxwaz ên kurd li Turkiye, yên ku bi piştgiriya Barzaniyî radibin", ava bûbû. Tevî ku diviya ew li gotinên xwe hay bibe, DDKO'yê gotarên weha weşandin ku li gorî rewşa siyasî ya Turkiyeyê, pirr wêrek bûn. Di bultenên wê de, biwêja "gelên Turkiyeyê" bi awayekî vekirî dihat bikaranîn û bi pey re, çepa tûnd a Turkiyeyê li dû şopên wê çû.

Çend sal berê (1967), şaxeke Partiya Demokrat a Kurdistanê, ya ku li Suriye, Îran û Iraqê heye, bi awayekî vêşartî û bi piştgiriya Partiya Demokrat a Kurdistanê ya li Suriyeyê, bêyî ku bi rêvebiriya Barzaniyan ve girêdayî be, li Kurdistana Turkiyeyê hatibû damezirandin. Yek ji damezirînerên wê, Faîk Bûcak, nûnerê gelê Rihayê bû ; paşê gulle lê hatin reşandin û bi awayekî nemêrdî hat kuştin. Di nav rêxistinên kurd yên vêşartî de, divê em cîh bidin Partiya Rizgariya Kurdên Turkiyeyê, Komela Azadî û bi taybetî Komela Têkoşêrên Kurdistanê jî, ku bulteneke bi kurdî ya bi navê "Bahoz" diweşîne.

Kelehên Partiya Karkerên Turkiyeyê, ku mezintirîn rêxistina çepa turk e, timî li parêzgehên Rojhilatê, yanî li Kurdistana Turkiyeyê, bûn. Beşdariya Kurdan a di vê partiyê de, di çarçoveya têkoşîna wan a ji bo mafên demokratîk ên bîngehîn (azadiya komelbûnê, civînê û rojnamegeriyê) de, pirr asa bû. Ji ber ku li hemberî wan tu dostaniya aliyên rastgir, ên piştgirên neteweperestiyeke êrîşkar û pirr regezperest a ku ji fikira kemalîst dihat, tunebû. Di destpêkê de, TIP xwediyê dewseke aşkere ya li ser pirsgirêka kurd a li Turkiyeyê nebû ; bi tenê çend nûnerên wê, bi taybetî li Kurdistanê, nerazîbûna xwe ya ferdî li dijî siyaseta fermî ya li ser Kurdan dihat meşandin îfade dikir ; lê belê, " pirsgirêka Rojhilatê ", bi tenê weke nîşaneke pêşketina newekhev a kapîtalîzmê dihat hesibandin. Gaveke dîrokî di kongreya çaremîn a partiyê de hat avêtin, kongreya ku li Enqereyê di navbera 28 û 31ê cotmehê 1970î de pêk hat. Ji ber ku pêşniyara li ser pirsgirêka kurd ku li wir hat pesendkirin weha diyar û wêrek e, û şêwaza wê ya dîrokî qonaxeke nû a têkiliyên navbera Kurd û Turkan îlan dike, hêja ye ku em wê li vir bi temamî dubare bikin:

YÛSIV BEKIR: **Portre 1,** 30 cm x 30 cm, teknîka tevlihev ya ser tûwalê



www.archivakurdi.org








"Kongreya çaremîn a Partiya Karkerên Turkiyeyê li ber raya giştî nas dike û weha îlan dike ku:

● Gelê kurd li rojhilata Turkiyeyê heye;

● Ji destpêkê ve, rejîma faşîst a sinifên serdest li ser gelê kurd siyaseteke zordarî, teror û pişaftinê meşandiye, ku pirrî caran jî dirûve operasyonên xwînrij girtiye;

● Digel qanûna pêşketina newekhev, encamên siyaseta civakî û aborî ya sinifên serdest, di paşdemayîna herêma ku gelê kurd lê dijî de, sedemên bingehîn in; ji ber vê yekê, hesibandina "pirsgirêka Rojhilatê" a weke pirsgirêkeke pêşketina herêmî, bi tenê domandina îdeolojiya neteweperest û regezperest a sinifên serdest e;

● Piştgiriya partiya me ya ji bo gelê kurd, ê ku ji bo bidestxistina mafên xwe yên destûrî û hemwelatiyê û wergirtina tevahiya daxwaz û xwastekên xwe yên demokratîk têdikoşe, erkeke şoreşgerî ya asayî û pêwîst e;

● Divê sosyalîstên kurd û turk li cem hev di nav partiyê de bixebitin, da ku têkoşîna ji bo wergirtina daxwaz û xwastekên demokratîk ên gelê kurd û têkoşîna ji bo şoreşa sosyalîst, ya ku bi rêberiya sinifa karkeran û rêxistina wê ya pêşeng, partiya me, pêk tê, li hev bên û di pêleke şoreşgerî ya tenê de bimeşin;

● Yek ji bîngehên sereke ji bo geşbûna partiyê û têkoşîna wê ya îdeolojîk, tunekirina îdeolojiya nijadperest, bûrjûwa û neteweperest-regezperest li hemberî gelê kurd e; partî ji hêla pêwîstiyên têkoşîna şoreşger û sosyalîst a sinifa karkeran li pirsgirêka kurd dinihêre."

Bi pey re, hin rêxistinên çepgir ên tûnd gavên hîn meztîr jî avêtin. "Dev-Genc", yanî Federasyona Xwendekarên Şoreşger, ku di nav xwe de bizavên maoîst, kastrîst û trostkîst vedihewîne, weha îfade kir ku mafê gelê kurd e ku ji bo wergirtina mafên xwe bi awayekî çekdarî têbikoşe. Di daxuyaniyekê de ya bi tarîxa 5'ê adara 1971'ê, Komela Xwendekarên Turk ên li Fransayê "mafê gelê kurd ê çarenivîsê" nas dike, ku ev maf jî dikare mafê cudaxwastinê bi xwe re bîne.

Di warê civakê de, taybetmendiya esas a tevgera kurd a îroj li Turkiyeyê jî ew e ku ji destên kadroyên berê weke endamên arîstokrasiya olî, xwediyên axên mezin û serokeşîran derketiye; ji ber ku tevî ku wan di dema bihurî de rêberiya serhildanan dikir, ew nuha ji tirsa tûndbûn û firehbûna tevgerê hevkariya hukumeta turk dikin. Herçî siyaset e, ne weke rêberên serhildana kurd a li Iraqê, tevgera kurd a li Turkiyeyê baweriya xwe bi bêalîtiya navbera Rojhilat û Rojavayê re nayîne : ji bo wan, beşdariya Turkiyeyê ya di NATO'yê de û parastina ku Amerîka didiyê weha dikin ku bi awayekî asayî û rasterast, tevgera kurd a li Turkiyeyê li hemberî dijminatiya Amerîkayê rû bi rû dimîne; wekî din, di rewşa serhildaneke çekdarî ya li Kurdistanê de, Anqere dê ji alîkariya askerî ya Amerîkayê îstifade bike. Ji peymana agirbestê ya li Kurdistana Iraqê, bûyerên qirêj li Kurdistana Turkiyeyê (îşkence, dorpêçkirina giştî ya Ferqînê ya di 8'ê nîsana 1970'ê de) (1) weha zêde bûne ku mirov bi rastî dikeve fikaran, ka gelo hukumet dixwaze Kurdan teşwîqî serhildana çêkdari bike, ji bo ku tevgera wan a siyasî, ku ji nû ve ava bûye, weha îmha û tune bikin ku ew ê vegere rewşa xwe ya di navbera 1937 û 1960'î de. Helbet, parêzvanên fikira gerîlayeke kurd a li Turkiyeyê jî hene, lê belê pirr ji wan weha bawer in ku tevgera kurd hîn bes xurt û rêxistînkirî nîne ku bikaribe ji zulmkariya bê sînor a muhtemel, ku nijadkujiya Ermeniyan jî mînaka wê bû, xwe biparêze. Wekî din, ew jî weha difikirin ku destpêkirina têkoşînê ya li Kurdistana Turkiyeyê û Îranê, bê ku Kurdistana Iraqê xweseriyeke xurt û mayînde bi dest bixe û bikaribe dewsa hîma piştgiriyê ya ji bo têkoşîna azadiya kurd a li Turkî û Îranê bileyize, dê çewteke stratejîk bibe.

## Kêmneteweyeke li Sûriyeyê

Li Sûriyeyê, ji şoreşa baasîst a 8'ê adara 1963'ê û vir de, rewşa Kurdan pirr xirab bû. Tevdîreke "Qayîşa ereb" (2) ji hêla desthilatdaran ve hatibû amadekirin, ku li gorî vê planê, dê parçeyeke erdê ya 10 kîlometreyên firehiyê li cem sînora Turki û Suriyê ji nifûsa xwe ya kurd vala bibûya û, bi hincêta nûjenkirina cotyariyê, dê avahiyên dewletê yên çekdarî, weke kîbutzên Îsraîlê û ji bo peyayên ereb veqetandî, hatibûna çêkirin. Li hemberî berteka xurt a peyayên kurd ku wan dê tenê ji ber zora çekdarî gundê xwe biterkanda, hukumeta Baasê mecbûr maye ku plana xwe vekişîne. Hemwelatiya Suriyeyê jî ji destê Kurdên ku hejmara wan bi deh hezaran e hat girtin, bi bahaneya ku hin ji wan piştî perçiqandina serhildanên kurd ên 1925'ê, 1930'ê û 1937'ê ji Turkiyeyê hatine Suriyeyê, tevî ku herêmên Arab-Pinar, Kurd-Dax û Cizîra Bakûr, ku nuha di nava Suriyeyê de ne, her dem kurd bûn, lewre sînorê navbera Turkiye û Suriyeyê ji hêla desthilata wekaleta Fransayê ve di sala 1921'ê de hatibû xêzkirin. Li Suriyeyê hemû îfadeyên çanda kurd, heta guhdarkirina CD'yên kurd û xwendina pirtûkên wêjeya kurdî jî, qedexe ne.

Ragihandineke vêşartî ya ku ji hêla Mohamed Taleb Hilalî ve, dema ku ew midûrê îstîxbaratên Hasekê bû, hatiye nivîsandin, rastiya tevdîrên Baasa Suriyeyê yên li hemberî kêmneteweya kurd a li vî welatî bi awayekî aşkere û xofdar radixîne ber çavan. Bi armanca tunebûna Kurdên Suriyeyê, bi rêya pişaftina bi zorê û koçkirinê, çend rêç û rêbaz hatin rêzkirin: 1) siyaseta pergalî ya nexwendebûnê ya di herêmên kurd de (r.46); 2) derxistina gellek Kurdên Suriyeyê ya ji hemwelatiya sûrî û şandina wan a Turkiyeyê (r.47); 3) bêparmayîna Kurdan a ji xebatê (p.47); 4) teşwîqkirina şerrên navxweyî yên di nav civaka kurd de (r.48); 5) di dawiyê de, avakirina xaniyên komî yên ereb û çekdarî di herêma sînora Turkî û Suriyeyê de, "weke mêtingehên cihûyan" (r.48).

Piştî weşandina ragihandinê, partiya Baas a ku ji bo navdariya xwe ya pêşverûtiyê li welatên biyanî xema dixwar, weha bersivand û got ku fikirên Mohamed Talab Hilalî ne fikirên partiyê bûn. Lê belê, wî hîn di hikûmeta Dr. Atasiyî de weke Wezîrê Erzaqan kar dikir, û anuha, ji darbeya Hafez Al-Assadî û vir de, ew karê alîkariya serokwezîrî dike.

Helwêsta nerm a li hemberî hukumeta Suriyeyê bû sedema dabeşkirina Partiya Demokrat a Suriyeyê, ku ji hêla Dr. Nûreddîn Zaza ve di sala 1957'ê de hatibû damezrandin : bizava bi PDK-Iraqê ve girêdayî (Salah Badraddîn) bizava hemberî xwe, ya ku bêhtir li hêla çepê ye (Abdulhamid Derwêş) û ku helbestvanê şoreşger ê mezin, Cegerxwîn, piştgiriya xwe didiyê jî, mehkûm dike û dibêje ku ew bi dizî bi desthilatdariya sûrî re muzakereyê dikin û lewre bi azadiyeke firehtir dixebitin, ku dostaniya wan a vêşartî ya bi baskê antîbarzanî ya PDK-Iraqê (Celal Talabanî, Îbrahîm Ahmed) re heye, û ku pirsgirêka kurd a li Suriyeyê weke pirseke "kêmneteweyekê" kêm dikin, bêyî ku axa kurd a li Suriyeyê weke parçeyekî ji Kurdistanê bihesibînin.

Daxwazên her du aliyan ji xwe pirr kêm in jî: pêşketina azad a ziman û çanda kurd a li Suriyeyê û dawîlêanîna hemû cudakariyên li dijî Kurdan. Her du jî bi xurtî piştgiriyê didin tevdîrên pêşverû yên hukumetê (nûjenkirina cotyariyê, netewekirin), herweha piştgiriyê didin helwêsta sûrî ya li hemberî pisgirêka Filistînê.

## Hêviyên li Iraqê şikestin

Rewşa li Iraqê weke klîta pêşdeçûyina tevahiya pirsgirêka kurd tê dîtin. Peyamên dîrokî yên 11'ê adara 1970'ê hêviyên pirr mezin bi xwe re anîbûn : cara pêşî bû ku hukumeteke iraqî bi awayekî " fermî " xweseriya kurd nas dikir û ji têgeha tunebûna navendîtiyê, ku berê ji bo çareserkirina pirsgirêka kurd dihat bikaranîn, gavên mezintir avêtibûn. Hevkariyeke rast di navbera partiya Baas û Partiya Demokrat a Kurdistanê de çêbû û pênc wezîrên kurd jî ketin hukumeta Bexdayê: Mohamed Mahmûd (Karên bakûr), Nûrî Şawes (Karên dewletê), Saleh Yusefî (Wezîrê dewletê), Îhsan Şîrzad (Karên çolistan û şaredariyan) û Nafez Celal (cotyarî), ku sê navên pêşî ji endamên dezgeha siyasî ya PDK'ê bûn.

Weke ku tê zanîn, Mohamed Habîb Karîm ji hêla kongreya heştemîn a PDK'ê ve, ku di destpêka meha tîrmehê de li Nao-Perdanê li dar ket, weke Cîgirê Serokkomarê Iraqê hat destnîşankirin, û ew herweha sekreterê giştî yê PDK'yê ye jî, lê belê ew tu carî ji hêla Desteya Neteweyî ya Şoreşgeriyê ve, ku li Iraqê hertiştî di destên xwe de kom dike, nehat pejrandin, û ev ê jî bi awayekî mayinde têkiliyên bi Bexdayê re tarî bike. Têgeha kurd a xweseriyê weha ye ku divê sînorên axa di bin desthilatdariya hukumeta herêmî ya kurd de bi awayekî sexbêr werin aşkerekirin. Herweha diviya di herêma Kerkukê de, ya ku mijara nîqaşên ciddî ye referandûmek bihataya lidarxistin. Ev herêm giring e, lewre, ji ber ku neft tê de pirr e û Kurd, Ereb, Tirkmen û Asûrî lê dijîn, û hukumet tê de ji sala 1963'ê û vir de bê navber guherînên nifûsê pêk anîne da ku herêmê bike ereb û ji Kurdistanê bistîne. Ji ber ku hukumet li dijî wê derket, ev referendum hîn pêk nehatiye û vê jî têkiliyên Kurdan ên bi Bexdayê re bêhtir tarî kirin. Demeke berî nuha, hukumetê hin şaxên PDK'yê yên bajarên Kurdistanê dan girtin û çend hejmarên "Taakhi"yê ("Biratî"), rojnameya navendî ya PDK'yê ku bi awayekî rojane li Bexdayê diweşe qedexe kirin.

"Çepgir" li Kurdistana Iraqê jî hene: ev kes, Kurdên endamên "rêvebiriya navendî ya Partiya Komunîst a Iraqê" ne. Ev partî sala 1967'an ji ber serhildaneke bingeh û kadroyên bilind ya li dijî dezgeha navendî peyda bûye, lewre wan navend bi hevkariya hukumetê û parastina xeta wê ya "wendaker, bê tevger, înkarker û reformîst" tawanbar dikir. Vê bizava nêzîkî têgehên Kubayê, di sala 1968'an de bi hevkariya şoreşa kurd re hewl dabû ku di herêmên avzêlî û çolistanên ereb yên başûrê Iraqê de komên çekdarî saz bike, lê ev hewl bi lez û bi xwînrêjî hatibûn bidawîkirin. Di dema van bûyeran de, Xaled Ahmed Zebki, kevneserokê xwendekarên iraqî yên li Brîtanyaya Mezin û endamê sekreteriya Weqfa Betrand Russel, hatibû kuştin. Rêvebiriya navendî, ku hin endamên wê jî di refên Eniya Gel a Rizgariya Filistînê de xebitîn, rejîma baasîst a Iraqê weke "desthilateke dîktatorî ya nû-dagîrker û faşîst" bi nav dike û ji bo rûxandina wê ya bi "têkoşîna gel a çekdarî" bang dike.

Bi fersenda kongreya heştemîn a PDK'yê de, tîrmeha 1970'ê, min nûnêrên wê tevgerê, yên ku li Kurdistanê di nava refên şoreşa kurd de şerr dikin, dîtin (4). Xaniyekî reben li gundekî kurd, çend kîlometreyên dûrî Nao-Perdana ku kongre tê de dihat lidarxistin; bi dîwêr ve nîgarekî Lenîn û Guevara û nivîseke bi imzaya damezirînerê Partiya Komunîst a Iraqê Fahd: "Komunîzm ji mirinê xurttir û ji sêdaran bilindtir e." Li erdê, çend Kalaşnîkov; mîlîtanên ereb ku ji Bexda û başûrî hatine bê navber tên û diçin û îşkenceyên hovane yên ku di zîndanên Qesr al-Nihaya ("Qesra dawiyê") de, li Bexdayê û di bin rêvebiriya îstîxbarata Baasê de, li hevalên wan tên kirin ji min re vedibêjin. Her mîlîtanekî rêvebiriya navendî ku li Qesr al-Nihaya girtî ye mecbûr dimîne ku daxuyaniyekê îmze bike ku ew tê de baweriyên xwe yên siyasî înkar dike û sonda hevkariya polîsê dixwe; heger îmze neke jî, heta mirinê îşkence lê tê kirin. Paşê, cesed di çemê Dîcleyê an kolanên Bexdayê de tên dîtin ku marîpişta wan perçiqandî ye. Rêvebiriya navendî biryareke weha girt ku hemû têkiliyên bi van kesan re ku ji Qasr al-Nihaya zîndî derdikevin, qedexe ne.

Bi dû re nihêrîna rêvebiriya navendî ya li ser agirbesta li Kurdistanê jî ji min re tê gotin: "*Hukumet dixwaze wextê qezenc bike, ji ber ku nuha lawaz e û nikare di heman demê de li dijî çepa iraqî û şoreşa kurd şerr bike. Peyman bi tenê taktîk e, û dema ku hukumet dê derbeyeke xurt li çepa iraqî û bi taybetî li partiya me ya komunîst bide, ew ê hingê şerr dest pê bike. Weke nûnêrên bizava gelî ya tevgera azadiya kurd, em beşdariya wezîrên kurd a di hukumetê de mehkûm dikin, ji ber ku bêdengiya wan tê wateya qebûlkirina zilmkariya xwîndar a li dijî hevalên me; bi heman şiklê em piştgiriya bêdengiya dunyayî, ya Yekîtiya Komarên Sosyalîst ên Sovyetîk di serî de, ya li hember çeteya xwînrij û faşîst a Baasa iraqî mehkûm dikin.*" Gelo dê pêşketinên li Kurdistana Iraqê van pêşdîtinên reşbîn rast bikin? Hîn zû ye, lewre nuha em nikarin bibêjin.

Çi dibe bila bibe, lê Kurdan, bi buhayê deh salên têkoşîna çekdarî û êşên nedîtî, li Iraqê helwêsteke weha bi dest xistine ku bê guman, di warê siyasî û askerî de xurt e. Nizmkirina daxwazên wan bi encam bû, ji ber ku tecrubeya tevgerên din ên rizgariyê, ku ji destpêkê ve cudaxwazî tercih kirin, pirr hêvî nade mirovî: li Bîafrayê, li Bengalê, li Başûrê Sûdanê, li dijî van xwastekan, karên qirkirinê hatin meşandin û Neteweyên Yekbûyî jî, ji ber têgeha tevahiya axê û hukumdariya dewletan, lal mane. Ma di dema trajediya Bîafrayê de, Maha Thant (5) weha negotibû ku: "*NY dê destûrê nede tu cudaxwaziyê, ne li Nîjeriyayê û ne li dewleteke din a endamê NY'ê jî.*" Bê guman, ev yek bêdengiya rêxistina navneteweyî ya li hemberî bangên ku di dema şerrî de rêvebirên kurd dubare dikin, û bêhêziya wê ya nuha ku di mijara trajediya Bengalê de heye, baş şîrove dike.

1 Bnr. Bultena 2'emîn ya Navendên Şoreşger ên Çanda Rojhilatê (D.D.K.O), digel dosyaya li ser vê meseleyê ku DDKO'yê da serokkomar Cevdet Sunay

2 Bnr. "Le Problème kurde en Syrie. Plans pour le génocide d´une minorité nationale" (bi fransî, Pirsgirêka Kurd ya li Sûriyeyê. Plana ji bo qirkirina kêmneteweyekê), çileya pêşîna 1968'an, Îsmet Şerîf Vanly

3 Bnr. "Lêkolîna li ser parêzgeha Cizîrê di warê neteweyî, civakî û siyasî de" (bi erebî). Partiya Demokrat a Suriyeyê kopiyeke belgeyê esil bi dest xist û li welatên biyanî bi destê Îsmet Şerîf Vanly ve da weşandin ("La Persécution du peuple kurde par la dictature du Baas en Syrie")

4 Bnr. "Partisans" (kovareke bi fransî), hejmara 52 (avdar-avrêla 1970´î: "Le peuple palestinien en marche"), digel wergera ragihandina rêvebiriya navendî ya li ser pirsgirêka kurd, di gotara min de, ya bi navê "la Révolution arabe et la question nationale du Kurdistan" (Şoreşa erebî û pirsgirêka neteweyî ya kurdî)

5 Têbîniya wergêrî: Maha Thant (1909-1974) di navbera 1961 û 1971´ê de sekreterê sêyemîn yê Neteweyên Yekbûyî bû

Wergera ji fransî:
Îbrahîm Seydo Aydogan
û Simko Destan

www.kurdipedia.org

## Afganistan, şaşfamiya mezin

# Çend pirsiyar ji bo dîrokê ji bo derketina ji aloziyeke herêmî

Georges Lefeuvre *

Sala 2009'an, li Afganistanê, 2412 sivîl hatine kuştin(1); û bi tenê li bakûr-rojavayê paştûnişîn –sivîl, esker û serhildêr jî tê de– hejmara kuştiyan nêzîkî 12.000'an e (2). Biryar û encamên konferansên navneteweyî yên London (28 çileya paşîn 2010) û Qabûlê (21 tebax) bi aşkereyî kêm û kêmasî ne ji bo rawestandina zivirîna vê xeleka kujer û xetera şikestina van du welatan ku bi qasî 200 milyon kes tê de dijîn. Gelo, ji bilî lihevhatina bi Talîbanê re, çareyeke din heye? Lêgerîna çareseriyeke alternatîf, li ser zemînên hesas bi rê ve diçe – mîrata kolonyal a hêj safînebûyî, mijara hemû "negotiyan" di navbera Qebûl û Îslamabadê de– û ji binî ve ji hêsankirinên adetî dûr dikeve.

Di derbarê xeletiyên stratejîk de ku ji 2001'ê ve li Afganistanê hatine kirin, hemû yan jî hema bêje hemû tiştên pêwîst hatine gotin. Lê belê pirr kêm behsa şaşfamiyeke destpêkî ya mezin hat kirin ku şert e bê tehlîlkirin.

Sala 1986'an, Osama Bin Ladin li rojhilatê Afganistanê, nêzîkî Xostê ku ji deverên eşîrên pakistanî yên Wezîrîstanê çend kîlomêtir dûr e, bi cih dibe. Her eynî wê heyamê, Celaluddin Heqqanî ku ji Xostê ye û bûye fîgûrekî girîng yê tevgera paştû ya bi navê Hîzbê Îslamî Xalis, hêzên xwe li Mîranşahê bi cih dike ku dikeve bakûrê Wezîristanê û her ew der e ku wî artêşa Sovyetê ya çilî têk biribû. Halê heyî ev mîhwera Xost-Mîranşah ku li ser xeta Mortimer Durand e – xeta navborî di 1893'an de bi destê fermandarekî îngilîz yê bi heman navî hatiye destnîşankirin, ji bo cudakirina Împeratoriya Hindistanê ji Afganistana aloz– dever û îstiqameta terorîzma wehabî ye ku wê demê gellekî xurt e. Yek ji van bûyeran jî ne tesadufî ye. Ji ber ku tûndrewên wehabî hewl didin ku di nava neteweyên nedabeşbar de Ummetê (cemaeta bawermendan) ava bikin û şerrê wan yê pîroz dixwaze netewe-dewletan birûxîne ji bo pêkanîna erd û welatekî musulmanan yê neteweyî, yanî "xîlafeta mezin" a bi nav û bang. Stratejiya cîhada global îstifadeyê ji nasyonalîzmên herêmî dike ji bo bêtir nazikkirina sînoran û têkbirina hêza merkezî ya dewletan.

### Civaka paştûn ya parçekirî

Bi vî awayî, xeta Durand ji salên 1980'yan ve bûye şans û derfeteke mezin ji bo Bin Ladin. Ev sînorê ku dewleta Afganistanê nas nake lê dewleta Pakistanê li ser wê pirr hestiyar e, heman cemaeta paştû cuda dike ku li wê herêmê li ser berxwedana li hember dagîrkeriya Sovyetan hesteke nasnameyî ya pirr xurt heye. Ev hest herweha ji kaniya hêvîşikesteke sekûler vedixwe ku hem ji ber şaşfamkirineke etîmolojîk û hem jî ji ber nakokiyeke demografîk pêk tê. Li aliyekî, "Afgan" ev çemk e ku ji qedîm ve farisîziman ji bo xelkê Paştû bi kar tînin, her çi cihê lê dijîn –û ewên Pakistanê hêj jî bêyî tu ferq û cudayiyekê, xwe weke Afgan an jî Paştû didin nasîn. Li aliyê din, ji 12 heta 15 milyon Paştûyên li ser axa Afganistanê nîvê nifûsa welatî pêk tînin, digel ku Paştûyên Pakistanê du caran ji yên Afganistanê zêdetir in jî, bi tenê ji sedî 15'ê nifûsê pêk tînin. Her melzemeyek berdest e ku Bin Ladin, ji bo bêîstiqrarkirina her du dewletan, ji herêma navborî binkeya xwe (Qaîde) saz bike. Bi vî rengî, cîhad ji aliyê Amerîkayê û Erebistana Suûdî ve bi destfirehî tê fînansekirin û Heqqanî, kesê ku El-Qaîdeyê vedihewîne, para herî mezin ji vê alîkariya nepayî werdigire. Li tu cîhekeî din El-Qaîde nikare devereke ewqas destxweş peyda bike ji bo bicihbûnê: Di tebaxa 1996'an de, Bin Ladin li wir, cîhada cîhanî bi resmî ragihand û "Îlana şerrî li dijî Amerîkayiyên ku erdê du deverên pîroz îşxal kirine (Mekke û Medîne)" aşkere kir.

Di vê navberê de, sala 1994'an, Talîban hatine ser sehneyê. Ew ji El-Qaîdeyê dernehatine, lê belê serokê wan, Molla Muhemmed Omer, bi Heqqanî ve girêdayî ye û di bin fermana wî de şerr kiriye. Dîsa şansekî din û mezin: ne hewce ye ku El-Qaîde tiştekî bike ji bilî veniştina li ser şûnên Talîban û teqezkirina tûndrewiya wan a olî. Talîban di bidawîbûna şerrê navxweyî de ku ji cerga rûxîna rejîma komunîst ya sala 1992'an ve Afganistan kiribû nava xwînê, alîkarî kir. Herçend li jêr perçema şerîetê be û ne li jêr perçema qewmê xwe bin jî, li welatê ku heta digihe qeraxên Emû-Deryayê fetheke paştûyî bi rê ve dibin. Lê belê, bi vê yekê, her weke xizmeta wan digihe berjewendiyên amerîkiyan, Suûdî û Pakistan jî gellek xêrê jê dibînin.

Lewre şirketa petrolê ya Californiyayî, *Unocal*, ji bo projeya xwe ya hêla gazê, pêdivî bi welatekî aram û ewle hebû. Wê hingê, nûnerê wan yê li ba Talîbanê serokdewletê nuha Hamid Karzai bû. Û Erebistana Suûdî bêguman piştgiriyê dide derhatina mîrîtiyekî sunnî û xalis ya li ser baskên rojhilatî yên Îrana şiî. Ev stratejiya dorgirtinê li hesabê Washingtonê jî û herweha li yê Îslamabadê jî tê, lewre % 20'ê nifûsa pakistanî şiî ye û Îslamabad ji bandora Îranê ya li ser vê nifûsa xwe ditirse. Axir, ew babeta "kûrahiya stratejîk" jî heye ku li Pakistanê di bîra herkesî de ye, heta ya Benazir Bhutto jî ku wê demê serokwezîr bû. Gellek caran sebeba vê çavtarîtiya beramber "kûrahiya stratejîk" ew e ku artêşa Pakistanî dixwaze, heger Hindistan êrîşî wan bike, bikare xwe li Afganistanê bigire û pişta xwe bispêriyê: li ber nezera her çi kesê ku ji topografiya herêmê fahm dike, ev fikreke pûç û dûri aqilan e. Di rastiyê de, di vê derê de endîşeyeke jeopolîtîk heye ku têkildar e digel bi fermî nasnekirina Afganistanê ya xeta Durandê wekî sînor. Nasyonalîzma paştû ya sekûler, bi piştgiriya Yekîtiya Sovyet, di salên 1950-1970'an de, pirr xurt bû; serokdewletê afganî Muhammed Dawûd (1973-1978) îddia dikir ku hemû deverên paştûnişîn ên Pakistanê parçeyekî esasî yê welatê wî ye. Pakistana ku li aliyê rojhilat ji xwe di bin gefa dubendiya kevn ya Qaşmîrê de ye(3), ji vê xetera li rojava ditirse; lewma hewl dide xwe ku bikare li Qebûlê rejîmeke îslamî ya bi serdestiya Paştûyan bide avakirin, ku bekaya wê jî dê her bi destê Pakistanê ve bê teqezkirin daku her çi hewesên nasyonalîst ên berfirehbûna berev "Paştûyistana Mezin(4)" hebin, bêne fetisandin. Sala 1994'an, Îslamabad rê dide ku Talîban muameleyê bikin –bi musulman, paştû, heta nasyonalîstan re–, bi şertê ku li jêrkontrolê bên ragirtin.

Van berjewendiyên lihevketî hêzeke hazir û li ber teqînê da peydakirin, lewre hemû derfetên bêsînor hatine birêkxistin daku Talîban xwe dasepînin. Û herçend Hevpeymaniya Bakûrî, bi serokatiya fermandar Ahmed Şah Mesûd, heta kuştina wî di îlona 2001'an de, navendeke berxwedanê ya daîmî ragirtibe jî, pêdivî bi dozeke xweş a anjelîzmê [niyetpakiya neserkeftî] an jî amneziyê [bêbîrî; jidestdana bîrê] hebû daku yek bawer bike ku piştî 11'ê îlonê, ev hevpeymaniya di navbera pêkhateyên tacîk, hezaran û özbek dê bikarin berê hilmê sernişîv/berjêr bikin. Rast e ku Mesûd berekî girîng bû li ser texteyê setrencê, lê belê bi tena serê xwe nedikarî bibe şakilîla xelasiya neteweyê: hûn nikarin piştî cudakirin û dûrxistina nîvê endamên wê rabin malbatekê li hev bînin. Lê belê, "civaka navneteweyî", ku li hember teasûba Talîbanê bizdiyaye, lê terefgîriya xwe bi hemû tiştî re têkel dike, bû sebebê pêkhatina vê cudakirin û parçekirinê. Hukumeta nû ya Afganistanê ku ji rêkeftinên Bonnê yên kanûna 2001'ê pêk hatibû, post dabû 23 wezîran ji Hevpeymaniya Bakûrî, lê bi tenê 7 wezaret dabûne Paştûyan. Rast e ku Karzai bi xwe paştû ye, lê belê xelk wî mîna piyonê Qesra Spî dibînin. Bi kurtî, civaka sivîl a paştû wisa dizane ku nayê temsîlkirin û bi vî rengî nerazîbûneke kûr hêdî hêdî bihêz û berbelav dibe.

Bo heft salan, nerazîbûn dê hevîrekî sêperrî bistirîne: "paştûperwerî"ya asayî, hergav nasyonalîst nebe jî xwedanê bingeheke qewî ya nasnameyî; "layengîriya talîbanan", milê çekdar ê navxweyî; axirî, El-Qaîde, hêza derekî û zêdeyî ku mîna vîrûsekê li laşekî nexweş werbûye.

Piştî hezîmeta di çiriya pêşîn û çiriya paşîn ya 2001'ê de bi ser hat, heke eşîrên paştûyî cihê xwe di rêveberiyê de bidîtana, tê hebû ku tevgera talîban mîna şekirê di nav çayê de biheliyaya û belav bibûya. Li vir mebest ne ew e wê baweriyê bipeytînin ku dibêje Afganistan berî her tiştî dê bibe "welatê Paştûyan", lê belê, Paştû bi xwe, ji ber dîrok û hejmara xwe wisa bawer dikin û dixwazin. Ev daneyeke antropolojiya polîtîk e –nerihetker e lê belê waqiyeteke ron û aşkera ye– ku diviya baş lê bihata fikirîn û hesabkirin û ev pêdivî hêj jî li kar e. Lihevhatina neteweyî li Afganistanê dê hingî bi rêkûpêkî durist bibe gava qewmên Bakurî nema bi tenê "hemwetenî" bin li rex "afgan"ên dîrokî, lê belê welatperwerên tekmîl bin. Îhtîmala pêkhatina vê yekê heye, lewre tu tacîkên Afganistanî nîne ku bixwaze bikeve bin hukmê Duşanbeyê (paytextê Tacîkistanê), ne Ozbek dixwazin pabendê Taşkentê (Ozbekistan) bin û ne jî Hezaranên şiî hêviya hukmê Tehranê (Îran) dikin! Li ba hemû pêkhateyên afganî hesteke tîr heye ku carinan digihe qutsiyetê, beramber axa welatê xwe ku ji bo du sedsalan bi hev re bergîrî lê kirin. Lewma cudatiyên qewmî meseleyeke ewqas mezin nîne ku neyê çareserkirin.

Ewqas xeletiyên hesab û nirxandinan tim bi kêrî El-Qaîdeyê hatin. Rêxistina ku nikare li derveyî herêmê dewamê li jiyan û çalakiyên xwe bîne, divê hergav îredantîzma [telebkariya li ser erdê welatekî din] talîbanê bi pêş bixe ku reh û binyadên wê bi xwe tê de ne, heke na, cîhada neteweyî dê teqez bi rengekî bi rê ve biçe ku zirarê bigihîne cîhada cîhanî(5). Bin Ladin li ser vê yekê qet şaş nebû : ji 1996'an bi fikar bû ku danûstandinên di navbera Talîban û Unocalê de bigihine aramî û binecihkirina rejîma Molla Omer. Ev xeter di tebaxa 1998'an de bi rengekî qet'î rabû, gava ku Dewletîn Yekgirtî, ji bo hilanîna tola êrîşên bi ser sefaretên xwe yên Tanzanya û Kenyayê, êrîşî El-Qaîdeyê kir û cara yekem axa afganî da ber bombeyan.

Va ye şanseke dîtir bo Bin Ladin, ku pirr şareza ye ji bo azirandin û pîjkirina hêrsa Molla Omer: tebaxa 1998'an dibe heyama şêwegirtina rêveberiyeke duserî li Qandaharê, û piştî 11'ê îlonê jî vê hevkarî û hevpeymaniyê nahejîne. Lê El-Qaîde xwe dispêre mîhwera xwe ya Xost-Mîranşahê ku li wê Heqqanî berdewam girêya di navbera cîhada cîhanî û cîhada neteweyî de zeft kiriye, di demekê de ku Talîbanên Molla Omer mîhwera Qandahar-Quwetta'yê kontrol dikin –û ev yek gellek bi bê derdeserî çêdibe ji ber ku pirraniya wan ji eşîreta Ghilzaî ne ku ji sedî 85'ê xelkê li bakûrê Belûcistanê ji vê eşîretê ne. Kûrahiya stratejîk a binavûbang a Pakistanê beramber Afganistanê, gelo hilweşiya? Bi ya "stratejîstên" pakistanî, nexêr: li benda wê hindê ne ku Talîban li Afganistanê hakimiyeta rewşê bi temamî bi dest bixin û heta ku ev pêk bê jî, ew bi tenê dikevine dû bêtesîrkirina mîlîtanên biyanî da ku torên terorîst ên xaricî têk biçin, lê belê di ber re qedrê Talîban jî digirin.

Lê belê zêde pê ve naçe ku El-Qaîde dîsa derdikeve ser sehneyê, bi xêra operasyona *"çekuç û sindan" ku di 2004'an de generalê amerîkî David Barno bi rê ve biribû, û armanca wê ew bû ku* wan mîlîtanên Hereketa Îslamî ya Ozbekistanê ku Pakistanê soza derxistina wan a ji Wezîristana başûr dabû, li ser sînorî bide hev. Ev yekem dexaleta leşkerî ya li ser sînoran bû. Lê belê, artêşa Pakistanê di nav mehekê de zêdetir ji hezar neferên xwe ji dest dide û neçar dimîne ku digel Nek Muhammed li hev bê ku Nek Muhammed serhildêrekî ciwan yê ji wan gundan e. Piştî du mehan, ev serhildêrê navhatî di êrîşeke dronên amerîkî de tê kuştin. Nek, "kurê tu kesî" ku serê 80.000 eskeran jêkir, dibe lehengekî efsanewî ku temamê nifşê ciwan amade ne ku tola wî hilînin. Xelefê wî Beytullah Mehsûdê xeternak, hingê radibe û digihe El-Qaîdeyê daku bibe belaya serê dewleta Pakistanê ya ku ji wî bizdiyaye: êrîşên bi ser konwoy û binkeyên leşkerî, bi ser taxa gewre ya artêşê û mehkemeyan de; serokdewlet Perwîz Muşerref sê caran ji suîqastan rizgar dibe û Benazîr Butto di çileya pêşîna 2007'an de tê kuştin. Paşê Mehsûd rêxistina Tehrik-e-Talîban Pakistan'ê (TTP) ava dike ku qederê bîst rêxistinên cuda digihîne hev û li seranserê bakûrê rojhilatê welatî hakimiyeta xwe dadisepîne û her li wê herêmê dest bi şerrekî nû dike ji bo paqijkariya olî: 10'ê çiriya pêşîna 2008'an, 162 şiî bi tenê di operasyonekê bi ser Orakzaiyê de hatine kuştin.

Tirs gihiştiye lûtkeya xwe. Ciwanên bêtirs van deverên ku ketine ber talana vî avatarê dawî yê El-Qaîdeyê bi rê ve dibin. Zêdetir ji 300 serokeşîran, bi tohmeta muxbîriyê têne serjêkirin. Mehsûd peywendiyên xwe digel tor û hucreyên terorîst ên Pencabê bi can û ceste dike û ev kes jî, ne bi destekî, lê bi heft destan bi destê wî digirin: Leşkerê-Teyba yên wehhabî û herweha hizbên ne-wehhabî lê bi aşkereyî dij-şiî, wekî Leşkerê Cengî an jî Ceyşê Muhammed… Hetta Molla Omer bi xwe jî dikeve fikaran – tu berjewendiya wî di bêîstiqrarkirina Pakistanê de nîne, lewma berxwedana xwe li hember wan bi rêk dixe. Herweha, heta havîna 2009'an, artêş ji bo têkoşîna li dijî TTP'yê xwe dispêre talîbanên jê re sadiq, lewre êdî TTP weke tekane xetereya rastîn dihate dîtin. Netîceyên wan hewlan zêde cihê baweriyê û hêvîdariyê nînin, lê belê axirî, meha tebaxê Mehsûd tê kuştin. Pismamê wî Hakimullah Mehsûd li dû wî bi serokatiyê radibe û Molla Omer, bi xêra tora Heqqanî, zorê dide wî ku pêşniyaza wî ya lihevhatinê qebûl bike. Meha çiriya pêşîn, leşkerê Pakistanê operasyoneke nû dibe ser Wezîristanê. TTP bi rengekî xeşîm bergîrî dike û leşkerê Pakistanê diqewirîne: di

www.diplomatiquekurdi.org

navbera mehên çiriya pêşîn û îlona 2010’an de, 81 êrîşên xwekujî dibe binasê kuştina 1680 kesan.

Diyar e ku konferansên London û Qebûlê bes ew girara berê kelandiye û bi çend biharatên pêwerkirî dîsa pêşkêş kiriye. Leşkerên Rêxistina Peymana Atlantîka Bakurî (RPAB: NATO) êdî ketine nav zehmetî û kêşeyên mezin, lewre li wan herêmên serhildanan îmkana sepandina ekonomiya geşedanê nîne û baskê siyasî jî hema qet di rewşeke destxweş de nîne. Çawa alîkariya li "rêveberiya baş", li Qabûl û Îslamabadê, dê têra veçirandina girêyên gêrreyeke weha aloz bike?

## Di navbera neteweperwerî û cîhada cîhanî de

Êdî dimîne çareseriya serok Karzai: danûstandina bi Talîbanê re. Hevpîşeyê wî yê amerîkî Barack Obama dide pêyê jêrî, lê belê, ji ber nebûna rêyeke çêtir, qebûl dike. Rewş qet ewqas xerab lê nehatibû. TTP’yê bi rengekî serfkeftî Talîbanên Pakistanê û El-Qaîde û herweha hizbên terorîst ên ji Pencabê gihandine hev. Hêza eşîrî ya adetî xesp kir, jiyana sivîlan malwêran kir, û bêyî ku zeîf bikeve her berdewam bû di çalakiyên xwe yên terorîstî de. Di nav vê geremol û bêserûberiyê de li ku derê ne Talîbanên ku dê razî bin bigihine meslehetekê? Axir, heke hat û stratejîstên navneteweyî xwe têkilî muzakereyan bikin, ew dê çawa dilniya bin ku neyêne xapandin û suîstîmalkirin bi destê wan sîstemên qewmiyet û hevgirtinê ku ew bi xwe lê şareza nîne? Danûstandina bi Talîbanê re lewma stratejiyeke kêrhatî nîne; ya baştir ew e ku kêşeyê ji çavkaniyê re bibînin. Me dît ku El-Qaîde nikare bi aşkerayî li ser zemînî bijî, û herweha diyar bû ku civaka Paştû heke bê aştkirin û sernermkirin, êdî nema pêdiviya wê bi Talîbanên baskê wê yê leşkerî bimîne. Lewma divê berê xwe bidin vê civakê, vî xelkî.

Dê bêjin ku sîstema eşîretî hilweşiyaye. Qet hind teqez nîne ev yek, lewre bidestxistina hêz û desthilatan dibe bê berovajîkirin. Serokên adetî hatine serjêkirin –lê em çi têdigihin ji "adetî"yê ? Nêrîneke etnosentrîk [ethnocentré: nêrîna ku nijad û çandên din di nav çarçoweya cîhanbînî û nirxên di nav qewmê xwe de dinirxîne] a feodalîzmê dike ku vê peyvê bi "mîratî" re têkel bikin, lewre li Ewropayê hêza feodal bi destê qiralan û bi mafê xudayî dihate belavkirin ku bi vê yekê bîad û lihevhatineke ebedî durist dibû beramber Xwedê û veguhastina mîrata pîroz di nav binemalekê de [bi rengekî zikmakî]. Lê belê di feodaliya şerqî de ya ku desthilatê diyar dike hêza xwedayî nîne, yekî bênav û şan dikare bibe serok heke hêza xwe ya zemanî biçespîne û xwe sexî û camêr nîşan bide beramber wanên ku bi vî şertî, jê re bîad dikin û wî dihebînin. Her çi Paştûyekî xwedantesîr muxatabekî potansiyel e, êdî çi talîban be yan terefdar be çi jî ne, çi bi îtiqadê çi ji ber faydexwaziyê. Hetta em dikarin bibêjin ku çendan ihtîmala heyirandinê jî hebe, Heqqaniyê xeternak pêşî paştû ye û paşê talîban e û paşê jî hevpeymaneke stratejîk ê Bin Ladin e. Desthilat û dewlemendiyên wê binkeya xwe ya li du aliyên serhedan diparêze ku ji xwe re di navbera Xost û Mîranşahê de, bi rengê ku xeta Durandê têper bike, damezrandiye. El-Qaîde û TTP ji bo wî amrazên vê têperkirinê/derbaskirinê ne lê belê cîhada cîhanî zêde ne xem û karê wî ye.

Divê axaftina serokdewletê Pakistanê Aşfaq Pervez Keyanî, yê ku 2’yê



YÛSIV BEKIR: **Meydana Kurdistanê**, 40 cm x 50 cm, teknîka tevlihev ya ser tûwalê

sibata 2010’an pêşniyaz kir ku tesîr û qedrê xwe yê li bal Heqqanî bi kar bîne, di nava vê çarçoveyê de bê nirxandin. Ew resmiyetê dide têgeha kûrahiya stratejîk, lê dîsa jî balê dikişîne ser ku ev têgeh *"ne ji bo kontrolkirina Afganistanê, bi tenê ji bo parastina sînorê Pakistanê yê rojavayî"* ye.

Bi vî rengî, îşaretê bi xeta Durandê dike bêyî ku navê wê hilîne, lê belê bi dû re bi şermezarî fikara xwe aşkere dike ku nerihet in ji ber hebûna bihêz a Hindistanê ya li Afganistanê ku weke dorpêçkirineke dijminane dibîne. Ev sendrom diyar e ku hinekî hatiye mezinkirin, lê ne bêbingeh e: heyama şerrê sar, mîhwera dîplomasiyê ya Washington-Pekînê di Îslamabadê re derbas dibû û li mîhwera Moskow-New Delhi’yê rast diket. Nasyonalîzma paştû ya sekûler xwedanê piştgiriya Yekîtiya Sovyetê û herweha ya Hindistanê bû. Li vê derê em dikevine temasê digel negotiya rasteqîne ku pêwendiyên Pakistan-Afganistanê jehrî dikin. Ji bo Pakistanê, ji cerga avakirina wê ya di 1947’an de, xeta Durand sînorekî yasayî ye li ser navê "mîrata peymanan" ku huqûqa navneteweyî dixe jêr xerantiyê; Afganistan, bi rexê xwe ve, vî sînorî red dike, bi îddiaya ku tu peymanekê tu caran jê re ew statuya sînorên navneteweyî nedaye. Çawa tiştekî ku bêyî bingeheke meşrû ye dê bê yasayîkirin? Serqise, xeta Durandê apseyeke/kînoreke cîbicîkirinê ya daîmî ye ku careke din gellek hesas û nazik lê hatiye bi tesîra bûmerangê ya ji marjînalîzekirina Paştûyan û kêm girtiye ji vîrûsa El-Qaîdeyê.

Heta partiya nasyonalîstên sekuler ên çepgir, caran nêzîkî Yekîtiya Sovyetê, wekî Awami National Party (ANP) ku halê heyî li Peşawerê desthilatdar in, nerihet in. Nîsana 2007’an, rûdaweke mezin qewimî bêyî ku serincê bikêşe ser xwe. Serokdewlet Karzai çû Celalabadê ji bo vekirina navendeke çandî ya bi navê Başa Xanê avakerê ANP’yê –ku di 1948’an de biryara derketina ji Pakistanê wergirtibû û nefî bûbû ser axa Afganistanê û di 1988’an de li wir hate binaxkirin. Neviyê wî Esfendyar, serokê ANP’yê, mêvanê rûmetê bû. Di dawiya axaftina xwe de bi qêrîn got, *"Lar aw bar, ya o Afghan!"* ("Lêre, an li berê din, ez afgan im!") û Karzai bi şewq û heyecan çepik jê re lê dan. Navendeke din a bi navê Başa Xan heye, li berê Pakistanê, li Peşawerê. Xeta Durandê bi vî rengî dibe binasê kêşeyên hesas û xul û şêlû, herweha heta ku çareseriyek ji bo destnîşankirina statuyeke rastî ji wê herêma serhedî re peyda nebe, aştiya li herêmê pêk nayê. Bêtir axaftina li ser "xetê" tê wateya agirbestekê, yanî dubendiyeke çarenekirî. Heman kêşe li kar e ji bo xeta kontrolê ya ku Qeşmîrê dike du par. Lê belê kî hê jî behsa navê "xeta Goldsmid" li sînorê Îran-Pakistanê dike ku ji aliyê her du welatan ve jî tê naskirin ? Afganistanê bo ewqas sal û zemanên dirêj xwe bi dijberiya li hebûna xeta Durandê ve girtiye ku serokdewlet Karzai nedikarî paşkişiyê bike bêyî ku bê şermezarkirin, an jî bêyî ku bikeve ber xetereya suîqastekê. Lê belê, heke Qebûlê ev sînor bipejirandaya, têgeha pakistanî ya "kûrahiya stratejîk" bêbingeh û bêkeraset dibû, hevkariyên dij-terorîstî her ji ber vê rastiyê karîger dibûn, heta sendroma dorpêçiya hindistanî jî bi vî awayî nerm û aram dibû. Tebaxa 2009’an, Pakistana aziriyayî gef xwarin ku dê sînorî bigire û mayinan lê bireşîne –lê derfet nîne: ev dê bibûya derfeta herî baş ji bo zêdekirin û berbelavkirina serhildanên herêmî û îstifadekirina wan a ji behre û derfetên El-Qaîdeyê.

Ji bo berbendkirina erdhejeke herêmî, şert e ev xeta dubendî û cudakeriyê dagere xeta aştiyê. Çunku ji van her du dewletan gellek zehmet e berev hev biçin ji ber kêşeyên nasnameyî û sînorî yên pirr qedîm, dimîne ser "civaka navneteweyî" ku aliyê wan bike. Piştî heşt salên ku li herêmê derbas kirine, ji vê yekê zêdetir jî dikare bike. Lê belê, ev naskirina sînorekî hevbeş, bi tenê gava bi serokeşîrên her du aliyan ve şertên vê yekê bêne destnîşankirin dê pêk bê, lewre armanc destnîşankirina *modus operandi*’yekê [şêweyê xebitînê] ye daku tu xelk careke din êşa parçekirinê nejî û daku meydaneke hevbeş peyda bike bêyî ku serweriya her du dewletan bêixe jêr pirsiyaran. Hûrde-meydaneke Schengenê, mîna li Yekîtiya Ewropayê? Dijberên vê yekê dê bibêjin ku hingê ew dê bibe devera her cûre qaçaxçîtiya tiryak û maddeyên bêhuşker… Lê belê ji xwe halê heyî wisa ye û li herêmeke

aştbûyî dê bêhed kêmtir pêk bê, herweha di eynî gavê de dê bibe helkefteke destxweş ji bo vebûna Afganistanê berev cîhana li dora xwe. Muamelekirina li ser "şêweyê bikaranîna" sînorî qet cihê heyirînê nîne, lewre xeta Durand ji xwe heta nuha bûye babeta çar peymanan (di salên 1893, 1905, 1919 û 1921'ê de). Ji xwe, her ev venivîsandina fuzûlî ye ku sî û şik xistiye ser berdewamiya wê, heta ser rasteqîniya wê jî. Axir, hejmareke nîşaneyan jî îşaretê pê dikin ku Paştû, gava ku nema pêdiviya wan pê bimîne, dê berê xwe ji torên terorîst bidin alî. Ev bi rengekî ciddî me tîne ser wê fikrê ku hêja ye ku her du dewlet li ser çareserkirina kêşeya paştû ya bi serokeşîran re careke din jî bifikirin, terefgîriyên wan ên berê her çi bûbin ne xem e, heta ku digel Talîbanê ji bo aştiyeke bêihtimal li dû danûstendinan bin. Gelo heke danûstendinên digel Talîbanê bi ser nekevin, aya divê ku hingê bi El-Qaîdeyê re bikevine muzakereyan? Xalid Ezîz, kevnesekreterê giştî yê Eyaleta sînorî ya Rojavayê Bakûr, di *The News*'ê de bi heq weha dinivîse: *"Beyî ku pirsa xeta Durandê digel Afganistanê bê çareserkirin, berjewendiyên Amerîka û Pakistanê nabin yek* (6)*."*

Va ye li jorê dariştî ye tiştê ku Qebûl û Îslamabad pê dizanin û ku serokê artêşa Pakistanê ji raya giştî re xetên wê yên giştî destnîşan kirine. Vemirandina keştiya agirî ya sînorî şertê yekem e ji bo hewldan û dabînkirina lihevhatineke neteweyî li Afganistanê. Hesta nasnameyî ya Paştûyan herweha xweşdivî ye di dilê partiyên sekûler de jî, digel ku ev hest di nav destên El-Qaîdeyê de bûye alaveke oportunîst. Ew partiyên han jî dîn û har dijminên Talîbanê ne! Lewma, nasyonalîstên çepgir, Talîban û El-Qaîde, her yek li dû merem û nexşeyên xwe yên cuda, nabin karesteyê reaksiyoneke kîmyewî ya nezeftbar di tûpekî azmûnê de.

Diyarkirina dîplomasiya rojavayî li gora tevliheviya pirsgirêkan diguhere û ev jî pêwîst dike ku mirov jî tevgerên adetî dûrtir biçe. Heger mirov ji nû ve mafê axavtinê bide xelkên ku dengê wan hatiye birîn, ev yek dê ji bo wan ne bi tenê serkevtineke hêja be, lê herweha ew ê bibe nîşana bi şûn de wergirtina rûmetê jî. Hingê, xurttirîn artêşên cîhanî jî dê qet neêşin, ne ji ber têkçûyineke xwînrij, lê belê ji ber vekişîneke bê serkevtin.

* Antropolog û dîplomat, kevneşêwirmendê siyasî yê Komîsyona Ewropa li Pakistanê

1 Koma alîkariyê ya Neteweyên Yekbûyî li Afganistanê, rapora salane, çileya paşîna 2010'an

2 South Asia Terrorism Portal, www.satp.org

3 Hindistan û Pakistan ji sala 1947'an ve ye ku ji bo desthilatdariya Qeşmîrê şerr dikin. Qeşmîr îroj di nava wan de bûye du parçe

4 Peyveke weha ye ku acizker be jî êdî bûye sînonîma Afganistanê. Sala 1948'an, alaya Paştûnistana azad ku qiral Zaher Şah jî piştgiriya wê dikir, li ser Wezîristana bakûr û deşta Tirahê li ba dibû. Dewleta serhildêr ya Paştûnistanê bi qasî 20 mehan bi tenê li ser lingan ma

5 Axavtina Jean-Pierre Filiu li hember komîsyona Senatoyê fransî ya karên derve, 29'ê çileya paşîna 2010'an, www.senat.fr. Herweha bixwîne: Jean-Pierre Filiu, *Les Neufs vies d'Al Qaida* (Neh canên El Qaîdayê), Fayard, Paris, 2009

6 "Aligning regional security policies", *The News*, Îslamabad, 25'ê çiriya paşîna 2008'an

Wergera ji fransî: Ergîn Opengîn

# KRONOLOJIYA AFGANISTANÊ

## 1893
**12 çiriya paşîn**

Peymana ku xeta Ligne Durand, sînorê (ku afganan bi fermî nas nekir) di navbera Afganistan û Pakistanê de, destnîşan kir. Pareke axa afganî ku dê têketaya nav erdê Pakistanê, hate hiştin bo Brîtanyayê.

## 1919
Sêyemîn şerrê îngilîz û afganan. Afganistan serxwebûna xwe bi dest dixe (peymana Rawalpindi, 8 tebax 1919).

## 1933
Zahir Şah dibe qiralê Afganistanê piştî Nadir Şahê ku bi destê reqîbekî xwe hatibû kuştin.

## 1973
Zahir Şah bi destê Muhammed Dawûd tê daxistin ji qiraliyê û Muhammed Dawûd Komara Afganistanê radigihîne.

## 1978
Darbeya Partiya Demokratîk a Gelê Afgan, Komunîst.

## 1979
Washington bernameyeke nihênî ya alîkariya bo gerîlayên dij-komunîst dide ber xwe. Dagîrkirina Sovyetan, Yekîtiya Sovyet desthilatê dide destê Babrak Karmal.

## 1986
Ronald Reagan her zêdetir çekên amerîkî dabîn dike bo mucahîdîn.

## 1988
**14 nîsan**

Rêkeftina Cenevreyê di navbera Afganistan, Yekîtiya Sovyet, Dewletên Yekgirtî û Pakistanê de li ser vekişîna leşkerên Sovyetê ku 15'ê sibata 1989'an bi encam digihe.

## 1992
**16 nîsan**

Dawiya rejîma komunîst, serokdewlet Muhammed Necîbullah îstifa dike. Destpêka şerrê li ser desthilatê di navbera alîgirên fermandarê tacîk Ehmed Şah Mesûd û yên şefê paştû Gulbudîn Hekmetyar de.

## 1993
**7 adar**

Piştî çend salên şerr û lêkdanan, hizbên reqîb peymaneke aştiyê imze dikin.

## 1994
Dîsa destpêkirina şerr li paytextê. Derhatina siyasî û leşkerî ya Talîbanê, hereketa "şagirtên dînî" ku Molla Omer ava kiribû û Pakistanê jî piştgirî lê dikir.

## 1996
**27 îlon**

Talîban Qebûlê bi dest dixin û qederê ji sê paran duyên Afganistanê dixine bin hakimiyeta xwe. Damezirandina rejîmeke îslamîst ku xwe disparte tetbîqeke bêhed û hişk a şerîetê.

## 1997
**26 gulan**

Pakistan bi rengekî resmî rejîma Talîban nas dike-çiriya pêşîn. Şirketa amerîkanî Unocal dixwaze di Afganistanê re di navbera Turkmenistan û Pakistanê de hêleke lûleyên xazê bikêşe.

## 1999
Lijneya Ewlekariyê ya Neteweyên Yekgirtî ray dide ji bo ambargoyeke hewayî û mueyîdeyên darayî li dijî Afganistanê.

## 2001
**îlon**

Mesûd di suîqastekê de tê kuştin; Bin Ladin banga cîhadê dike.

**7 çiriya pêşîn**

Mudaxeleya leşkerî li dijî Afganistanê, bi xerantiya Neteweyên Yekgirtî û bi koalîsyoneke bi serkêşiya Dewletên Yekgirtî û Qiraliyeta Yekgirtî.

**13 çiriya paşîn**

Hilweşiyana rejîma Talîban. Biryara 1378'an ya Lijneya Ewlekariyê ya Neteweyên Yekgirtî xwast ku li Qebûlê hukumeteke muweqet bê avakirin.

**5 çileya pêşîn**

Hizbên afganî, di bin parastina Rêxistina Neteweyên Yekgirtî (RNY) de, li Bonnê digihine netîceya girêdana peymanekê li ser pêkanîna desthilateke muweqet bi rêveberiya Hemid Karzai.

**20 çileya pêşîn**

Neteweyên Yekgirtî destûrê dide bicîhkirina Hêzeke navneteweyî li Qebûlê ji bo berqerarkirina asayîşê (HNBA) ya li Afganistanê.

## 2002
**10 çileya paşîn**

Girtiyên ewil ên Talîban û endamên El-Qaîdeyê, bi wesfê "şervanên derqanûnî", hatin raguhastin bo binkeya Guantanamoyê.

**28 adar**

Avakirina Desteya alîkariyê ya Neteweyên Yekgirtî li Afganistanê (Manua), ku berpirsiyariya birêvebirina avadankirinê hildigire.

**13 hezîran**

Nûnerên *Loya Jirgayê* Karzai wek serokê rêveberiya welatî hildibijêrin ji bo maweyeke 18 mehan.

## 2003
**tebax**

RNY fermandariya HNBA'yê hildigire.

## 2004
**26 çileyê paşîn**

Komara îslamî ya Afganistanê tê ragihandin.

**9 çiriya pêşî**

Karzai di hilbijartinên serokkomariyê de bi ser dikeve.

## 2005
**18 eylûl**

Yekemîn hilbijartinên giştî ji sala 1969'an ve, bi rêjeyeke pirr mezin (% 50) a neçûna ser sendoqan. Serkevtina mezin a alîgirên Karzai.

## 2007
**10 adar**

Parlamanto qanûnekê pesend dike ji bo afûyeke giştî li tawanên şerrî yên sih salên dawî.

## 2008
**13 hezîran**

Yekîneyeke komandoyên yaxiyan/asiyan êrîşeke xedar dibine ser girtîxaneya Qandaharê û 400 jê endamên Talîbanê hezar girtiyan azad dikin.

## 2009
**11 sibat**

Êrîşên xwekujî yên rêkxistî li dijî avahiyên dewletî.

**17 sibat**

Barack Obama radigihîne ku hevdeh hezar eskerên din dê bêne şandin ku dê li sîh û heşt hezar eskerên amerîkî yên li Afganistanê bêne zêdekirin

**20 tebax**

Hilbijartinên ji bo serokkomariyê û hilbijartinên herêmî. Karzai û reqîbê wî yê sereke Abdullah Abdullah wekhev dengan distînin. Abdullah Abdullah jê vedikişe.

**3 çiriya paşîn**

Serhildêr pêşniyaza Karzai ya ji bo lihevhatinê red dikin.

**1 çileya pêşîn**

Obama hinartina sih hezar eskerên din radigihîne.

## 2010
**28 çileya paşîn**

Konferansa navneteweyî ya Londonê daxwaz dike ku "pêvajoya derbasbûnê" bi lez be û Talîbanên poşman bêne "entegrekirin".

**21 tebax**

Konferansa navneteweyî ya Qebûlê li ser ji vira û heta sala 2014'an dewr-wergirtina hêzên afganî ya fermandeyê.



www.arsivakurd.org

RÛSYA

# Ji perestroykayeke gellekî kurt ber bi putinîzmeke bêdawî ve

VLADISLAV INOZEMTSEV *

**Şewatên daristanan yên mezin ku di havîna 2010'an pêk hatin qelsiyên rejîmê derxistin holê. Lê belê, sîstema ku Vladimir Pûtîn bi cîh kiriye zêde naşibe sîstema dema sovyetê. Peymaneke civakî ya nû hatiye sazkirin û azadiya takesekî û desthilatdariya otorîter li hev bar kirine. Lê, Rûsya kêmaniyeke ciddî ya çîna rewşenbîran dijî ku bikare rêyê li ber nûbûnan veke. Gelo serokê nuha dê reformên rasteqîn bide destpêkirin?**

Analîzên vê dawiyê pirrî caran di navbera Rûsyaya heyî û Yekîtiya Sovyetan de paralelekê datînin: burokrasiyeke ku di çînên ku dest li wan nabe de ji nû ve hatin birêxistinkirin, sîstema yek partiyê, prensîbên demokratîk ên ku ketine rewşeke weha ku kenê mirov bi wan bê, hiqûqa "alakart" û ji vê û wê de vejîna "împeryalîzma rûs". Serdema Pûtîn hê dûrî wê qonaxê ye ku bişibe xitimîna aboriya sovyetan a dema desthilatdariya Brejnev.

Rûsyaya salên 2010'an ne Yekîtiya Sovyet a dawiya salên 1970'î ye. Hemin gellek xalên hevpar ên herduyan hene: li cîhê ku "ji jor ber bi jêr ve" Partiya Komunîst a Yekîtiya Sovyet desthilatdar bû, nuha ya partiya "Rûsyaya Yekbûyî" ku Vladîmîr Pûtîn serokatiya wê dike heye û % 46'ê wê ji karmendên dewletê yên payeyên cihê pêk tê. Ji Sovyetên mezin Dûma ma ku parlemanter ji lîsteyên partiyên ku Kremlîn wan qebûl dike, tên hilbijartin – partiyên Kremlîn kontrol neke nikarin bikevin hilbijartinan. Xwepêşandanên muxalefetê hemû tên tepisandin, televizyon tên sansûrkirin. Dadgeh, bi awayekî giştî, biryarên ji hêza desthilatdar re baş yan jî bi kêrî tên, didin. Di aboriyê de ya guncav "neo-sovyetîzm" e: di dema desthilatdariya Brejnev de petrol, gaza xwezayî û maddeyên xam % 55'ê îxracatê pêk dianîn; ew îroj % 80'yê îxracata Rûsyayê pêk tînin. Hejmara karmendên dewletê, personelê polîs û saziyên ewlekariyê zêde bû, tevî ku serjimara serdema Sovyetan 287 milyon bû û serjimara Rûsyaya heyî 142 milyon e. Şîrketên mezin di kontrola dewletê de ne. Di warê siyaseta derve de nemana Yekîtiya Sovyet li gorî Pûtîn (1) weke "*felaketa herî mezin a jeopolîtîk a sedsala 20'an*" tê dîtin…

Lê belê Rûsyaya heyî di heman demê ji Yekîtiya Sovyet bi awayekî radîkal cihê ye. Ji gellek aliyan ve cinawarane be jî, rejîma heyî dîsa jî welatekî bi awayekî nakokane azad bi rê ve dibe. Yên ku derfetên wan heyî kêm jî bin, rûs ji welatê xwe derdikevin û kengî dixwazin hingê vedigerinê. Bêhtirî 5 milyon Rûsî li derveyî welêt dimînin û welatîbûna xwe jî diparêzin. Aboriya welêt li dunyayê vekiriye (di 2009'an de hecma bazirganiya bi derve re % 40.7'ê HNB'ya wê pêk dianî, heman salê ev rêje li DYA'yê % 18.3 bû). Çanda wê û tevnên wê yên agahdarkirinê bi weşanên xwe ji sînorên wê dibihurin. Li welêt rojnameyên rojavayî peyda dibin û li bajarên mezin kanalên televizyonê yên biyanî dikarin bên temaşekirin.

Berovajî Çînê, Rûsya înternetê sansûr nake. Tevî kuştina gellek rojnamevanan a dengvedayî jî hin rojname bi awayekî aşkere rexneyan li rejîma siyasî ya heyî digirin. Birêvebirina karûbarên bazirganiyê serbest e (li welêt 1.5 milyon şîrketên piçûk û mezinahiya navî hene). Welatî hê dikarin bibin xwediyê daîre yan jî xaniyên xwe yên şexsî û dikarin bibin miştiriyê erdekî bêyî ku sînorekî ferehiya vî erdî hebe. Bankeyên taybet û şîrketên pîşesaziyê derketin holê. Sîstema heyî bi rengê xwe yekane ye. Tevliheviyeke ji "hema bêje sovyetî" û ji "rojavayîbûna qaşo" pêk tê rewşeke weha afirand ku bi gotinên dîrokzanê rûs Aleksey Miller "*li Rûsyayeke ku bi awayekî radîkal bi standartên demokratîk re li hev nake, ji mirovan tê ku şexsî xwe azad hîs bikin* (2)". Modela Putin ji modela Brejnev qet nebe ji du aliyan ve bêyî ku cîh ji nîqaşan re bihêle, serketîtir e.

Di warê siyasî de di dema Yekîtiya Sovyetê de hêza desthilatdariya siyasî bi tenê ji dunyaya derve qut dihat meşandin û ev yek di nava sînorên asê û bi desteka mezin a îdeolojiyeke ku rojava wê weke çort û nezan bi nav dike, lê belê îroj jî gellek rûs alîgirê wê ne. Di vê çarçoveyê de Partiyê otorîteya xwe ya "desthilatdariya ji jor ber bi jêr ve" parast û li dijî tevahiya fikrên alternatîf û înîsiyatîfên ku guman ji rola rêberiya wê kirin, şer kir. Ev îdeolojî hilweşiya û hilweşîna wê bi kêra kapîtalîzmeke ku ji her şêwaz prensîbî qut, hat. Sînor vekirî ne, rûs dikarin ji welatê xwe derkevin, dikarin rexneyan li desthilatdariyê bigirin, agahdariyên dixwazin biweşînin û bigihîjin wan. Lê dîsa jî di deh salên dawî de gellek prensîbên otorîter ên serdema Brejnev ji nû ve xwe dan der, bêyî ku bibe sedema berxwedaneke gel a aşkere.

Di warê civakî û aborî de sîstema Sovyet li ser hîmê xizaniyê û dabeşkirina mal û berhemên sereke hatibû danîn. Reformvanên perestroyka û rojavayiyan şîret li yekemîn hukumeta demokratîk a rûs a razîbûyî kirin ku dawîanîna li kêmbûna mêl û destûra milkiyeta taybet wê rê li ber vegera desthilatdariyeke otorîter bigirin. Lê belê ya qewimî ne ev bû. Mezinbûna aboriyê ya salên 2000'î – encama konjuktureke global a bikêrhatî – kir ku gellek welatî dewlemend bibin û bi heman awayî dilsozî rejîma heyî bibin. Çînên navî û jor pêhisiyan ku ev rejîm misêwabûna halê wan misoger dike. Bi vî rengî li ser bazareke heta hingê nedîtî li hev hat kirin: li hemberî dewlemendiya aborî îstîqrara siyasî.

Serokdewletê berê û serokwezîrê nuha Putin hê jî bi vê serfiraz e, bawer dike ku bi vê yekê wî xizmeta herî sereke ji welêt re kiriye. Ji bo ku piştgiriyê bide vê îstîqrarê hukumet bi tedbîrên parastinê hilberîna neteweyî diparêze û ji bi dehan hezar şîrketan re rewşekê diafirîne ku wan hema bêje dike yekdestdar. Bilindkirina zêde ya mesrefan(3) dike ku buhayên kiryariyê heta li bazara ewropî jî bilind bibin. Belê, bi rêya ku beşek ji para karê ji petrolê ji bo kesên herî zêde bêpar tê veqetandin, ev bilindbûna buha li Rûsyayê tê bêtesîrkirin.

Bi vî awayî ji rayedarên rûs hat ku sîstemeke desthilatdariyê bi cîh bikin ku komunîstên beriya wan nediwêriyan xeyala wê jî bikin. Wan asta jiyana karmendên dewletê baştir kir. Wan *de facto* hilbijartinên azad paş ve xistin, mafê grevê û xwepêşandanan jî ji holê rakir. Wan dadgerî ji burokrasiya heyî re kire tebaya û civakeke ji gel qut afirandin ku li qadên cihê dimîne.

Encam civakeke azad di kontrola desthilatdaryeke otorîter de ye, ev yek sîmbiyozek e ku li gorî pîvanên sosyolojîk ên rojavayî ne mumkin e pêk bê. Heger civaka rûs dikare qebûl bike ku azadiya wê ya ku di dema perestroyka de ewqasî bi dildarî hat parastin, bi vî rengî bê birîn, sedema vê ew e ku bawerî bi fikra kirina kolektîf gellekî nemaye. Sirra Rûsyaya Putin bi carekê mezinbûna qada civakî ye ku welatî tê de weha bawer dikin ku dikarin bi awayekî ferdî nakokiyên sîstemî çareser bikin.

Ber û hêza perestroykaya sala 1985'an mirov dikare bi binyada civakî ya pirrcure a alîgirên wê rave bike ku li derveyî van şert û mercên taybet, van alîgiran wê nikarîbûna hev temamker tev bigeriyana. Sîstema Sovyet xwe li peydabûna gellek komên civakî ranedigirt. Wê fikrên bi wê re li hev nedikirin sansûr dikirin, çanda alternatîf difetisand, jiyana dînî ditepisand; Rûsan nedikarî bigihêjin çavkaniyên dîroka welatê xwe ya otantîk û mafê wan nebû aîdiyeta xwe ya neteweyî nîşan bidin. Sedemên nerazîbûna ji sîstemê yên profesorekî zanîngehê yê ji xwedê bawer nedikir û gundiyekî ortodoks ê bawermend weke hev bûn. "Bersivên ferdî" ji bo pirsgirêkên heyî ne mumkin bûn. Aboriyeke bêhn lê çikiyayî li vê zêde dibû ku pêdiviyên pîşesaziya eskerî li pêşiya pêdiviyên sereke yên welatiyan digirtin. Ev aborî ji aliyê sîstemeke burokratîk ve dihat kontrolkirin ku bi xwe partiyê dor lê teng kiribû.

### Kar û gendelî

Gava Michail Gorbachov fikra guherînê da destpêkirin, wî bi milyonan sempatîzan anîn cem hev. Hinan doza reforman û nermkirina sîstemê dikir, hinan dixwast sîstem bi tevahî hilweşe; her çawa be hemûyan dizanî çareseriya ferdî ya pirsgirêkan di şikandina çarçoveya giştî re derbas dibe. Welatiyên alîgirê perestroykayê ji kîjan derdoran dihatin: karkerên kanan (ku îroj ji ber ku birêvebirên wan qebûl nakin pereyan li ewlekariyê razînin bi sedan ji wan di kan û çalan de dimirin) tevî karsazên taybet ê pêşî bi heman dildariyê ji bo guhertinên radikal têdikoşiyan, burokratên herêmî ku tu rêya din li ber wan nebû jî derbasî aliyê wan bûn, kartên xwe yên endametiya Partiya Komunîst paş ve dan û serxwebûna komarên serbixwe îlan kirin. Ev sîstem hat mehkûmkirin, lewre bi kêra tu kesî nedihat û ne li gora tu kesî bû. Sîstema nuha şaşiyên sîstema beriya xwe dubare nake. Wê di dema xwe de, xwe ji welatiyên zêde çalak xilas kir – van welatiyan salên 1990'î welatê xwe terikandin – ku pozîsyonên wan wê bêguman rê li ber îxtîlafeke fikrî ya nû vekira. Bi xêra pêşketina bazirganiyê, derfetên guherbariya civakî ya hem bi aliyan ve û hem jî di navbera jêr û jor de û helbet bi xêra mafê qevastina di ser sînoran re, ji sîstemê herweha hat ku derfeta gihiştina şêwazên cihê yên dewlemendbûn û xweseriyê bide pirraniyeke mezin a welatiyan. Jê herweha hat ku mêzîneke aqilane di navbera berjewendiyan û potansiyelê de peyda bike: wê di dunya karsaziyê de karên têrpere pêşkêşî mirovên jêhatî û biryardar kirin û di burokrasiyeke ji ber bertîlê kangrenbûyî de karek da yê mayî. Heta ku hîmên sîstemê nehejînin, çavên xwe li dek dolabên karmendên dewletê yên piçûk girtin.

Sîstema Sovyet enerjiyeke ecêb zêde xerc dikir daku baweriya welatiyan pê bîne ku di her qadê de serdest e. Êdî ev yek navê. Civaka rûs civakeke "bê welatî ye": çawa dikarî kiras biguhere û kirasê vê struktura lawaz û pûçbûyî li xwe bike? Bêguman, di nava taybetmendiyên elîta wê û "asansorên civakî" yên ku wê pêk tînin de, divê mirov li bersivê bigere. Di pirraniya civakan de ku xwe modern dikin, gellek şêwazên elîtan hene – elîta polîtîk, a karsaz, a întellektuel, a eskerî … –, lê belê li Rûsyayê di pêvajoya derbasbûna sîstema kapîtalîst de ev cihêbûn ji holê hatin rakirin. Elîtên zanîngehan û ên eskerî weke bêkêr hatin îlankirin; perepêdana karê wan rawestiya. Qada maddî di heman demê de tevahiya nirxên civakî daqurtand. Elîtên siyasî û xelkê welêt rûbirûyî hev man, xelkê daxwaza dewlemendiyan li elîta siyasî dikir, û derfetên elîta siyasî nebûn vê dewlemendiyê bide xelkê. Cîhana bazirganiyê dest pê kir ku nirxên civakî destnîşan bike û hedî hêdî li gorî berferehbûna xwe kete nav strukturên desthilatdariyê. Di vê gava pêşî de – heta destpêka salên 2000'î – mekanîzmaya dewletê para bêhtir girêdayî cîhana bazirganiyê bû, lê belê hê dûrî bû ku tevahiya prensîbên îdeolojîk jê bigire.

Rewş di van deh salên dawiyê de xirabtir bû. Hatina desthilatdariyê ya Putin bi xwe re hatina kategoriyeke nû ya şexsiyetên ku bêhtir ciwan in anî, ji bilî dewlemendbûna wan a şexsî tu armanca van mirovan nebû û derfetên gellekî baş ên ku birêvebirên siyasî pêşkêşî wan dikirin fahm dikirin. Karsazên beriya vê demê bûn desthilat, di demeke kurt de weke kesên nayên xwastin hatin îlankirin. Dewletê hêdî hêdî weke şîrketeke di asta neteweyî de xwe birêkxistin kir (di salên destpêkê de hejmareke baş a şîrketên mezin ji nû ve ketin kontrola desthilatdariyê) û karmendên dewletê yên di asta herêmî û federal de ketin cîhana bazirganiyê.

Di salên 1990'î de kes matmayî nedima ku waliyekî herêmê herweha li serê komeke bankeyan yan jî holdîngeke pîşesaziyê be. Di 2000'an de ji bo her kesî normal e ku wezîfedarkirina berpirsiyarekî nû yê heremê yan jî wezîrekî, bi xwe re hebûna xizm û dostên wî yên di birêvebiriya karûbarên bazirganiyê yên herêmê de tîne. Nûnerên hêza dewletê (karên hundir, parastin, ewlekarî) *silovîkî* jî bi heman senaryoyê hêzdar bûn. Piştî ku taybetkirina mal û milkê pîşesaziya eskerî kir ku karmendên wezareta parastinê milyonan bi dest bixin – van deh salên dawiyê buhayê ekîpmanên eskerî 8 heta 9 caran li berê zêde bû - rê li ber bertîl û kurtêlxwuriyeke asta herî jor vekirin.

Ber bi dawiya salên 2000'î ve hîmên rastiya nû ya rûs bi îstîqrar bûn: desthiltdarî bi awayekî serbest dikare bi pere, mal û milk bê dayîn û pere, mal û milk jî bi desthilatdariyê. Elîta zexmbûyî karûbarên xwe ne weke xizmeta ji netewe re, lê belê weke şewazekî taybet ê bazirganiyê dibîne. Bi awayekî nakokane ew têra xwe vekirî ye: bi awayekî bi rêkûpêk hevkariya bi navên nû re, derfetê dide yên ku dixwazin bi tevahî veqetin daku bi tenê bazirganiyê bikin. Rojavayî şaş difikirin dema dibêjin burokrasiya rûs berdar nîne: berovajî, ew berdar e – bi tenê pîvanên berdariya wê û vîzyona erkên wê guhertî ne.

Rûsyaya di vê rewşa berê nedîtî de li gorî qanûn û rêzikên ku yên wê bi xwe ne, dixebite. Welat ne teqlîdeke bêreng a demokrasiya ewropî ye. Ew ne dîktatoriyeke rojhilatî ye, bi xêra



YÛSIV BEKIR: **Şêrê sar**, 100 cm x 100 cm, boyaxa rûnî ya ser tûwalê

peywendiyên tebaayên wê bi dîroka ewropî re ji nû ve di ber çavan re hatiye derbaskirin û sererastkirin. Ew ne Yekîtiya Sovyetan e ku di îdeolojiya xwe ya mutleq-desthilat de ji nû ve ruh pê tê, ne jî modeleke "guherîneke otorîter" e, lewre aboriya wê ne bi komkirina ber bi piştî pîşesaziyê bi pêş dikeve, lê belê li gorî şemaya berovajiyê vê.

Di dunyayekê de ku motîvasyonên materyalîst lê serdest in, îroj Rûsya sîstemek e ku encama felaketeke bi carekê ya tevahiya meyilên exlaqî û tevahiya fikrên civakekê ye. Wê rêya xwe bi xwe kudand. Heke ewropiyan qebûl nekira petrolê ji şîrketên nîv-sûcdar bikirin, heke birêvebirên wan di karûbarên Gasprom'ê de alî negirta, heke karsaz li borsayan û bazarên milkan ên rûs ne li pey karê spekulatîf bûna, ev sîstema Rûsyayê dê nebûya. Bêyî şîrketên biyanî ku bi rêya navbênkariya wan karsaz bi awayekî eşkere– û karmendên rûs bi awayekî veşartî – xwediyê % 70'ê pîşesaziya mezin a welêt in, ev sîstema Rûsyayê dê nebûya.

### Pêdiviya berbiçav ya bi rewşenbîran ve

Modela rûs li gorî pêşketineke mentiqî tev geriya. Ew dikare hê demeke dirêj dewam bike lewre nerazîbûna civakî hê ne xwediyê tu hêzê ye. Welatiyên jê nerazî azad in ku ji bilî qada siyasî vê nerazîbûna xwe bînin ziman; yê ku dixwazin heramsîkeriyê bikin jî nayên astengkirin: bi tenê kesî guh bide wan nîne û nikarin tu kesî seferber bikin... Ango bêedebiya ku bi şêwazekî neberbiçavtir herweha pêşengiya xebitîna civakên rojavayî dike, civaka rûs jî ew întegre kiriye: îmtiyaza pere û berxwuriyê, wekhevkirina nirxên çandî, sernermiya xelkê welêt, belavkirina pirr zêde ya teknolojiyên mirovan ji hev dûr û biyanî dikin… Yekane pirsgirêka vê sîstemê ew e ku çîneke întellektuel pêk bîne û bi vî rengî zanînên, mirov nikare di wan bibihure, hilberîne. Întellektuel hê jî li welatekî ku xwe daye mêhtina çavkaniyên xwe yên xwezayî nehewce ne, lê belê heger hevrikiya aboriyên dunyayê zeximtir bibe, dibe ku bi kêr bên. Serokdewlet Dmitri Medvedev ev yek baş fahm kiriye. Dîsa jî niyeta wî nîne ku rejîma heyî ji hev de bixe, lê belê ew dizane ku ev rejîm bi pêşketina teknolojîk re li hev nake. Gelo ew ê reformên bi rastî bide destpêkirin? Heke wê vê bike, hingê gelo ev reform dibe ku sîstemê bêyî ku ji hev de bixin, biguherînin? Lîberal û demokratan aciz jî bikin, guhertinê wê pêk bên di Rûsyaya îroj de mezintir in ji yên demên dawiya Yekîtiya Sovyet.

* Midûrê Navenda Lêkolînên li ser civaka piştî pîşesaziyê û sernivîskarê kovara *Svobodnaîa Mysl* e

1 Axaftina li Parlamentoya Neteweyî, 25'ê nîsana 2005'an, http://achive.kremlin.ru

2 Alekseï Miller, "Ot demokratii 19 veka k demokratii 21-go: kakov sleduïuchtchi chag?" (Ji demokrasiya sedsala 19'an ber bi ya sedsala 21'ê ve: lê bi dû re?), in Vladislav Inozemtsev, *Demokrasî û modernîzasyon: nîqaşa li ser siberoja sedsala 21'ê* (bi rûsî), Evropa, Moskowa, 2010, r. 101

3 Li Rûsyayê, buhayê metalan û hacetên avakirinê ji bazara cîhanî bilindtir e. Buhayê derxistina gazê di nava salên 2000 û 2009'an de heft qatan zêde bûye (Vedomosti, Moskova, 14'ê tebaxa 2009'an, 14'ê nîsanê, 31'ê gulanê û 1'ê hezîrana 2010'an

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

RÛSYA

# Hêzeke daristanî ya bêxwedî

MARIE-HÉLÈNE MANDRILLON *

Di rojên destpêkê yê tebaxa 2010'an de, blogvanekî Tver'ê bi van peyvan berê tîrên hêrsa xwe dide Vladîmîr Pûtîn: di vê dema ku gundê wî di bin agirê şewata daristanê de ye, ew behsa "demên berê yên xweş" ên sovyetan dike ku hingê ji bo têkoşîna li dijî şewata daristanan zengilek, bêrmek û nobedarên daristanê hebûn; bi van nobedaran re bêrek û kumekî parastinê hebû ku bi nivîsa "Xizmeta Dewletê ya Parastina Daristanên Yekîtiya Sovyetan" hatibû neqişandin. Ev şahidiyek e ku ciddiyeta şewatên li Rûsyaya Navî derdixe pêş. Mehekê paşê serokdewlet Dmîtrî Medvedev binketina dewletê qebûl kir û ji nuha ve guhertinên wê siberojê pêk werin dan zanîn.

Felaketên hawîrdorê bi rengekî giştî rewşên zanyar bi wan dizanin derdixin pêş. Feleketa havîna 2010'an ku em hê bi asta wê nayê zanîn – hem di warê qada şewitî de û hem jî di warê hejmara mexdûran de – jî dikeve ber vê qaîdeyê. Mirov hin sedemên vê karesatê bi rehetî ji hev der dixe: kelegermeke îstîsnaî ya li Rûsyaya Navî û modeleke birêvebirina krîzê ya heta hingê nehatî dîtin ku kir zor li qanûneke nû bibe. Sedemên din ên bêhtir neyekser reh û rîşên wan diçin heta bi polîtîkayên dewletê yên ku di du dehsalên piştî serdema sovyetan de ketin meriyetê û herweha heta bi mîrateya sovyetan.

Jihevdeketina Yekîtya Sovyetan ya di 1991'ê de nîşana çûyineke rastî ya ber bi qutbûna ji erka dewleta navendî ye. Di destpêkê de lawazbûna fonksiyona parastina daristanan, rastî krîza aborî ya piştî ji hevdeketinê tê. Ji 1993'an û pêve, rêziknameyekê di bin hin şert û mercan de destûr da 150 hezar karkerên daristanan ên ser bi Saziya Federal a Daristanan ku daristanan bibirrin û bazirganiya berhemên ji daristanan bikin da ku mûçeyan – yên nehatî dayîn – karibin bidin û mesrefên din fînanse bikin – yên ku navber ketibû fînansmana wan. Di salên li pey vê de ev kiryar li pêş hat girtin û heta carinan li pêşiya fonksiyona parastinê jî cîhê xwe girt.

Di sala 2000'î de Saziya Federal – a ku jixwe qels bûbû – di bin berpirsiyariya wezareta çavkaniyên xwezayî de hat bicîhkirin. Di çarçoveyeke giştîtir de vê transferê kir ku wezareta hawîrdorê ya ku derengmayî sala 1988'an ji aliyê Mîxaîl Gorbaçev ve hatî damezrandin, were fesixkirin. Pêkhatina vê wezaretê xwe disiparte qutbûna ji rabihuriyê, wê bi awayekî zelal fonksiyona mêhtina çavkaniyên xwezayî û ya parastina hawîrdorê ji hev cihê kirin. Di bin banê saziya ji mêhtina çavkaniyên xwezayî berpirsiyar de komkirina Saziya Daristanan û wezareta hawîrdorê, ne bi tenê îşaret bi dawiya hewldaneke demkurt a jihevcihêkirina erkan dike, herweha siyaseta Pûtîn jî darîçav dike: ruhpêanîna aboriya rûs li ser hîmê mêhtina petrol û gaza xwezayî, hem jî bêyî ku xwediyê endîşe û kontrolên eleqedarî hawîrdorê be.

Eger behsa lawaziya fîloya balefiran a vemirandina şewata daristanan – havîna 2010'an hatiye nûkirin – were kirin, ew jî xirabûna binesaziyên pêşketina herêmî dide der. Sala 1995'an hê 7 000 xebatkarên mudaxeleyê yên Saziya Balefiran a Parastina Daristanan, Avialesokhrana'yê, hebûn. Di 2006'an de ev hejmar daxistin 3 000'an. Li aliyê xwe wezareta rewşên lezgîn gazinan dike ji ber ku ji heft balefirên rijandina avê yên ku ji bo demsala 2010'an daxwaza wan kirî, bi tenê sisê gihiştinê.

Di çarçoveyeke bi vî rengî de pêkanîna qanûna daristanan a ku di 2007'an de kete meriyetê, di mijara parastina daristanan û têkoşîna li dijî şewatana de bi tenê gava dawî ya pêvajoyeke qutbûna ji erka dewleta federal pêk tîne. Li gorî vê qanûnê otorîteya dewletê dewrî herêman û rêveberiyên herêmî dihat kirin (aîdên Federasyona Rûsyayê ne) û beriya her tiştî berpirsiyarî di navbera şeş wezaretan de dihat dabeşkirin ku ji sisêyan re dibêjin "wezaretên hêzdar" (wezareta rewşên lezgîn, ya karên hundir û ya parastinê). Ji hingê ve rayedarên herêmî diviyabû tevahiya hêza siyasî li ser birêvebiriya xwe bimeşînin, bi wî rengî ku parastina demdirêj a daristanan misoger bikin, rewşeke baş a binesaziyan û bi awayekî rast xebitîna ekîpmanan ewle bikin, planên mudaxeleyê amade bikin, ji bo bikaranînê amadekirina navgînên pêwîst misoger bikin (heta bi rezervên sotemeniyê…), di dema şewatê de xelkê û kesên daristanan dibirrin seferber bikin û helbet şewatê vemirînin.

Hukumetên herêmî di cîh de di xalên mezin ên muxalefeta xwe derxistin pêş: li gorî wan birêvebiriyên wan ne amade bûn ku xwe bidin ber barê berpirsiyariyeke evqasî mezin û beriya her tiştî gumanên wan hebûn ku pêdiviyên malî yên pêwîst nikaribin bistînin. Rêzerexneyeke din – ku pisporên daristanan, zanyaran û Rêxistinên der-hukumetî (RDH) ên hawîrdorê derxistin pêş – li guncavbûna qada herêmî dipirsî. Ma dînamîka belavbûna şewatan bi awayekî giştî sînorên admînîstratîf ên di navbera du herêmên cihê de derbas nakin?

### Mîrateya sovyetan û baweriya bi daristaneke bêdawî

Bi ser de jî pirsa li ser biawayekî ufqî bihevguherîna agahdariyan, jêhatîbûn û pratîkên baş ên di navbera herêman de tê kirin. Di serdema kontrola ji fezayê de – teknolojiyek e ku têrîkirineke herî xurt û organîzasyoneke yekbûyî ya neteweyî ya ku dikare xwe li tevnên gerdûnî zêde bike jêre divên – herêmên ku di beriya serdema fezayê de mane, gelo bi rastî alavên wan ên baş hene?
Ji bilî van pirsgirêkên birêvebirinê, divê were tesbîtkirin ku daristanên rûs dikarîn baştir bihatana parastin. Lê êdî sektora daran û baskên wê nuha di nava xelo û celo de mane. Tevî ku % 23'yê daristanên dunyayê li Rûsyayê ne, ew bi tenê % 2'yê berhemên ji daran hildiberîne. Çend şîrketên rûs ku sektorê di nav xwe de parve dikin, hindik pereyan li sektorê radizînin û berdariya wan jî kêm e. Alavên wan ên kevinbûyî pêşiyê li wan digirin ku bi awayekî karibin hevrikiyê bikin, bikevin bazara dunyayê.

Sedema vê ya mezin, mîrateya sovyetan û baweriya bi daristanên rûs ku wê "qet xilas nebin" e. Wezareta daristanan ku ji salên 1930'î û vir ve yek ji baskên berdar ên kêmdîtî ên sîstema Goulag'ê bû, ji ber vê yekê rezerveke karkerên belaş ên li kampên komkirinê li ber destê wê bû. Ji ber ku zora modernkirinê li ser nebû, ev siyaset bêyî ku biguhere heta dawiya Yekîtiya Sovyetan jî weke xwe ma. Bi heman rengî, budceya wezaretê – weke hatinên ji daristanan hemûyan – girêdayî daristana hatî birrîn (û ne bûbû malê firotinê) bû, ev jî rave dike ku beşeke têra xwe mezin a van darên birrî, li daristanan dihatin hiştin.

Ji bo dawiyê li nivîsê bînim, pirseke dawiyê bikim ku fikaran bi pisporên daristanan, tenduristiya gelemperiyê û klîmatologan re çêdike: pirsa şewatên avzêman ku dûyê wan ê jehrî şêniyên herêma Moskovê gellek rojan fetisandin. Divê em careke din di serdema sovyetan de li çavkaniya vê pirsgirêkê bigerin: avzêm heta bi salên 1980'î di astên gellekî mezin de hatin zuwakirin da ku ava wan ji bo çandiniyê were bikaranîn. Wezareta karî û avê, zuhakirina bi hezaran hektar avzêmê dewam kir, erda avzêman jî di halê xwe de zuwa hişt. Ji hingê ve tu tişt nehat kirin û her havîn kevzêya erdên avzêman a ku bi hêsanî dişewite, agir pêdikeve û dûyê jehrî ku ji bo tenduristiyê tehlûke ye û gazên dikin tesîra serayê çêbibe, derdixe.

Zanyar ji mêj ve pêşniyar dikin ku ev avzêmên zuhakirî, bi rêya teknîkên buha, ji nûve werin têr avkirin. Bi awayekî bi tedbîr wan îşaret pê kir ku karê li pêş di destpêkê bibe tesbîtkirina kite bi kite a deverên ku xetere lê heyî: heta îroj lêkolîneke bi vî rengî ya ji bo herêma Moskovê nehatiye kirin… Gelo divê mirov li hêviya felaketa bê be?



YÛSIV BEKIR: **Keça kurda ya bi batirsokê**, 40 cm x 50 cm, teknîka tevlihev ya ser tûwalê

* Dîrokzana hawîrdorê li Rûsyayê, Navenda Lêkolînên Cîhana Sovyetan, Kafkasî û Ewropaya Navendî (Cercec), CNRS/ EHESS, Parîs.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

## DABEŞKIRINEKE DIJWAR LI FILISTÎNÊ

# Dewletek ji bo du xewnan

ALAIN GRESH

**Hevdîtinên di navbera Israîl û Filistînê 2'yê îlonê di bin çavdêriya serok Barak Obama de ji nû ve dest pê kir. Lê ji hêlekê ve mêtingehên israîlî zêde dibin, û ji hêlekê ve jî her du alî di warê Quds, penaberî, sînor û avê de ji hevdu gellekî cuda difikirin. Ev pirsgirêk dibe sedem ku hin rayedarên ku di nava wan de Îsraîlî jî hene, ber bi fikreke nû ve biçin û piştgiriyê bidin avakirina Dewleteke yekgirtî, ji Deryaya Spî heta çemê Urdunê.**

*Serokê Parlamentoyê radigihîne û dibêje: "Xetereya herî piçûk, êşa herî piçûk, dê avakirina Dewleteke yekgirtî ya li ser bingehê mafên wekhev ji bo hemû hemwelatiyên wê be".* Wezîrekî kevn ku bûye semboleke jiyana siyasî, ji wî jî hîn wêdetir diçe û weha dibêje: êdî ji îro û pê ve, ji xeynî ragîhandina Dewleteke yekgirtî, li ser axa dîrokî ya Filistînê ku ji Deryaya Spî heta bi çemê Urdunê diçe, pê ve rêyeke din li ber me nemaye. Parlamenterekî ciwan yê ku baweriya wî ya dînî weke pola ye heman baweriyan diparêze. Ma ev kes sê kesayetiyên filistînî ne? Sê endamên rêxistina îslamî ya Hemasê ne? Sê dijsiyonîstên ewropî ne? Na, ev tesbît ji aliyê sê endamên berbiçav ên rast ên israîlî ve hatiye îfade kirin.

Yê yekem, M. Reuven Rivlin e, ku ramana tehdîda demografîk a erebî red dike û çavdêriya vê dike ku ev awayê ramanê *"mirov digihîne baweriya ku yan divê mirov bar bike yan jî divê mirov Ereban bikuje. Ez ji ber van gotinan dikim dîn bibim. Ez diçûm nav dibistanên ku li wan hilbijartin çêdibûn, wezîrê karê derve Lieberman, birêvebirê partiya rast a tûj Israel Beytenu % 40'ê dengan girt û min dît ku zarok dibêjin divê em Ereban bikujin.* (…) *Ev hizrên weha ji ber helwesta tawîzkar a sosyalîstan û* Partiya Karkeran *tên ku fikra "em* Cihû *li vir û ew* Ereb *li wê derê" piştrast dike. Ez qet ji wan tê negihîştim. Dema ku Jabotinsky (1) digot* "Sion aîdî me ye"*, dixwast bibêje serokwezîrekî cihû û cîgirekî serokwezîr yê ereb (2).*"

Yê duwem, M. Moshe Arens e, ku di salên 1980'yî de, weke wezîrê parastinê û wezîrê karê derve derket pêş. Ew weke rêberê siyasî yê Netanyahû û weke "baz" jî tê naskirin. Wî di rojnameya rojanê ya Haaretzê de dîtinên xwe weha rave kirin: *"Ma dê çi bibe ger ku serdestiya Israîlê li cihûtiyê û Samariyê bê tedbîq kirin û ku em mafê hemwelatîbûna israîlê bidin gelê filistînî? Bi vî awayî, ev meseleya ku, li Israîlê û li derveyî welêt weke "dagirkeriyê", weke êşeke ku mirov nikaribe ji ber debar bike tê dîtin, dê bi guhertineke bi vî rengî rihet bibe û Israîl jî dê ji bin barekî giran derkeve (3).*"

Lê em ê çawa karibin vê nifûsê di nav xwe de bihelînin? Ew dibêje, li Israîlê, hîn kêmayetiyên ku baş ketine nava sîstemê, yên weke Durzî û Çerkezan hene. Ger em bên ser misilmanan û dijwariya entegrebûna wan *"hukumetên Israîlê yên heta nuha tu tedbîrên bi bandor nesitendine"*: *bi raya wî,* divê berî hertiştî, ji vê pirsa sereke bê dest pê kirin.

Kesayetiya sêyem a ku li ser lihevkirina Israîlê divê pirs jê bê kirin Tzipi Hotovely, endama herî ciwan a Parlamentoyê, stêrka Lîkûdê ya ku bilid dibe ye, ku li ser daxwaza şexsî ya Netanyahû bi xwe tev li wan bûbû. Ew li dijî vekişîna ji Xezayê ya 2005'an bû û îddia dike ku vê bûyerê nîşan daye ku fikrên li ser vekişînê dê bi ser nekevin. Ew herweha jî, bi fikra ji dest bernedana koloniyan ve bûye dirrî: *"Cihû li Hebronê, li Beit Elê jiyane. Ev der cîhên pîroz in, ku di Incîlê de jî derbas dibin. Qral Dawid ji Hebronê dest pê kiriye û qraliyeta xwe ava kiriye. Ez bawer nakim ku em karibin dev ji van deveran berdin, nexwe çi wateya siyonizmê dimîne? Siyonîzm yanî vegera Siyonê, vegera Qudsê, vegera van hemû cîhên pîroz e ku di Incîlê de hene. Wê gavê divê em pêvajoyeke aştiyê ya ku niştecîhên koloniyan ji cîhên wan raneke bidin ber çavên xwe (4)."* Wê gavê rêyeke bi tenê dimîne, berfirehkirina qanûna Israîlê li hemû Şerîaya rojava û mafê hevwelatîtiyê û hibijartinê dana Filistîniyan, bi kurtayî Dewleteke yekgirtî, ku weke ji bo wê, ji bo M. Rivlin ou M. Arens jî tenê dikare "Dewleteke Cihû" be.

Ev pêşniyarî handidin ku yek ji nakokiyên bingehîn ên bazkê lîberal, bi mana siyasî ya gotinê, yê rastê Israîlê çareser bikin: mirov çawa dikare daxwaza wê ya serdestiya li ser hemû "Judea û Samaria" (Şerîaya rojava) bi prensîbên demokratîk re li hev bîne? Çawa mirov dikare xwe ji avakirina sîstemeke cudaxwaz a ku tê de, Filistînî ji mafên xwe yên siyasî bêpar bin biparêze? Berî Menahem Begînê ku cara yekem, di 1977'an de, rastê Israîlê gîhand serketinê, xwast vê rewşa di nav herêna de çareser bike. Piştî ku pêşwaziya serokê misrî Enwer Sedat, di çiriya paşîn a 1977'an de, li Qudsê kir, planeke ku nêrîna wî ya otonomiyê ji bo Filistîniyan destnîşan dikir pêşniyar kiribû û mafê hilbijartina hemwelatîbûna Îsraîlî yan jî ya urdunî pêşkêşî niştecîhên Xeza û Şerîaya rojava kiribû û mafê dengdana ji bo yek ji van herdû parlamentoyan dabû. Dê zû dev ji vê ramanê bihataya berdan, ji ber ku ew li astengekê rast hatibû ku hîn îro jî yek ji van sê kesayetiyên navborî nikare di vî warî de bi ser keve: mirov dê çawa karibe daxaza "Dewleteke cihû" bi dana mafê dengdanê yê ji bo Filistîniyan re li hev bîne? Arens îddia dike ku ew ê bi tenê temsîla % 30'ê nifûsa giştî bikin, lê ew jimara niştevanên Şerîaya rojava kêm dibîne û Xezayê jî "ji bîr dike". Planeke weha dê çawa karibe nifûsa filistîniyan rake ser piyan da ku benda % 50 derbas bike? Heta bi % 40'î jî, tu hukumet nikare bêyî piştgiriya beşekî Filistîniyan, ku mirov têgihê bê çima ew ê piştgiriya hukumeta "Dewleteke cihû" bikin, ava bibe?

### Çareseriya demkî ji bo demeke dirêj

Sînor û nakokiyên wê çi dibin bila bibin, ev teza li dijî sembolan reşbîniya giştî ya li gel zaboqa "pêvajoya aşitiyê" ya ku bi salan e ku bi nefeseke sûnî li ser piyan e. Tevî ku 2'yê îlona 2010'an gotûbêjên Israîlî û Filistîniyan di bin serokayetiya serok Obama de ji nû ve dest pê kirin jî, kêm şîroveker baweriya pê tînin ku ev pêvajoya li ber mirinê bikare were zindîrkirin. Bêcesaretbûn belav bû û berî herkesî tesîra xwe li berpirsên amerîkî yên ku bi dehan salan têkilî vê dosyayê bûne dike.

Di navbera salên 1988 û 2003'yan de, Aaron David Miller, di dema sê serokkomaran de, weke şêwirmendê şeş wezîrên dewletê kar kiriye. Ew beşdarî hemû hevdîtin û gotûbêjên nehînî û eşkere bûye. Di gotareke xwe de ku pirr olan da û sernivîsa wê "*Dînê sexte yê aşitiyê li Rojhilata Nêzîk û çawa baweriya min bi dîn nema* (5)" ye, û nêrîna wî bi kurtî rave dike, dîtinên xwe weha bi lêv dike: pirsa Israîl û Filistîniyan ji bo Washingtonê êdî ne pirseke sereke ye, ew jî êdî weke ya Iraqê, Afganistanê, Pakistanê, û bi taybetî jî ya Îranê ye, ku bala wê bêtir dikşînin û heta hêzeke mezin wek ya Dewletên Yekbûyî jî, bi taybetî di van demên krîzê de, nikare di vî warî de hertiştî bi carekê de bike.

*"Di demeke ku mezinahiya hêza Amerîkayê kapasîteya wê derbas dike de, divê kesên bawermend ji nû ve li dînê xwe vegerin û baş lê binêrin. Dewletên Yekbûyî divê tiştê ku ji destê wan bê bikin, bi Israîlî û Filistîniyan re bixebitin ku gotûbêjê li ser pirsên sereke yên statuya dawîn bikin* (...)*, alîkariya Filistîniyan bikin ku ew jî saziyên xwe bi pêş de bibin, Îsrîliyan bênin rê ku alîkariya Filistîniyan bikin û derfetê bidin ku ji alî aborî ve bîhna wan derkeve û desthilata xwe berfirehtir bikin û aramiyê bînin Xezayê.*(…)*. Lê Amerîka divê her wekî tiştên ku nikaribe bike yên ku karibe bike jî zanibe û haya wê jê hebe."*

Aktorekî din yê bi bandor, Robert Malleyê ku weke şêwirmendê serok William Clinton beşdarî gotûbêjên Camp Davidê (tîrmeha 2000'an) bûye, ew jî encamên reşbîn ji vê tecrûbeya xwe derdixe û rexneyên tûj li çareseriya Dewleteke Filistînî li ber pozê Israîlê digire.

*"Ev raman bersiva problemên ku îddiaya çareseriya wan dike nade. Ew soza dawîlêanîna berberiya ku di 1948'an de pêk hatiye dide û bêşik ya berî wê jî, lê ew bi tenê ji pirsên ku di 1967'an de derketine holê dipelikîne. Dawîlêanîna dagîrkirina axa Filistînê pirseke sereke ye* (…), *lê rihên vê berberiyên hîn pirr kûrtir in: ji bo Israîliyan, mesele pirsa nenaskirina meşrûiyeta Dewleta Cihûyan ji alî Filistîniyan ve ye; ji bo Filistîniyan jî, berpirsiyariya Israîliyan a di warê bêmilkkirin û derbederkirina wan a li gel zayîna Israîlê ye* (6)." Avakirina Dewletekê ji bo Filistîniyan, gotûbêjên li ser axê ku divê herkes çiqasî bigire dê *"heyecanên herî kûr ku ji nav û dilê mirov tên, bêriya welêt û kîna mirovî"* sivik nekin. Heger Malley, di heman demê de, çareseriya Dewleteke yekgirtî red bike, gelo mirov dikare çi bike?

Weke jimareyek girîng ji şirovekerên Amerîkî, ew jî piştgiriya *"çareseriyeke katî ya ji bo demeke dirêj"* dike, ku çarçoveya wê dikare biguhere, lê ku derfeta paşdexistina (heta kengî?) dosyayên herî hesas, yên wek ya Qudsê an jî yên penaberan bide.

Roger Cohen, edîtorê xwedî giraniyeke mezin ê *New York Times*ê vê nêrînê bi kurtî weha rave dike (7). *"Obamayê ku ji nuha ve xelata Nobelê girt, divê hêviyan kêmtir bike, dev ji peyva aşitiyê berde, vê gotinê ji deftera xwe derxe, destpêbike ji aramkirinê xeber bide. Tiştê ku Lieberman jî dixwaze ev e, tiştê ku Hamas jî dibêje ez dixwazim ev e, mana xwenedana ber bêr a Netanyahû jî ev e. Tiştê ku Abbas dixwaze ne ev e, lê desthilata wî tuneye. Weke ku pisporê zanyariya siyasetê Shlomo Avineri yê Israîlî jî ji min re got,* "statukoyeke bê şîddet kesî memnûn nake, lê ji tunebûnê jî çêtir e. Qibris ewinde jî ne xirab e." (…) *Aşitiya mêrxasan divê cîhê xwe bide agirbesteke milayîman."*

Ev reşbînî ji lihevnerîneke şaş avê hiltêne ku ji 1993'yan bi vir de jî mohra xwe li kiryarên hêzên mezin dixe: du gelên ku li ser vê axê dijîn, divê bigihên lihevkirinekê, ji bo vê yekê jî "niyeta pak" û "îzolekirin"a tûndrewên herdu aliyan pêdivî ye. Herweha ew berpirsiyariyên taybetî yên dagîrker vedişêre û wî bi yê dagîrkirî re dixe nav heman planê. Ew ji bîr dike ku hemû hukumetên Israîlî, heta piştî peymana Osloyê jî, siyaseta xwe ya fetihandina axê domandin: jimara koloniyên di navbera dema îmzekirina vê peymanê ya di 1993'yan û heta roja îro, ji xeynî 200 000'ên li Qudsa rojhilat ve, ji 100 000'î derbasî 300 000'î bû. Li hemberî vê *"serhevdana zeviyên ku li rojavayê dîwarê cudakirinê dimînin, axa ji alî koloniyên fermî û kûvî ve zeftkirî, erdên ji bo rêyên dorpêçkirinê bikarhatî û herêmên eskerî yên girtî li newala Urdinê ku birêvebirên Israîlî di her halûkarî de dixwazin biparêzin* (8)*"* % 45'ê axa Şerîaya rojava dike. Partiyên siyasî yên Israîlî, çi rast çi jî çep, biryarên Neteweyên Yekbûyî û hiqûqa navneteweyî bêyî ku ceza bixwin red dikin.

Di îlona 2000'î de, destpêkirina Întifadaya duyem fersend da destê serokwezîrê wê demê Ehûd Barakî ku pirraniya mezin a raya giştî ya Cihûyên Israîlê qane bike, lewre "*mixetabekî wî yê Filistînî*" ji binî ve nebû (9). Heta bi biryara dîrokî ya zîrweya welatên Ereb a di adara 2002'yan de, li Beyrûdê ku li hemberî avakirina Dewleteke Filistînî di nav sînorê 1967'an de qebûlkirina aştiyeke giştî bi Israîlê re dixwast qebûl dikir jî, çavgirtî hate redkirin. Û ev redkirin li ser hukumetê bi qurûşekî jî nebû mal, piştî ku hêzên mezin ên sereke yên cîhanê, yên weke ji Dewletên Yekbûyî heta Yekîtiya Ewropayê, ji Çînê heta bi Rûsyayê weke ku dagîrkirin tunebe – heta ku îmaja Israîlê di nêrîna raya giştî de gellekî bêqîmet bûbe jî, pê re peyman çêdikirin.

### Yan wekhevî yan herkes li mala xwe

Ya hîn ji vê jî girîngtir, koma birêvebirên Israîlî, bi rastî, wekheviyê bi Filistîniyan re naxwazin. Vê quretiyê û fikra ku jiyana Filistîniyekî ne hêja ye ewlekariya Israîliyekî bi Peymana Osloyê dest pê nekir. Dayina pesnê xwe ya bi dijminantiya bi cîranên xwe re, bi derxistina pêş a argumanên tevkujiya Cihûyan a bi ku dirêjiya Şerrê Cîhanê yê duyem domand, birêvebirên Israîlî têgeheke ewlekariyê ya mutleq ji xwe re ava kirin ku tu hêz nikaribe bigihijiyê ku vê yekê jî welat xistiye nav şerrekî bêdawî. Ger prensîbê wekheviya hemû mirovên niştecîh ên li ser vê axê neyê nas kirin, çareseriyek mimkun e gelo? Ronakbîrê Amerîkî yê bi eslê xwe Filistînî, Edward Said dibêje "*yan wekhevî yan herkes li mala xwe"* (10)*,* ku ev raman êdî ji alî aktorên cihê cihê ve tê bi lêv kirin, û herkesî jî Filistîniyên Israîlê bi hemû hêza xwe vî mafê rewa dixwazin.

Metirsiya serkanekî çapemeniya Israîlê yê xwediyê yek ji pirtûkên pêşîn ên li ser El Fetih (11), Ehûd Yaarî jî, ji ber vê yekê ye. Di gotareke xwe ya bihara 2010'an de, dibêje ku ji nuha û bi heta çend salên din, piştgiriya ji bo çareseriya du Dewletan dê kêm bibe, dê fikrên din derkevin holê, que d'autres idées vont surgir, wendabûna Birêvebiriya Filistînî dê bi xwe re îlhaqa defakto a axa dagîrkirî bîne û Filistînî dê bi vî awayî biserkevin û misoger bikin, *"ku bi şikandina serdestiya demografîk* [*birêvebirên Israîlî piştrast dikin ku bi dehan sal e jê bi şil in û ji îlheqkirinê bêtir xwastin xwe ji dagîrkirinê biparêzin. Ev îlheq berevajiya vê yekê dê ji bihevre jiyana pirraniyeke ereb pê ve ji wan re rêyeke din nehêle* (12)*."* Ji bo wî agirbest tiştekî pêdivî



YÛSIV BEKIR: **Jineke kurd,** 50 cm x 60 cm, teknîka tevlihev li ser kaxezê

ye ku dikare vekişiyana Israîlê ya ser xeta "bi dîwarê ewlehiyê" nîşankirî hêsantir bike, ev jî dê xerakirina 60 koloniyî û vegera 50 000 (li ser 500 000...) niştecîhên van koloniyan ferz bike.

Ev hemû projeyên "çareseriya demkî", di çarçoveya têkiliyên hêzên nuha de, bi rastî dê ji xeynî dirêjkirina bi awayekî din dagîrkirina erdê Filistîniyên ku rezervên wan bi sînor in, yekîtiya axa wan tuneye, nikarin sînorên xwe kontrol bikin, bêdesthilata siyasî û aborî ne pê ve bi kêrî tiştekî din neyên.

Ger em bên ser tehdîda îlankirina dewleteke serbixwe ya Filistînî ku Meqamên Israîlî îddia dikin, kenê guran bi vê yekê tê (13). Berî her tiştî, ev dewlet hîn ji berî de, di 1988-an de, ji aliyê Rêxistina Rizgariya Filistînê (RRF) ve hatibû îlan kirin û ji alî ji sedî bêtir dewletan ve jî hatibû naskirin. Ger Yekîtiya Ewropayê jî heman tiştî bike, gelo amade ye ku tehemula encamên wê bike û Israîlê weke hêzeke dagîrker ku divê bê ceza kirin miamelê pê re bike ji bo mecbûr bimîne ku ji Dewleta ku wê dagîr kiriye vekişe?

Weke minaqeşeya li eniya "alîgirên Filistîniyan" jî nîşan dide ku bi pêşniyarên Rivlin û M. Arens jî hatin rojevê, perspektifa Dewleteke yekgirtî li ser hemû axa dîrokî ya Filistînê dê zêde probleman dernexe (14).

Uri Avnery, têkoşerê şerrê aşitiyê, vétéran combat pour la paix, bi dijwarî valahiyên van projeyan rûreş kir: Xezayê li derveyî van projeyan dihêlin; Dewleta yekgirtî dê cihû be; îlhaqkirina Şerîaya rojava dê rê li ber berdewamiya dagîrkirinê veke; dayina mafê hemwelatîbûnê ya ji bo Filistîniyan dê bi kêmanî deh salan ango cîlekî bajo. Û axavtina xwe weha bi dawî tîne: *"Di fîlma Roman Polanskî* Rosemary's Baby *de, jineke ciwan zarokekî pirr bedew tîne, lê belê bi du re aşkere dibe ku lawê Şeytên e. Vîzyona çep a ku ewinde Dewleteke yekgirtî cezb dike bûye cinawirê rastê.* (15)*"*

Elî Ebûnîmahê ku, ronakbîrekî Amerîkî lê bi eslê xwe Filistînî ye û birêvebirê malpera *The Electronic Intifada* û xwediyê pirtûkeke xurt e ku tê de Dewleteke yekgirtî diparêze (16), li dijî vê dîtinê derdikeve. Her çend ku ew, weke Avnery, sînorên projeyên rastê bi vî awayî tesbît dike jî, bi berdewamî weha dibêje: *"Gava ku Cihûyên Israîlî dev ji pêdiviya mafên wekhev ji bo Filistîniyan berdin, ew ê nikaribin yek alî sîstemeke ku îmtiyazên neheq biparêze li ser wan ferz bikin. Dewleteke hevpar, çawa divê çavdêriya mafên Cihûyên Israîlî yên rewa û hevbeş bike, divê ji bo hemûyên mayî jî bike."*

Ew vê rewşê bi bûyerên ku li Afrîkaya başûr dibin re jî beramberî hev dike û weha dibêje: *"Di nîveka salên 1980'yî de, pirraniya mezin a Spiyan têgihîştin ku êdî nema karin statukoya apartheidê biparêzin û dest pê kirin li "reformên" ku pirr dûrî daxwazên Kongreya Neteweyî ya Afrîka yên ji bo wekheviyeke gerdûnî –kesek, dengek li Afrîkayeke başûrî ya bênijad- bûn fikirîn.* (…) *Heta dawiyê jî, anketan nîşan dida ku pirraniya spiyan, heta ku mafê xwe yê vetoyê yê li ser biryarên statejî biparêzin, dê dengdana giştî red bikin, û li hemberî wê dê cûre parvekirineke desthilatê bi pirraniya Reşikan re qebûl bikin.* (17)*"*

Ger em bên ser Hemasê, ew li derveyî minaqeşeyan dimîne, û qîma xwe bi qebûlkirina avakirina Dewleteke Filistînî li Şerîaya rojava û Xezayê tîne û di van mercan de, soza agirbesteke kêmzêde dirêj bi Israîlê re, lê bêyî naskirina wê dide. Gava dor bê ser "azadiya hemû Filistînê" û pêşeroja nifûsa wê ya cihû, tevgera îslamîst di çarçoveya qebûla îslamê ya di derbarê kêmayetiyên dînî de daxwiyaniyan dide.

Tevî ku her du rêxistinên nûnerayetiya Filistîniyan dikin, el Fetih û Hemas tevlî minaqeşeyên kevn ên li ser Dewleta yekgirtî, rewşenbîrên weke Edward Said an Tony Judt, beşek ji tevgera piştgiriya bi Filistînê re, fraksiyoneke diyarker lê nêrîna rayagiştî ya Filistîniyan de kêmayetî piştgirî dan an jî didin utopyaya Dewleteke yekgirtî û demokratîk (18).

Ji ber ku pêşniyara El Fetih a dawiya salên 1960'î, ji ber nezelaliyên tê de heta nuha bikar nehat: gelo weke modela Afrîka Başûr dikare bibe dewleta hemû hevwelatiyên xwe? An dewleteke dunetewî weke mînaka Çekoslovakyaya kevn? Destûra wê dê çawa be û dê çi garantiyê bide civatên xwe yên neteweyî û dînî? Ev dewlet bi nisbet derûdora xwe dê ewleteke çawa be? Aya dê bibe endama Yekîtiya Welatên Ereban?

Rewşeke weha dê pirr tevlîhev be, projeyeke bi vî rengî bitenê dikare bi têkoşîneke hevpar a di navbera Filistîniyan û, bi kêmanî, beşeke girîng a nifûsa Cihûyên Îsralê pêk were. Mînaka Afrîka Başûr gellek caran tê rojevê. Lê ji vê pirsê wêdetir, divê mirov zanibe gelo Israîl dewleteke nijadperest a cudaxwaz e yan na, nimûneya Afrîka Başûr mimkun bû ji ber ku Kongreya Neteweyî ya Afrîkî (ANC), bi saya hevkariya xwe ya bi Partiya Komunîst re, ji xwe re "bingeyeke pak" peydekiribû; wê herweha jî axavtin û rêbazên têkoşîna bidilê xwe avakirina civateke bi navê "keskesor"ê adapte kiribû, ku bi vî awayî xwe ji koçberiyeke giştî ya nifûsa spî, weke mînaka li Angola û Mozambîkê parazt. Wê çeka terorizmê jî, ji ber metirsiya ku dikare bibe sedemê wendakirina piştgiriya raya giştî, bi taybetî jî ya Spiyan (19). ANC'ê, bi awayekî giştî, bi têkoşîna xwe ya bi awayekî bêtawîz a ji bo prensîbê "mêrek, jinek, dengek", zanibû tirsên civata spî û beşeke melezan bigire ber çavan da ku misogeriyeke bihêz pêşkêşî wan bike. Ev model, rêxitinên nûjen him li ser aliyê Filistîniyan û him jî li ser yê Israîliyan ferz dike ku tirsa xwe birevînin, kîna xwe jibîr bikin û pêşderaziyên xwe bi cîh bihêlin ku herdu aktoran ji hev cuda dikin? Şairê mezin yê Filistînî, Mahmûd Derwîş, qesda heca zor a li mala xwe ya li Qudsê dike û weha dibêje:

*"Ez ê ji biyaniyên ku di nav nivînê...*
*min de radikevin bipirsim*
*Ez ê bejna xwe bi rêz*
*li ber niştecîhên xewna zarokatiya xwe bitewînim.*
*Ew ê bipirsin: Ev biyaniyê hatiye serdanê kî ye*
*Bê xem? Ez dikarim bibêjim*
*ji aştiyê û ji şerrê di navbera qurbanî û qurbanî de*
*qurbaniyên, ku peyvek jî bi devê wan neket?*
*Ew ê ji min re bibêjin: cîh ji du xewnan re tuneye*
*di yek nivînî de?"*(20)

1 Vladimir Zeev Jabotinsky (1880-1940), pêşengê rasta siyonîst bû. Partiyên rastgir li xwe disipêrin tezên wî.

2 *Haaretz*, Tel Avîv, 15'ê tîrmeha 2010'an

3 "Is there another option?" (Gelo tu çareya din nîne?), *Haaretz*, 2'yê hezîrana 2010'an

4 TheJewishPress.com, 10'ê tîrmeha 2009'an

5 "Teh false religion of Mideeast peace: And why I'm no longer a believer", *Foreing Policy*, Washington, gulan-hezîran 2010

6 Digel Hussein Agha, "Israël and Palestine: Can they start over?" (Israîl û Filistîn: Gelo dikarin dîsa dest pê bikin?), *The New York Review of Books*, 3'yê çileya pêşîna 2009'an

7 "A Mideast truce", *The New York Times*, 16'ê çiriya paşîna 2009'an

8 Denis Bauchard, "L'Etat palestinien en question. La solution des deux Etats est-elle encore possible?" (Pirsa Dewleta Filistînî. Gelo çareseriya du dewletan hê jî guncaw e?), notên Enstîtuya Fransî ya Têkîliyên Navneteweyî, Parîs, adara 2010'an

9 Bixwîne: "Le véritable visage de M. Ehoud Barak" (Rûyê Ehoud Barak yê rastîn), *Le Monde diplomatique*, tîrmeha 2002'an

10 Israël, Palestine, égalité ou rien (Israîl, Filistîn, yan wekhevî yan herkes li mala xwe), *La Fabrique*, Parîs, 1999

11 Strike Terror: The Story of Fatah (Bicîhkirina terorê: çîroka El Fethê), *Sabra Books*, New York, 1970

12 "Armistice now" (Agirbest nuha), *Foreing Affairs*, New York, adar-nîsan 2010

13 Senaryo bi awayekî zîrek ji aliyê Jean-François Legrain ve hatine analîzkirin û bi navê "Palestine: un Etat? Quel Etat?" (Filistîn: Dewletek? Kîjan Dewlet?) ve hatiye weşandin, Gremmo.mom.fr, 11'ê çileya pêşîna 2009'an

14 Çavkanî: Dominique Vidal, "Palestine: à propos de l'Etat binationale" (Filistîn: derbarê Dewleta duneteweyî de), France-Palestine.org, 23'yê çiriya paşîna 2009'an

15 Uri Avnery, "Rosemary's Baby", Gush-Shalom.org, 24'ê tîrmeha 2010'an

16 Ali Ubinimah, One Country (Welatek), *Metropolitan Books,* New York, 2006

17 "Israelis embrace one-state solution from unexpected direction" (Bi awayekî ku hêvî jê nedihat kirin, Israîliyan berê xwe da çareseriya dewleteke yekgirtî), Electronicintifada.net, 21'ê tîrmeha 2010'an

18 Bixwîne: Leila Farsakh, "L'heure d'un Etat binational est-elle venue?" (Gelo êdî dema dewleteke duneteweyî hatiye?), *Le Monde diplomatique*, adara 2007'an

19 Çavkanî: Nelson Mandela, Un long chemin vers la liberté (Rêyeke dirêj ya ber bi azadiyê ve), *Le Livre de poche*, Parîs, 1996, r. 341


20 Comme des fleurs d'amandier ou plus loin (Weke kulîlkên dara behivê an jî jê dûrtir), Actes Sud, Arles, 2007

Wergera ji fransî: Yaqûb Karademîr

# KULTUR-POLÎTÎK

KEJO BAJAR

## Birîna Reş




Komareke weha ku barê wê li ser jendirmeyan maye. Gundekî Kurdistanê yê xizan. Gundek. Di nava wî gundî de malek. Di nava wê malê de ev tiştê dixuyin: *"Çewalekî nîvî ardê ceh li ber dîwêr, sê- çara lêhêf, doşek û balîfên kapikî yên qetyayî, merşeke mûyî qetiyayî û nerûkirî di kulînê de."* Belê em behsa pirtûka Mûsa Anter a ya navê wê "Birîna Reş" dikin. Ev berhema ku di nava wêjeya kurdî ya bakurî de dikare weke serhildanekê were nirxandin, di çapa xwe de weke şanoyê hatiye nivîsîn, lê di heman katê de, roman e jî, çîrok e jî û dîrok e jî.

Zoravaya Diyarbekirê di bin zilma began de ye. Gundî hemû merebeyên axê ne. Gund di nava xizaniyeke weha de ye ku nayê gotin. Li gund yên ku xwedî çaydanekî bin jî dewlemend têne hesibandin. Zilamê ku mehê çar hêk xwaribin, kêfa belek kiriye. Mirîşka ne li kadîna mala mellê, weke li motka xwe hêk kiribe... têra dêya bextewariya Zînoyê dike.

Rabûn û rûniştin û awayê jiyînê, yê gundekî Kurdan e. Lê, li wî gundî Birîneke Reş derdikeve. Hukumetê ji bo çandiniyê genim daye began û began jî ji dêlava ku wî genimî biçînin, çûne ew genim li sûka elafan firotine. "Birîna Reş" wê ji ber wî genimê dermankirî derkeve. Ew derman jahr e. Ew birîn goştê zarokên kurd ji hestiyên wan dike. Yên ku di gundî de sê çar zarokên xwe ji ber "Birîna Reş" binax nekiribin tunne ne.

Zîno û Biro bi xwe heyşt zarokên xwe binax kirine û tenê Bedo sax maye. Lawê malê Bedo nuh dibistan qedandiye û vegeriyaye malê. Ji xwe, hemû replîkên wê listîkê li odeka mala Biro derbas bibin.

*"Erê ev gund ne yê me ye, xanî ne yê me ye, lê li nav mezel de xaniyên me hene, ez ê ji dev vê tirba xwe berdim û herim ku?"*

Di vê replîka Zînoya diya Bedoyê xwende de welat weha tê pênasekirin: Heger di bin axê de miriyên mirov hebin, hingê ew der welatê mirov e.

Piştî ku deh sal di ser nivîsîna vê pirtûkê re derbas bibe, lêhengên Gabriel Garcia Marquez dê di nava romana "Tenêtiya Sedsalî" de weha biaxivin: Josê Arcadio Buendia dibêje *"Eger di bin axekê de miriyê mirov tunne be ewax ne aîdî mirov e"*. Ursula beyî ku dilê wî bişkîne bersiveke weha didiyê: *"Eger ji bo mayinê mirinek bivê, hingê ez ê bimirim."*

Zîno û Ursula, bêyî ku hayê wan ji hev çêbibe, wê di nava deqan de bi dizî, silaveke jintîtiyê li hev bikin û wêjeya kurdî jî di kûrahiya xwe û hestiyariya xwe ya li ser axê de ava bibe.


Birîna Reş komar bi xwe ye. Birîna Reş hukumet e. "Birîna Reş" remza zordariya axa û began e. Û weke derhiş wê kurd li hember kirinên dewletê tim bi gûman bin. Lewre gava ku hukumetê diyariyek daye wan, birîneke reş ji nava wê diyariyê derketiye û zarokên wan ji ber wê birînê mirine. Mesela aşiyê ku mebesta wê kurdxesîkirin bû dê hişê xwe ji rûdaneke weha wergirtibe. Bedoyê ku dibistan xelas kiriye û bûye doktor wê bersiva Kurdan ya li hember vê birînê be. Bedo bersiveke Hîpokratî ya kurdan e.

*(Bedo çentê xwe datîne , bi kul û keser radihêje destê Memo û destê xwe yê din jî datîne ser serê Silo. Biro,Zîno û yên di giş li wan zarokan dinerin.) BEDO: Erê zarokno!...Em qeliyan. Lê îca em naqelin.*

Mûsa Anter li Zivingê di şikefta nimereya 2 de hatiye dinyayê. "Birîna Reş" antîkîteya hişê kurmanciyê ye û di wê antîkîteyê dê Mûsa Anter di milê Sokrates de ye. Zîno di milên Ursulayê de ye.

Navê pirtûkê: Birîna Reş
Lewn: Şano
Rûpel:50
Weşanxane: Med

## Tofan û Beko Ewan




Gelo gava ku mirov li rastî tofanekê were, ew ê çi bike ? An jî gelo ew ê berê çi ji ber wê tofanê xelas bike ? Hinek ji me dê piçûka malê, hinek ji me dê nivişta xwe ya li dîwêr ve daliqandî, hinek ji me dê wêneyê pêşêngên ku di sêdaran de lingên wan li ba bûne xelas bikin. Lê ez bawer nakim ku kes rabe ji ber ava "Tofanê" Beko Ewanekî xelas bike.

Di novela Hesenê Metê ya bi navê "Tofan" de Ehmedê Xanî, Beko Ewanê xwe xelas kiriye. *"Ji cenabê te zulcelal dikim ku bi destûr û fermana Te, ji îro pê ve her sêsed û sê salan careke Bekoyê Ewan bi rûyê vê dinyayê bikevit."* Li ser vê lavaya Ehmedê Xanî – ku di vê çîroka dûrûdirêj de *"ew yekem kurd û kurmanc e ku bi bi Xwedê re bi zimanê xwe dipeyive"*- em çîroka Beko Ewan bi çavekî din dixwînin.

Bekoyê Ewan li ser axa Cizîrê dîsa diwelide û weke Eshabên Keyf ji şikefta xwe derdikeve . Wexta ku mirovek ji şikeftê derkeve, çavên wî dê zû bi zû hînî roja li derve nebin. Mirov bixwaze ji wî bajarî weke eshab Yemlîha revî revî bireve, gelo dê çawa bikare dîsa lê vegere?

Beko êdî ne ew Bekoyê ku bûye sebeba Mem û Zînê ye. Di nava novela Hesenê Metê de, ew êdî ne ew gelacê ku destê wî li ser navika wî ye û ne jî ew kesê piştxûz e ku awirên wî bi berjêr de ne. Ew çavên xwe vê carê wekî sosoyologekî vedike û guherîna Cizîrê ya di navbera sê sed û sê salan ji xwendekaran re û ji *"ya arif re"* dibêje.

Cizîra ku kameraya çavê Beko ji me re vedibêje êdî ne ew Cizîra Botana berê ye. Li Birca Beleka ku dîwarên ji kevirên miqqedes hatibûn çêkirin, êdî civata Mîr nagere, li Baxçê Mîran îroj giya şîn nabin, li Medreseya Sor a ku nalîna ilim jê belav dibû, îroj çend parsekên ku pala xwe dane dîwarê wê hene ku ji bo çend qirûşan berzûrî xwedê dibin; îroj li ber siya kevirên Buhurka Qesrikê *"kerê ji piştên xwe kul diçin di germê de ji bo mêş xwe li birîna wan negirin"* li wir mexel tên. Li wî bajarî êdî li ser text, Mîr Zînedîn rûnanê, li şûna wî "Cîhangîrek" rûdinê, ku "Cîhangîr" alegoriya peşêngê Tevgera Kurd ya îro ye. Peyvên Cîhangir giş ji Qura'anê ne û yek çewtî jî tê de tunne ye. *"Dema ku cenabê Cîhangîr ji me re got hûn hemû jî bêşeref in, got, gereg e hûn bêşerefiyê nekin û van gotinên min baş di serê xwe kin!* Û bi van kelamên cenabê wî *re…a wê çaxê ku ez têgehêştim ka şeref çi ye."*

Cîhangir li axa Cizîra Botan xwedêtiya otorîterîzmê ye. Li wir yê ku li hember peyva Cîhangîr in û dibin Beko Ewan, dibin Ebû Leheb, dibin xayîn... û ji xwe xayîn jî tên kuştin; weke Dalyanê lawê Bozanê Membûrî.

Di hemû şayesandinan de, em dibînin bê ruhê bajarekî bi destê Kurdan bi xwe çawa tê xopan kirin. Ne bajar bi tenê, ruhê kurdbûnê jî ji teref doktrînên çepê yên kurd pê emel dikin ve tê talankirin. Henê Metê di mînor-Kurdistanekê de (Cizîra Botan) birîna netewebûnê, birîna kurmacîbûnê bi soringê nîşan dike.

Lê divê mirov lêyeke xwe jî lê zêde bike. Ew Cizîra ku Tevgera Kurd serdestiya xwe lê îlan kiriye, di heman demê de bûye matrîsa serhildana kurd ya herî dawîn jî. Beko di nava kuçeyên deqa Hesenê Metê de rexnegir, çavdêr û şinigirîyekî baş e. Lê dîsa jî carna mirov ji Bekoyî dikeve şikê ku tim xirabiyan radixîne ber çavê mirov. Û Beko carna dibê berdevkê nivîskarên diyasporayê ku hertiştî dikin qurbanê girrên xwe yên polîtîk. Nivîskarê kurd, Hesenê Metê, vîzyona xwe ya tevgereke kurd ku îhtimala wê ya desthilatdariyê heye radixe ber çavan û di vî warî de xwe nêzîkî George Orwel dike. Vî nivîskarê brîtanî jî di "Çewlika lawiran" de vîzyona xwe ya ji komunîzmê di nava çîroka lawirên ku çewlikê ji xwediyê wê distînin de rave dikir. Lawirên ku dibûn desthilatdar û sîstema xwe datanîn, êdî tiştên weha dianîn serê xelkê xwe ku xelk êdî li dijî wan jî tev digeriya.

Hesenê Metê jî weha dike. Ew şika ku bi mirov re çêdibe jî di vira de ye. Lewre nivîskarê kurd dixwaze bibêje ku xirabek diçe û xirabekî din dikeve şûna wî.

Gelo ma yekcar tiştekî baş di naveroka vê tevgerê de tunne bû?

Hesenê Metê, *Tofan*,
Avesta, Stenbol

## Çiyayê Sîna




Çiyayê Sîna ji bo bawermendekî wê werê wateya cîh û warê ku Yehova xwe nîşanî Mûsa daye. Loma li Sînayê, Xwedayê Cihûyan Yehova- dema ku Mûsayê Cihû ji bo rizgariya milletê xwe yê benî di nav ponijandinên kûr de bû- xwe nişanî wî dabû. Ji bo vê jî bibîrxistineke Çiyayê Sînayê nûmabûna Xwedê ye.

Ji hêleke din ve jî Sîna tê wateya destpêka rizgariyê. Loma li heman Sînayê Xwedayê Cihûyan Yehova ferman dabû Mûsa da ku milletê xwe yê benî rizgar bike û piştgiriya xwe bi Mûsa dabû diyarkirin. Ji bo milletekî benî û bindest, Sîna hêmayeke xurt e. Ji bo vê jî, ne pêkan bû ku di helbesta milletekî bindest de bi cih nebûya.

Hêmaya Sînayê bi beytikênYeqîn h. bi awayekî trajîk li çeqlê helbesta kurdî lûsiyaye "Beytik" ne ew beytik e ku di berbeyaniyeke biharê de tê û li pencereya me diwîçwîçîne; ne ew beytik e ku havînan li dartûyê ji me re dixwînê. Beytika Yeqîn h. ew beytik e ku ji bo ku mizgîniya azadiyê bîne daye per û baskan.

Yeqîn h. di bêşê beytikê yê yekem de weha dixwîne:

*Beytikê daye per û baskan, wext*
*di dêv de kitêbek, dixwîne Destana toz*
*û berfê*
*tî tî li hafa bahozê*
*hay jê heye, ayeta dêrîn xwîn e*
*li ber piyên Xwedê rijiyaye*

Dema ku mirov bala xwe baş dide Beytika Yeqîn h. Sîmirg bi bîra mirov tîne. Êş û zehmetiyên ku Sîmirg di rêwitiya ber bi Qafê de jiyaye û yê ku Beytik jiyaye, ne dûr î hev in.

Beytika Yeqîn h. ji Sînayê hildifire da ku mizgîniya xwe bigihîne, lê bi awayekî bi karesat nikare bigihije armanca xwe û li "kerbelayê" dikeve:

*"çendik û çend e, bayê sor kiribû qest*
*beytika ku ji Sînayê hilfirî*
*ketiye li kerbelayê" dibêjin ayet*
*ji wê ye kund dixwînin bi lêvên beratê*
*û maran, dikin daweta Cinnan*
*a ji wê ye tarî ketiye Hirayê*
*di şînê de ye tarîx, li mistê têk çûye*
*wext*
*ahd e, daye di ber xwînê'd, di ber*
*avê'd*
*ji wê ve ye, temiriye qendîl*
*hilnayê mûm, rahijiye can*
*deng biliyaye ji Xwedê- nema li me*
*digirî*
*ji hingê ve ye nan bê nişa*
*û ax di axiriya qiyameteke'd hilaye*

Di Beytika Yeqîn h. de mirov pêrgî li çil û pênc helbest-beytikan tê. Ev beytik geh dê bibêjin: "*Sûret ji welêt ketin*", geh wê qewîtiya xwe li xwendevana bikin û bibêjin: "*ger ketim ber sikratê, min navê mewlûd û selewat, binax bikin min li xewlegeliyekî, gazî bikin dengdawidiyekî zemanê, ji welatê jor*"

Ev beytik carina jî wê tiştên ku "bi çavê serê xwe" dîtine par ve bikin û bibêjin: "*sor li Mehabadê, sînor li replîkên Çarçirayê, sî û sê şûrên seqakirî distirên, û davêjin ber hev-min dî*". Beytikek ji van beytikan wê nikilên xwe li ser birîna birakûjiyê dayne û biwîçwîçîne: "*qewmek bi vê êşê ketiye*".

Beytik bi ziman û şêwaza xwe jî di helbesta kurdî de nû ye. Em ji dengê beytikan, li bêdengiya xemgîr ya şevê guhdarî dikin. Şîna birayekî ku "zû ji axê hez kir"iye digirin.

Yeqîn h. di Beytikê de di derdora şevê, berfanberê, birînê re çûye û hatiye û ev çûyin û hatina xwe bi Beytikê şênber kiriye û li pencereya helbesta kurdî daniye da ku her şev û beyanî bi dengê xwe yê ketî bi zimanê xwe bixwînê.

*"Min bixwîne ji dîwêr, duta*
*Cîncoq e, tê bi zarê te ve*
*Bêcar e ez"*

Navê pirtûkê: Beytik
Nivîskar: Yeqîn h.
Lewn: Helbest
Weşanxane: Belkî
Sala Çapê: 2010, 64 rûpel

www.arsivakurd.org

## JI BALTIKÊ HETA ÇÎNÊ

# Rojhilatê Rojhilatê

KLAVDIJ SLUBAN

**Hertim dişibin hev, tu carî ne weke hev in, rêwîtiyên ku wênegir Klavdij Sluban li pey hev bi trêna Transsîbiryayê kirine, tên ber hev û ji deh salan vir ve ye ku hevdu temam dikin. Têgehên çûn û hatinê tev li hev dibin, lê belê ji bo çûyîna ji Pekînê heya Moskovayê ya di ser Oulan-Batorê re, dekor û leheng, weke bermahiyên komediyeke mirovahiyê ya li ser rêhesinan in…**

Hong Jiang, beriya ku biaxive, berê xwe hêdî hêdî dide pencereya kompartîmana trênê, cixareya xwe dikişîne û dihêle ku xweliya wê bi xwe bikeve erdê û bi dû re, dema ku wî karîbû çîroka xwe dewam bikiraya, motorek li ser rêya hesinî ya nava axê diyar dibe û ew berê xwe ziq dide ser wê. Di niherîneke hevpar de, mirov dibêje qey hemû rêwiyên din jî li heman deverê, di nava ewrên tozê yê ecêb re, li herdu tekerên motorê yên ku li gorî guherînên topografîk di çarçoveya pencereyê re hildikişin û dadikevin diniherin.

Motor û ajovanê xwe yên ku weke dîmeneke xweş diyar bûbûn, beyî ku tu agahiyên din li ser wan hebin, di nava çola Gobiyê de ji ber çavan wenda dibin. Herkes di quncikeke tarî yê kompartimanê de berê xwe dide cihekî. Hong Jiang li aliyê rêyê yê rastê dinihere: kevirê spî kîlometreya 630'ê nîşan dide. Ji Oulan-Batorê re, kîlometreya 404'ê re, hê çar saet rê mane, ne hêja ye ku mirov çîrokê dewam bike, lewre dê dîsa nîvco bimîne... Herkes dîsa dikeve nava kûrahiya fikarên xwe.

Xanima ciwan Yen Li qey li keça xwe ya 18 mehî ku wê li gel dê û bavê xwe, li gundekê başûrê Çînê, herêma Cantonê hiştiye, difikire û ji xwe dipirse ka gelo çi dike. Tsai Tao'yê ku nêzîkî sîh salî ye kêfxweş e ku vedigere jiyana xwe a xwendevaniyê, li aliyê sînorê Rûsyayê yê din, li bajarê Oulan-Oudeyê. Herçî ewê din e ku di destpêka rêwîtiya ji Pekînê de xwe bi *"I am Professor"* dabû naskirin, çavên wî tim li çar çenteyên wî yên sporê ne ku li ser ranzeya ku digel ku bi roj bû jî nehatibû pêçan danîbûn. Her cara ku trên bi vir de û wê de diheje, lewre hin hejînên Transsibiryayê diyar e ku ji ber pêleke erdê tên û ev jî dike ku xeşîmên vê trênê carê rabin û biniherin ka gelo trên ji rêya xwe derneketiye. Profesor tavilê radibe û alavên çenteyên xwe sax dike. Şingîniya şûşeyên ku li bin guhê hevdu dikevin û siqêfên bi zimanê mongolî. Piştî ku ev profesor alavên xwe sax dike, careke din tê cihê xwe, li paş berçavkên xwe yên tavê yên mîna artîstên ku dema wan derbas bûye, bê liv disekine. Kes dê şikê ji statuya wî neke. Gava ku li gumruka Çînê mecbûr ma û çenteyên xwe vekirin û bi dehan şûşeyên alkolê jê derketin jî weha bû. Tevgerên wî ewqasî xwezayî bûn ku vê yekê derfet didayê ku li hember karmendên gumrukê jî berçavkên xwe dernexe.

Piştî ku trên ji herêma xerabe ya Sibiryayê derket, em ketin axa Moxolistanê û li wê derê, bi karkerên koçber û qaçaxçiyên ku li Oulan-Batorê siwar bûn, trên gêş bû.

*"Ez bi te re diaxivim, ji ber ku di lingên te de goreyên baş hene."* Bi van hevokan wergerê Hong Jiang dest bi axavtina xwe kir. Di rastiyê de, ne ji ber estetîka goreyan, lê belê ji ber qalîteya wan e ku mirov dikare şerefa qebûlbûyîna derdora Hong Jiang bi dest bixe: ew bi xwe di "nava" goreyan de ye (1). Ew du caran ji balefirgeha Moskovayê hatiye vegerandin, vê carê dixwaze bi rêya erdê biceribîne. Lewre ew dixwaze bikeve nava bazara rûsî. Li ser pirsa min a *"Çend karker, li seranserê Çînê, di karxaneyên te de dixebitin?"*, zilamê karsaz yê ku tim difikire, cixareya xwe dikişîne, bi awirên kûr di pencereyê re mêze dike û bi dû re, bi dengekî nizm, bersivê dide: *"... û jê zêdetir"*.

Manzara di ber çavên me re dibihurin. Bircên Çînê ber bi çavên me ve dikevin, di çêkirina wê de milyonek kes mirine. Gelo ji bo ku rêya trêna Transtîbetê hilkişînin 5 hezar metreyan çend kes mirine? Di vê navberê de dengekî bilind li hemû vagonan olan da, di ekranên plazma yên kompartîmanan de jî şemaya vê rêya hesinî ku li gorî ekosîstemê çêbûye tê nîşandayin. Ne mimkun e ku mirov bikare ekranê vemirîne, ne mimkun e ku mirov bikare dengê wê kêm bike. Dengê ku li hemû vagonan belav dibe, diyar dike ku maskeyên oksîjenê ji bo hemû rêwiyan amade ne.

Rêwiyên ji herêma Sibiryayê ji du beşan in. Hin ji wan vê rêwîtiyê weke tecrubeyeke xweş dibînin, hin ji wan jî weke mecbûriyeteke jiyanê. Di nava beşê yekem de, hezkiriyên trênan, xwendevanên belengaz û amerîkiyên ku derketine kêfê hene. Bê guman divê neyê jibîrkirin ku hin kesên din jî hene ku bi Cendrars xapiyane û axir lê warqilîne ku xwendina *çîroka Transsibiryayê(2)* ji rastiya rêwîtiya " efsanewî" xweştir bû. Di nava beşê duyem de, bi tenê alavên bagajan rêwiyan ji hevdu cuda dike: kesên ku rêwîtiya ber bi cîhaneke çêtir ve dikin û alavên bi nirx, bîranîn û kincên xwe bi xwe re digerînin û kesên ku xwarin û vexwarinê di sînoran re derbas dikin daku li aliyê din bifroşin û karekê jê bikin ku hêjayî vê rîskê be.

Di kompartîmanê de atmosfera rêwîtiyeke vala heye. Qey ev ciddiyeta di navbera rêwiyan de jî, ji ber wê tê, lewre herkes bi sedema rêwîtiya jerkesî dizane. Rawestana li ser sînoran ya bi saetan derfetê dide ku zimanê herkesî vebe. Bi armanca pêkanîna karê formalîte û lêgerîna bagajan ya li dijî alavên qaçax, li deriyên sînoran bi saetan dem tê wendakirin, divê em dema guhertina vagonan jî lê zêde bikin. Rawestana trênê ya di nava erda Moxolistanê de, û herweha di hemû welatên Sovyeta Kevn de, ji ya li Çînê zêdetir bû. Di dema kontroleke şevê de, ya ku bêdengiya şevê qelişandibû, Yen Li weha pirsîbû: *"Gelo rast e ku zilamên rûsî gava ku serxweş dibin, gellekî şerrok dibin ?"*

Gava ku têdigihîje bê biyaniyê ku ev pirsa dijwar jê hatiye kirin ji bo bersivekê dikeve çi zehmetiyan, jina ciwan bi rûsî dibêje ku ew diçe Moskova'yê, karê wergeriyê li bazarê bike- herweha belkî wergêriya li ser şantiyeyan jî bike. *"Axir, wergeriya bazarê xerentî ye"*.

Dema ku wê dest pê kiribû ku derbarê bûyerên zilamên rûs yên dema serxweşiyê de çîrokên ku li gundê wê dihatin gotin bibêje, rayedarên sînoran ên çînî hatibûn û sekinîbûn. Di derbasbûna sînoran de, hemû kes sûcdar in. Di hemû kompartîmanan de zilamên bi unîforma digerin, herweha di pencereyên hemû vagonan de siya leşkeran jî dixuyê. Her ji sed metreyan yek disekine, di nava mantoyên xwe yên kesk de kûz bûne, digel hewa zivistanê a -25 °C, divê ew di cihên xwe de bisekinin û li hember hemû liv û lebatên gumanbar hişyar bin. Mirov dikare car caran bibîne ku çavên wan ji xewê diçin ser hev, weke birca Pîzayê bi ser kêlekê de xwar dibin û dîsa xwe rast dikin.

Piştî ku wezîfedarên sînor diçin, hê jî pasaportên hemû rêwiyan di destê wan de ne, vê carê niqaş di derbarê vîzeyan de dest pê dike. Tîpa vîzaya 261, ya bazirganiyê, destûrê dide ku mirov heya 3 mehan li Rûsyayê bimîne, buhayê wê jî dike 700 dolar; buhayê vîzeya xebatê dike 1000 dolar û destûrê dide ku mirov heya salekê jî li Rûsyayê bimîne û li wê derê kar bike, lê belê girtina wê vîzeyê dijwartir e.

Trên diheje, niqaş di nava hevokan de disekinin. Her cara ku trên ji nû ve bi rêyê dikeve, li gora dema ku di rawestanê de hatiye wendakirin jî kêfa serkevtinê li nava rêwiyan belav dibe. Herkes bi zimanê xwe yê dayîkê xwe kerr dike. Lê belê, di heman demê de herkes hesabê sînorê pêş jî dike.
Hinekî dereng, piştî nîvro, trên li ser hesinên Transsibiryayê disekine. Rêwiyê ku di nava livînê xwe yê beşê nerm de bi cîh bûye, (li Çînê, konfor bi du beşan e "beşê hişk" û "beşê nerm"), yanî ew rêwî, beyî ku xemê bixwe pişta xwe dide oblomovîzmeke(3) pejirandî. Carinan kulîlkên daran wî ji nava xewnan derdixin, carinan jî lepên berfê yên destpêkê.





Ji rêwîtiyekê heya yeka din, manzara tên kêleka hev beyî ku hevdu bieciqînin, dîmen dikevin ser hev, beyî guh bidin demsalan. Dar û berên ku weke pêleke deryayî deştan dixemilînin heta gola Baykalê ya qeşagirtî diçin. Rêzeke erebeyan li lezeke ecêb li ser qeşayê diçin. Li Sibiryayê, heta ku qeşa têra xwe qalind be, ajovan, ji dêleva rêyên kortikî, berê xwe didin çem û golên qeşagirtî ku li ser wan rêyê rast e.

Li îstasyona Krasnoyarskê, rêwî li ber saeta mezin disekine. Ji ber ku ji peyayekî saet pirsiye, ew baş dizane ku bi saeta herêmê saet 9 e. Dizane ku saetan hemû garan tim li gora saeta Moskovayê ye û li Moskovayê nuha saet 5 e, hingê, gelo ji bo çi saeta garê 12 ye. Hê ew hewl dide ku wê pirsgirêkê li gora saetine din jî bifikire û çareser bike, zilamekî rûs tê kêleka wî, digel ku danê sibehê ye jî ji serxweşiyê nikare li ser lingan bisekine.

*"Serê xwe pê re neêşîne. Ew saeta heram tu carî nexebitiye*". Gava ku jê bi dûr dikeve jî, dibêje: "*Tew belkî ya wê rasttir be… ji ber ku her ji serî ve ew saeta Pekînê nîşan dide. Ji xwe, rojekê, em ê hemû derbasî saeta Pekînê bibin, îroj nebe sibê!*"

Gava ku dîsa li trênê siwar dibe û du kompartîmanan bi wê de diçe, rûs li gora saeta Moskovayê hêdî hêdî ji nava şevê derdikevin, di heman demê de Çînî dest bi firavînê dikin.



### Moskova-Pekîn, 1900

**Dema Pêşengeha Gerdûnî ya 1990'î ku li Parîsê pêk hat, yek ji kêfa sereke ew bû ku mirov biketaya vagoneke şîrketa navneteweyî ya vagon-livîn ku li gora ya eslî hatibû çêkirin.**
**50.859.955 kesên ku ev vagon tecrube kirin derfet bi dest xistin ku bi qasî çil û pênc deqîqeyan berê xwe bidin manzarayên curbecur ku Transsibirya di nav re dibihure.**
**Dekoreke lezgîn ku li ser rûloyekê hatibû pêçan li gora mesafeya ku ew diçûnê bi lez dizîvirî. Neh rûloyên ku Pavel Pyatsetsky di nava 1894 û 1999'an de saz kiribûn di nava xwe de 850 metre manzara, dîmenên jiyana civakî, garên piçûk an jî avakirina bajarên nû ya li dora rêya Transsibiryayê pêşkêş dikirin. Giraniya her rûloyekê di nava 17 û 25 kîloyan de bû.**
**Paul Morandê(4) piçûk bi vî awayî, di 12 saliya xwe de "yekem sefera xwe ya mezin" pêk anî.**

Wergera ji fransî:
Îbrahîm Seydo Aydogan
û Ahmet Dere




# NAVEROK

## ÇIRIYA PÊŞÎN 2010


Ji Referandûmê ber bi "Vebûnê" ve
**Riza Dînç**
▶ R. 1

Osmanîzma Nû?
**Ferhad Îbrahîm**
▶ R. 1

Têkoşîna me
**Serge Halimi**
▶ R. 2

Ji Çapemeniyê
▶ R. 2

Gelo li Kubayê rota tê guhertin?
**Janette Habel**
▶ R. 3

Ji bo bêhtir kuştinê bêhtir aqil
**Jean Paul Hébert**
**Philippe Rekacewicz**
▶ R. 6

Çar canên modela Îrlandî
**Renaud Lambert**
▶ R. 7

Koreya Başûr, li deryaya Çînê devê pireya şerr a stratejiya amerîkî
**Matthew Reiss**
▶ R. 11

Kurdistan û milletekî parçekirî
**Jean-Pierre Viennot**
▶ R. 12

Çend pirsiyar bo dîrokê ji bo derketina ji aloziyeke herêmî
**Georges Lefeuvre**
▶ R. 15


Ji perestroykayeke gellekî kurt ber bi pûtînîzmeke bêdawî ve
**Vladîslav Înozemtsev**
▶ R. 18

Hêzeke daristanî ya bêxwedî
**Marie-Hélène Mandrillon**
▶ R. 19

Dewletek ji bo du xewnan
**Alain Gresh**
▶ R. 20

Kultur - Polîtîk
**Kejo Bajar**
▶ R. 22

Rojhilatê Rojhilatê
**Klavdij Sluban**
▶ R. 23


## Forma Abonetiyê

Nav:
Name

Navnîşan:
Address

Koda Postayê: Bajar:
Postcode City

Telefon:

E-Mail:

Abonetiya salane (12 hejmar!)

☐ Almanya (50 €)

☐ Derveyî Almanyayê (60 €)

☐ Abonetiya dîjîtal (20 €)

Independent Kurdish Media Group GmbH (IKMG)
Carnotstr. 4 - D-10587 Berlin

Post Bank - Hesab/Account/Konto: 371 219 609 - BLZ: 500 100 60
IBAN: DE84 5001 0060 0371 2196 09 - BIC: PBNKDEFF


www.arsivakurd.org